banga ḥeq ji
kelhaamed
Kovara Îslamî, Çandî û Hunerî
Sal: 8 • Jimar: 30 • Payîz / 2016 • Biha: ₺8

DÎROK BI ŞEKLEKÎ CUDA TEKERRUR DIKE



HERF Û NUQTE 24
RAFIZIYÊ HURRIYETÊ KOLÊ NEFSÊ NE 04

www.arsiv.org

www.arsivakurdi.org

YETİM DER

JI YETÎMEKÎ RE BIBE SPONSOR



HESAP BİLGİLERİ

PTT Bank Diyarbakır Kayapınar Şubesi
Hesap No: 6160892

Kuveyt Türk Diyarbakır Şubesi
Şube Kodu: 050 Hesap No: 6217457-3
IBAN: TR80 0020 5000 0062 1745 7000 03

TC Ziraat Bankası Diyarbakır Şubesi
Şube Kodu: 2547 Hesap No: 54283360-5005
IBAN: TR48 0001 0025 4754 2833 6050 05

MEHANE
70₺

BILA JI YETÎMA BIRAKÎ WE HEBE



www.yetimlervakfi.com

www.arsiv.org

“Bibêje: Xwedêyo!”

“Tuyî xwediyê xwedanîyê.
Tu kê bivê milk didî wî û kê bivê milk jê distînî.
Tu kê bivê ‘ezîz dikî, kê jî bivê perîşan dikî.
Xêr û bêr her di destê te de ye.
Bêguman Tu li ser her tiştî QADIR î.” (Alî ‘îmran: 26)

Mirov ‘aciz e. Bêhêz û bêqewet e. Digel vêna bêsebr, bêxebat û Bêtehem e jî. Rebbê ‘alemê ne wisa ye, Ew ji her kêmasî Û pûçiyan pak û beri yê. Bixwaze keseki rezil û şerpeze bike Ji bo wî di cîh de sedemên zexm, qewîn û bi hîkmet pêk tîne Amade dike. Dû re jî textê rûmetdarîyê ji binî dikişine û Serberjêr, serseri û sernixûn dike. Ji bo vê, mînak zehf in. Fîr’ewn, qarûn û yê din. Di vir de Qurana pîroz fêrxane Û dersxane ye… ***“vêca hey gelî ‘akilmendan ders û ibretan bigirin.” (Heşir: 2)***

Di bûyerên 15’e Tîrmehê de jî maneyên vê ayeta pîroz ji nû ve nazil bû û dibe. Çimkî di vê bûyera bi ‘îbret de xwedê Teala neyarên xwe û neyarên hemû mu’min û mustezefan carekî din rezîl, kepaze û şerpeze kir. Hemd û sena her ji wî re ye.



www.arsivakurdi.org



www.kelhaamed.com

www.arsivanadi.org

www.arsivakurdi.org

JI WEŞANKAR

بسم الله الرحمن الرحيم

الحمد لله رب العالمين والصلاة والسلام على خير خلقه محمد وعلى اله وصحبه اجمعين

Hemd ji Rebbê ‘alemê re bin. Salat û selam, tehiyyet û îkram li ser Fexra Kaînatê Resûlê Ekrem, al û eshab û etba’ên wî bin.

Erdnigariya Kurdistanê îro **di şahidiya tekerrura tarîhê de demek cuda** diborîne. Mustekbirên ser ruyê erdê bi heqqiyê li heqqiyê dixin, bi ‘edaletê li ‘edaletê dikin, **bi de’wa Îlahî li de’wa Îlahî dixin…**

Bi Kurda li Kurda dixin. De’wa û baweriya ku mustekbiran ji Kurdan re kirine mal û bi sutyê wan dakirine Kurda diqeli’îne, wan ji welatê wan derdixe. Zulma ku dijminê wan nikare li wan bike, Kurd ji destê de’wa ku bi wan ve hatiye zeliqandin û karbidestên wê dikşînin.

Bi deh hezaran Kurd ji teref Kurdan ve hatin kuştin; bi sed hezaran Kurd ji teref Kurdan ve ji welatê xwe hatin tehcîrkirin, tên qewirandin. Kurdên ku xwe temamen amade kirine ji xizmeta wan re dixwazin **Kurda bikin şerûd,** Kurdistanê jî di bin nigê mustekbiran de bi’eciqînin.

Bi navê hereketa xizmetê war û welat û xûna muslumana dimijiyan. Bes ev jî ji wan re hindik hat. Hewqas çav sor bûn ku di pazdê tirmehê de xwestin darbekê bikin. Bi vê darbê, wê ‘eyarê bidanan xelkê muslumanê ku xwe bi destê wan ve bernade. Bes gelek tecrubê darbeyan di serê muslumanê Tirkiyê re derbas bûbûn, îdî bi çavê serê xwe darbeya Misrê jî dîtibûn.

Bi vê bîrbûnê xelkê, xwe da pêşiya darbê û **mustekbîr di vê teşebbusa xwe de têkçûn**. Emrîka, Yekîtiya Ewrûpa, Nato. Hemd ji Xwed re… xelkê me bi bawerî û muslumantiya xwe ‘izzeta xwe nû kir. Kesê ku bi navê hereketa xizmetê îfsadê dikirin rezîl bûn, di dinyayê de ji î’tîbar ketin.

Gelî xwendevanên hêja!

Kovara **Banga Heq Ji Kelhaamed** vana teva dişopîne. Misyona ku hilgirtiye li gora rojevê bi cî tîne û pêşiya xwendevanê xwe ronî dike.

Vê hejmara me bi gazîkirina Rebbê me destpêdike, bi rûpelê **“Gelî Bawermenda”** baweriya bawermendan di bîra wan tîne, bi çend şîretan bala wan bibal kirinê wan ve dikşîne. Û bi **“Reçeta Kurda”** dewam dike. Ustadê ‘esrê Seydayê Bedîuzzeman di vir de bi Kurda re mijarên siyasî dinirixîne, rê bi ber wan dixe.

Seydayê Mela Mizgîn ji **hepsê** *Tefsîra Sûratê Kafîrûn* şandiye, beyan kiriye ku tiştê kafir di hebînin gerek musluman ne hebînin. **Kekê Mûhemmed Şakir** jî **ji hepsê** *“Xwedêyo! Tu Kê Bivê ‘Ezîz Dikî, Kê Jî Bivê Rezîl Dikî”* şandiye. Şehîd Salih li Ewrûpa bi destê xayinê Kurda, şehîd Muhemmed jî li Sitenbolê bi gulê derbevana hat şehidkirin. Ji bo her şehîdeki me ci da şi’rekî.

Di gel van nivîsan gelek nivîsên edebî, ‘ilmî û çandî nivîskarên me ji bo we xwendevanên hêja hazir kirine, em jî teqdîmî we dikin. Bi hêviya ku Rebbê me, van şuğlên me bi ‘emelên salih ji me qebûlbike.

www.arsivakurdi.org

naverok

Ji Weşankar / 1
Gelî Bawermendan! 3
Reçeta Kurdan - ‘Erebî / Abdussamed Hîlmî 4
Reçeta Kurdan - Latînî / Abdussamed Hîlmî 6
Seha Suretê Kafîrûn / Muhemmed Bêcirmanî 8
...Mela ‘Ehmed Hilmî / Fethullah Yalçin 10
Ey Candayê Şerî’et / Muhemmedê Girê Ce’fer 12
Dildaîya Kujerê Xwe / ‘Ehmed Derikî 13
Terbîya Zarokan/ Fatîh Akman 14
Camî Çarê Derdane/ Abdullah Cewher 15
Sureyê Beyyîne/ Yusuf Arifoğlu 16
Kengê Ya Rab! / Şex Muşerrefê Xinokî 19
Ê Xweda Ew Rû Reş Kirî / Mustafa Turan 20
Însan / ‘Ezîz Misqeynterî 22
Xweş Awazên Yunusan/ Azad Rêbîwar 23
Herf û Noqte / Fexreddîn Şemrexî 24
Halê Ûmmeta Îslam/ Mela ‘Elîyê Êzdarî 27
Ez im! MEMO!/ Fethî Eyyubî 28
Exlaqê Pêxember ‘E. S/ Abdurrahîm Omerî 32
Tu Mêvanî/ M. Salih Misqeynterî 32
Hevpeyvîn/ Kelhaamed 36
Ewel Ku Yarê Dame/ Melayê Cezerî 37
Tew Dinya-18/ Cewdet Karaman 38
Ne Welat û Ne Xebatim/ ‘Ebdullatîf Neqşî 42
Li Ser We Em Hezînin/ Mela Mizgîn 46
Şîretên Bi Rumet-2/ M. Mehmud Tibyatî 47
Bila Qibla Me Yek Be/ Abdulbaqî Botî 48
Pirsgirêka Kurd/ ‘Ebdulkadîr Tûran 50
Selam û Qiymetê Selamê / M. Mehmud Tibyatî ... 52
Ey Gelî Xorta! / Ebuzer Bayram 53
Li Ser Kurdîstanê Selat û Tekbîr/ Şerif Emîn 54
Qıssеta Dû Zilama/ M. Mehdî Hilmî 57
Ev Çi Bû Kuştin/ Mela ‘Elî ‘Îlmî 60
Bexçê Zarokan 61

15’ê Tirmehê



Nûreddin Qoserî

30

Xwedêyo!



Muhemmed Şakir

34

Sê Kom Ax



Mamoste Şemrexî

43

kelhaamed
bangaheq jî
Kovara Islamî Çandî û Hunerî

Sal (Yıl) : 8 ❖ Jimar (Sayı) : 30 ❖ Biha (Fiyat) : 8 TL

Payîz (Îlon- Cotmeh - Mijdar) 2016

❖

Xwedî û Berpirsîyarê Nivîsaran (Sahibi ve Yazı işleri Müdürü): Abdulkudus YALÇIN

❖

Ciyê İdarê (İdare Yeri) : Yavuz Selim Mah. Mehmetçik Sk. No:71 K: 3/E Esenler/İSTANBUL

❖

Têkilî (İletişim - Sipariş):
Tel : 0212 562 60 06

Web: www.kelhaamed.com
Mail: bangaheqq@gmail.com

❖

PTT Hesap No: Abdulhalim TÜRE - 591 87 91

❖

Yaygın Süreli

❖

Çapxane (Matbaa):
DERGAH OFSET : 0212 489 33 33

❖

Nîşe (Not): Mesulîyeta Ramanên Nivîsaran aîdê Nivîskaran e. Berhemên têne şandin nayên vegerandin.

www.arsivakurdi.org



Ji Qur'ana Mecîd Çend Pend û Şîret

Geli Bawermendan-4

بِسْمِ اللَّهِ الرَّحْمَٰنِ الرَّحِيمِ

Gelî bawermendan! Dema hun ji bo (edakirina nimêjê) rabûn ruyê xwe û herdû destên xwe 'heta enîşka bişon, serê xwe mesi'h bikin û herdû lingên xwe heta paniyan bişon. Eger hûn cenabet (bi 'xuslê bigrin û) xwe tahir bikin. Lakîn eger hûn nexweş an jî di seferê de bin weyaxud yek ji we ji ser destava mezin hatibe weya dest dabe jinan û îmkana peydakirina avê jî tunebe îdî berê xwe bidin axeke paqij (û wihareng) teyyemmum bikin: Rû û deste xwe bi wê axê mesih bikin. Ellah Te'ala naxwaze ku astengîyan li ber we derîne welakîn dixwaze ku we paqij bike û nî'metê xwe li ser we temam ke da ku hûn şukur bikin. (Maîde: 6)

Gelî bawermendan! Nî'metên Ellah Te'ala ê ku li ser we ne bi bîr bînin. Bi bîr bînin ku wextekî qewmekî niyet kir ku destdirêjî we bike. Lê Ellah Te'ala (bû mani' û) destê wan ji ser we rakir. Her ji Xwedê Te'ala bitirsin (û xwe ji hemî neqencîyan bi parêzin.) Bila mu'mîn tewekila xwe her bi Xwedê Te'ala bînin. (Maîde: 11)

Gelî bawermendan! Ji Ellah Te'ala bitirsin û xwe (ji hemî neqencî û nebaşîya) biparêzin. Û ji bo nêzikbûna bi bal wî ve li wesîleyan bigerin. Û di riya wî de cîhadê bikin da ku hun bigîjin felahê. (Maîde: 34)

Gelî bawermendan! (Eman ha eman! Nebî nebî) hûn Yehûdî û Nesranîyan ji xwe re nekin dost. (Lewra) ew her dostê hev in. Kî ji we ku wan ji xwe re bike dost bê gûman îdî ew jî ji wan e. Bê guman Ellah Te'ala qewmê zalim hew tînit ser hîdayetê. (Maîde: 51)

Gelî bawemendan! Ji nav we herçî kesê ku ji dînê xwe vegerin (bila baş bizanibin ku) Ellah Te'ala wê di dewsa wan de qewmekî wilo bîne ku hem Ellah Te'ala ji wan hes dike hem jî ew ji Ellah Te'ala hes dikin. Ew li hember mu'mîna bi zillet li hember kafira bi 'îzzet in. Ew di riya Ellah Te'ala de cîhad dikin û (di hengâma vê cîhadê de) ji lome û gazinên lomakeran natirsin. Her eve fedlek ji fedla Ellah T'ala ku kê bixwaze dide wî. Ellah Te'ala Wesî' û 'Elîm e. (Maîde: 54)

Gelî bawermendan! (Eman ha eman! Nebî Nebî) hûn wan kesên ku berya we kitêb ji wan re dahatiye û henekê xwe bi dînê we dikin û pê di leyizin û temmamê kafirên dî ji xwe re nekin dost. Eger hûn (ji dil û can) mu'mîn in (her) ji Ellah Te'ala bitirsin (û xwe ji dijraberîya wî biparêzin.) (Maîde: 57)

Gelî bawermendan! (Nebî nebî!) Hûn wan tiştên pak û temîzê ku Ellah Te'ala ji we re 'helal kiriye li xwe heram nekin û ji hed dernekevin. Lewra bêguman Ellah Te'ala ji hedderketiyan hes nake. (Maîde: 87)

Gelî Bawermendan! Bê guman qûmar, araq, kevirên çikandî, tîrên fala bi tenê pîsîtîyên ji 'emelê şeytan in. (Madem heqîqet wihareng e) îdî xwe ji wan ('emelên pîs) biprêzin da ku hûn bigîjin felahê. (Maîde: 90)

Gelî bawermendan! Bê gûman Ellah Te 'ala dê we bi seydên wisa bi ceribîne ku dest û rimên we digîjin wan. (Hîkmeta vê ceribandinê ew e ku) bê ka kî ji we ji 'xeybî ve yi wî ditirse weya kî natisrse (bi aşîkarî) derkevit meydanê. İdî kî ku (piştî vê beyanê) ji hed derkeve 'ezabek elîm ji bo wî heye. (Maîde: 95)

1-) Di vir de mebest ji wesîleyan cehd û 'xeyreta ji bo lêgerîna riya 'emelên salih e. Lewra 'emelê salih ji nêzikbûna bi bal Xweda ve wesîle ya herî payerberz e.

2-) Mebest ji Yehûdî û Nesranî: Cihû û Fille ne

3-) Yani li hember mu'mîna sernerm û dilgerm û dilhenûn û bi merhemet in. Li hember kafira jî serbilind û 'ezîz û şedîd in.

4-) Wesî': Wesfek ji wesfê Ellah te'ala ye ku sînor û hidûd ji lutf û İshan û kerem û merhemeta Ellah Te 'ala re nînî. Lewra lutf û kerema wî bê hed û hîsab e.

'Elîm: Ew wesfê Xweda ye ku Xwedê Te'ala tiştî bi heqî dizane .

www.arsivakurdi.org

خروشێ تێ گوهێ مه﴾ وان شەش ئالیان ئەڤن:

﴿1- ضەرورەت﴾: ئالیێ ئیحتیاجا پڕ بشددەت ﴿2- ئینجیزاب﴾: ئالیێ مەجبوریەتا نێزبون و بهەڤزەلقاندنێ ﴿3- تەمایول﴾: ئالیێ مەیلا ببال یەکبونێڤە ﴿4- تەجاروب﴾: ئالیێ ستەندنا ئالیکاریێ ژ وان تەجروبەیێن کو دسەرێ مەڕە دەرباسبونە ﴿5- تەجاووب﴾: ئالیێ چونا ببال هەڤڤە ژبۆ ئالیکاریێ ﴿6- تەواتور﴾: ژبۆ پاشەڕڕۆژەکە بڕومەت د هەر دەوریدە ڤان ریا هاتنە نەقلکرن.

﴿دەما ڤان هەر شەش ئالیان بگهیژن هەڤ وان دلۆپێن ژهەڤ دور، وان تیرژێن ژهەڤ بەلاوەلا وێ دەست بدن هەڤ. وێ مەسافا درێژي دناڤ واندە وێ ڕابە، وێ حاووزکي ژ ئاڤا حەیاتێ چێببە، وێ ئەلەکتریکەك کو دنیایێ تەڤي ڕۆنیکە چێببە. چمکي خوەشکایا کەمالیەتێ ئو ڕۆنایا دلشادیێ ئو پڕبونا خوەشکایێ ئو سەلامەتیا دلو ئوژدان هەر دینە﴾ دل تەنگاسي ئو بێڕومەتي ئو بێڕەحمي ئو بێئوژداني ئو هێسیرتیو بەلەنگازي ژدورکەتنا دینە ئو ژتەرکاندنا براتیا موسلمانایە، ژ نەژادبەرەستي ئو تەعصصوبا قەومیە، ژهەڤالتیا غیري موسلمانایە

س: - ﴿ئەمێ نها پرسێ ژحوڕیتێ بکن، حوڕیەت چیە کو هەوقاس خەبەردانێ هەڤدو ناگرن دحەقێ وێدە تێن گۆتن؟ هەرکێ تشکي دبێژە ئو هەرکێ ژبۆ وێ خیالەکي چێدکە﴾

ج: - ﴿کەسەکي کو ئەڤ سەرێ بیست سالایە مەسەلا حوڕیەتێ دشۆپینە، حەتا دخەونێ خوەدە ژي وێ دشۆپینە ئو بڤێ حەسرەتێ تەرکا هەر تشتي کریە کارە جەوابەکە خوەشك بدە وە﴾ کەسێ کو وێ ناس نەکە ئو د حەقە وێدە خەبەر بدە عالمبە ژي وێ غەلەط بێژە

س: - ﴿ژمەڕە حوڕیەتێ پر خەراب دانە ناسکرن، وەك هاوێ کو د حوڕیەتێدە کي چ ڕەزالەت و سەفاهەتێ بکە ژي کەس ژوانڕە تشکي نابێژە، هەما زرارێ نەدن کەسي بەسە. گەلۆ وەڕێیە، ڤانا ڕاستن؟﴾

ج: - ﴿ئەوانیێ وەڕێ﴾ ئێ کو ظەن دکن حوڕیەت بمەعنی سەربەستیا ڕەزالەتێیە ﴿نە کو حوڕیەتێ دخوازن، سەفاهەت و ڕەزالەتا خوە ئیعلان دکن، وەك زارۆکا لمەعنیا دگڕن و تەوشیا دکن. چمکي حوڕیەتا کو شەریعەت تەعریف دکە بئادابێ شەریعەتێ هاتیە ئەدەبکرن و خەملاندن. یان نا، سەربەستیا د سەفاهەتو ڕەزالەتێدە نە حوڕیەتە، ڕاستي وێا حەیوانتیە ئو زۆردداریا شەیطانە بندەستیا ژ نەفسا ئەمارە ڕەیە﴾ کەسێ کو بئا خوەدا نەکە بئا نەفسێ بکە ئەو نابە حوڕ دبە هێسیرێ نەفسا خوە. کەسێ کو دفکر و ئەدەب و عەمەلدە نەبە عەبدێ خوەدا ئو بگۆتنا هنك ئینسانا بکە ئەو دبە کۆلێ وان ئینسانا. ڤي حالێ کو تام زددێ حوڕیەتێ یە مخابن ژێڕە تێ گۆتن حوڕیەت

﴿حوڕیەتا عمومي؛ یەك بیەك حوڕیەتا هەر فەردیە. دحوڕیەتێدە گەرەك زرارا ئینسان نە لشەخصێ وي ببە نە ژي لغەرێ وي ببە﴾

س: - ﴿هنك ئینسان حوڕیەتێ وەك تە مەعنە ناکن، ئو هنك ژۆنتورك هەنە دەرحەقێ کرنو تەورێ واندە تشتێ نە خوەش تێن گۆتن، چمکي هنك ژوان ڕۆژیا مەها ڕەمەزانێ دخون، ئاراقێ ڤەدخون، لمێژێ تەرك دکن. کەسێ کو خایینتیێ بئەمرێ خوداڕە بکە وێ بمللەتڕە چەوا صادقبە؟﴾

ج: - ﴿بلێ، حەقێ وە هەیە. فەقەط حەمیەت یاني غیرەتا دین جودایە کار ژي جودایە. ئەو قەلبو ئوژدانێ کو بفەزائیلێ ئیسلامیە نە هاتبە خەملاندن ژوي حەمیەت و عەدالەت و صەداقەتا حەقیقي نایێ هێڤیکرن. بەس کار و صنعەت بسەبەب کو جودانە زلامکي فاسق ژي کارە شفانتیکي خوەشك بکە، زلامکي عەیاشێ کو پڕ ئاراقێ ڤەدخوە دەما کو نە سەرخوەشبە کارە قەنج سعەتا چێکە. ئیژا ئانها کەسێ هەم دیندار هەم ژي ئەهلێ کارن، یاني فەزیلەت و حەمیەتێ ئو نورا قەلب و نورا فکري دخوەدە جەمعکرنە هندکن، تێرناکن. مادەم وەڕێیە ئەمێ نە دینداربەژي یان ئێ ئەهل تەرجیح بکن یان ژي ئێ نەئەهلێ دیندار تەرجیح بکن. بەس د صنعەتدە مەهارەت یاني کەسێن ئەهل تێن تەرجیحکرن. هەم ئەڤژي هەیە، وان کەسێ بێلمێژ و سەرخوەش نە ژۆنترکن بەلکي ئەوانا شۆنترکن (یاني ترکێ پیسێ خەرابن) ڕافزیێ خۆرتێ ترکانە، ڕافزیێ هەرتشتي هەنە ئێ حوڕیەتێ ژي کۆلێ نەفسێنە﴾

ڕافزیێ هەرتشتي هەنه ئێ حوڕیەتێ ژي کۆلێ نەفسێنە



عبد الصمد حلمي

بسم الله الرحمن الرحيم

﴿بەلێ، پێکنەئانین نە بمەعنا ئینکارکرنێیە﴾ کەسێ مسلمان بکرنا گونەهان کافر نابە ﴿هەم بقاسي پازدە قاتێ مسلمانێ ناڤ دەولەتا عوثماني دبن سیاسەتا ئەجنەبیاندە موسلمان هنە، ئو تو زرار نایێ دینێ وان، ئیژا ئەمێ دڤێ دەولەتا عوثمانیدە وێ چاوا زرار وەرە دینێ مە﴾ دینو باوەریا ئینسانا نە قائمێ بدەولەتێیە ﴿ئو دەولەتا مە ئیسلام، دڤێ دەولەتێدە دینێ حاکم ئیسلامە، ئەساسێ سیاسەتا وێ ژي ئەڤ ماددەیە: «دینێ ڤێ دەولەتێ ئیسلامە، موحافەزەکرنا ڤي ئەساسي وەظیفا مەیە، چمکي دینێ ئیسلامێ هاڤێنێ حەیاتا مللەتێ مەیە»﴾ دەولەتەکە کو د قانونا وێیا ئەساسیدە ئەڤ ماددە هەبە زرارێ نادە دینێ وە.

ددەولەتا عوثمانیدە ئەڤ ماددە هەبو، دەما دەولەتا جمهوریەتا ترکیێ ددەوسا وێدە ئاڤابو وێ دەمێ دقانونا وێیا ئەساسیدە ژي ئەڤ ماددە هەبو، پشترە ڕەژما جمهوریەتێ دژمنانتیا خوەیا لهەمبەر مسلمانا ئەشکەرەکر، ناڤێ شەریعەتێ کرن ئیرتیجا ئو بهەمي موئەسسەسەئێن خوە ئێریشي سەر ئیسلامێ کر

س: - ﴿دێمەك حکومەت ژنها پێڤە ژي وێ خزمەتا دین و ئیسلامێ بکە﴾

ج:- ﴿هاي هاي وێ بکە، ژ ئیدارەڤانان هنك بێعاقلێ بێدین موستەسنا هەدەف و مەقسەدا حکومەتێ (حکومەتا عثماني یا سالا 0191) ئەوە کو بسڕڕێ ئایەتا (إِنَّمَا الْمُؤْمِنُونَ إِخْوَةٌ) -یانی ئانجاخ موئمن برانە- یاني بسڕڕێ براتیا ئیمانیێ سێصەد میلیۆن کەسان (وێ دەمێ هەژمارا موسلمانا هەوقاسبو، نها ژي زێدەي ملیار و نیڤێیە) بکە یەك وجود. هەدەفا حکومەتێ ڤشاري ئو دوربە ژي دخوازە سلسلا ئیسلامیەتا نوراني تەقویە بکە ئو موحافەزە بکە﴾ وێ سلسلا نوراني ژێغەمبەر صلی الله علیه وسلم دەست پێ کریە، وێ حەتا قیامەتێ دەوام بکە، حکومەتا موسلمانا گەرەك دناڤێنا موسلمانانده یەکیتي ئو براتیێ چێکە، هەدەفا دور ئەوە کو هەمي موسلمانێ دنیایێ بکە یەك وجود

﴿چمکي تشتێ کو حکومەت پشتا خوە بدیێ ئو وێ لپیا بدە سەکنانڈن ئەڤ سلسلا یەکیتیا موسلمانا یە. هەروەکي دلۆپێ بارانێ دەما ژهەڤ بەلاوەلا دمینن زو زوادبن، طیرژێن رۆنایێ دەما دوري هەڤبن زو دطەفن﴾ ژهەڤکەتن و دورکەتن زرارێ دده هەر موسلماني

﴿ژبۆ کو ئەم نە طەفن ئو مەحو نەبن جەنایێ فەییازێ موطلەق ژهێلا ئەزەلڤە گازي مە دکە ژمەرە دبێژە: (لاَ تَفَرَّقُوا) یاني ژهەڤ بەلا نەبن، (لاَ تَقْنَطُوا) یاني بێهێڤي نەبن، ژ شەش ئالیان ڤە دەنگێ (لا تَقْنَطُوا) بجۆش و

www.arsivakurdi.org

Rafiziyê Her Tiştî Hene, Ê Huriyetê Jî Kolê Nefsê Ne

✍ M. 'Ebdussemed Hilmi



Bîsmîllahîrrehmanîrrehîm

"Belê, pêkneanîn ne bi me'na înkarê ye." Kesê musluman bi kirina gunehan nabe kafir. "Hem bi qasî pazde katê muslumanê nav dewleta 'Usmanî di bin siyaseta ecnebiyan de musluman hene û tu zirar nayê dînî wan. Îja em, ê di vê dewleta 'Usmanî de wê çawa zirar were dînê me." Dîn û baweriya însana ne qaimê bi dewletê ye. "Û dewleta me Îslam e, di vê dewletê de dînê hakim Îslam e. Esasê siyaseta wê jî ev madde ye: 'Dînê vê dewltê Îslam e, muhafezekirina vî esasî wezîfa me ye. Çimkî dînî Îslamê havênê heyata milletê me ye." Dewleteke ku di qanûna wêya esasî de ev madde hebe zirarê nade dînê we.

Di dewleta 'Usmanî de ev madde hebû. Dema dewleta cumhûriyeta Tirkiyê di dewsa wê da ava bû wê demê di qanûna wê ya esasî de jî ev madde hebû. Piştre rejima cumhûriyetê dijminantiy xwe ya li hember muslumana eşkere kir, navê şerî'etê kirin îrtîca û bi hemî müesseseên xwe êrîşî ser Îslamê kir.

www.arsivakurdi.org

www.bangaheq.com

S: - "Dêmek hukûmet ji niha pêve jî wê xizmeta dîn û Îslamê bike"

C: - "Hay hay wê bike. Ji îdarevanan hinik bê'eqlê bê-dîn müstesna, hedef û meqseda hukumetê (hukûmeta 'Usmani ya sala 1910a) ewe ku bi sirrê ayeta **"înnemel mûmînûne îxweh" (**yanî ancax mumin birane) yanî bi sir-rê biratiya îmanê sêsed milyon kesan bike yek wucûd. He-defa hukûmetê veşarî û dûr be jî dixwaze silsila Îslamiyeta nûranî teqwiye bike û muhafeze bike" wê silsila nûranî ji Pêğember sallalhû 'eleyhî wesellem dest pêkiriye, wê heta qiyametê dewam bike. Hukûmeta muslumana gerek di navbêna muslumanan de yekîtî û biratiyê çêke. Hedefa dûr ew e ku hemî muslumanê dinyayê bike yek wucûd.

"Çimkî tiştê ku hukûmet pişta xwe bidyê û hukûmetê li piya bide sekinandin ev silsila yekîtiya muslumana ye. Herwekî dilopê baranê dema ji hev belawela dimînin zû ziwa dibin. Tîrijên ronayîyê dema dûrîhev bin zû di tefin." Jihevketin û dûrketin zirarê dide her muslumanî.

"Ji bo ku em netefin û mehû nebin Cenabê Feyyazê Mut-leq ji hêla ezel ve gazî me dike ji me re dibêje: Lateferreqû, yanî ji hev bela nebin; Lateqnetû, yanî bêhêvî nebin.

Ji şeş aliyan ve dengê Lateqnetû bi coş û xurûşê tê guhê me." Wan şeş aliyan ev in:

"1- Zerûret": *Aliyê îhtiyaciya pir bi şiddet.*

"2- Încîzab": *Aliyê mecbûriyeta nêzbûn û bihevzeliqandinê.*

"3- Temayul": *Aliyê meyla bibal yekbûnê ve.*

"4- Tecarub": *Aliyê sitendina alîkariyê ji wan tecrubeyên ku di serê me re derbasbûne.*

"5- Tecawub": *Aliyê çûna bi bal hev ve ji bo alîkariyê.*

"6- Tewatur": *Ji bo paşerojeke bi rûmet di her dewrê de van riya hatine neqilkirin.*

"Dema van her şeş aliyan bighêjin hev wan dilopên ji hev dûr, wan tîrijên ji hev belawela wê dest bidin hev. Wê mesafa dirêjî di nav wan de wê rabe. Wê hawûzkî ji ava heyatê çê bibe. Wê elektrîkek ku dinyayê tevî ronî dike çêbibe. Çimki xweşkayiya kemaliyetê û ronaya dil-şadiyê û pirbûna xweşkayiyê û selametiya dil û ûjdan her dîn e." Diltengasî û bêrûmetî û bêrehmî û bêûjdanî û hêsirtîw belengazî ji dûrketina dîn e û ji terikandina bi-ratiya muslumanaye, ji nejadperestî û te'essuba qewmî ye, ji hevaltiya ğeyrîmuslumana ye.

S: - "Emê niha pirsê ji hürriyetê bikin. Hurriyet çiye ku hewqas xeberdanê hevdû nagrin di heqê wê de tên gotin? Herke tiştî dibêje û herkê ji bo wê xiyalkî çêdike."

C: - "Kesekî ku ev serê bîst sala ye mesela hurriyetê dişopîne, hetta di xewnê xwe de jî wê dişopîne û bi vê hesretê terka her tiştî kiriye kare cewabeke xweşik bide we." Kesê ku wê nas nekeû di heqê wê de xeber bide 'alim be jî wê ğelet bêje.

S: - "Ji me re huriyetê pir xerab dene naskirin. Wek hawê ku di huriyetê de kî çi rezalet û sefahetê bike jî kes ji wan re tiştkî nabêje, hema zirarê nedin kesî bes e. Gelo werê ye vana rast in?"

C: - "Ewanê werê, ê ku zendikin huriyet bi me'na ser-bestiya rezaletê ye, ne ku hurtiyetê dixwazin. Sefahet û rezaleta xwe î'lan dikin. Wek zaroka li me'niya digerin û tewşiya dikin. Çimkî huriyeta ku şerî'et te'rîf dike bi ada-bên şerî'etê hatiye edebkirin xemilandin. Yan na, serbes-tiya di sefahet û rezaletê de ne huriyet e, bi rastî wiya heywantiye û zordariya şeytan e, bindestiya ji nefsa em-mare re ye." Kesê ku bi a Xweda neke, bi a nefsê bike ew nabe hur, dibe hêsîrê nefs xwe. Kesê ku di fikr û edeb û 'emel de nebe 'ebdê Xweda û bi gotian hinik însana bike ew dibe kolê wan însana. Vî halê ku tam ziddê huriyetê ye, mixabin jê re tê gotin huriyet.

"Huriyeta 'umûmî; yek bi yek huriyeta her ferdî ye. Di huriyetê de gerek zirara însan ne li şexsê wî bibe ne jî li ğeyrê wî bibe."

S: - "Hinik însan huriyetê wek te me'ne nakin. Û hinik jonturk hene derheqê kirin û tewrê wan de tiştê nexweş tên gotin. Çimkî hinik ji wan rojiya meha remezanê dixun, araqê vedixun, limêj nakin. Kesê ku xayîntiyê bi emrê Xwe-da re bike wê bi millet re çewa sadiq be."

C: - "Belê heqê we heye. Feqet hemiyet, yanî ğîreta dîn cuda ye kar jî cüda ye. Ew qelb û ûjdanê ku bi fefzailê Îslamiye ne hatibe xemilandin, ji wî hemiyet û 'edalet û sedaqeta heqîqî nayê hêvîkirin. Bes kar û sin'et bi sebeb ku cudane zilamkî fasik jî kare şivantîkî xweşik bike. Zi-lamkî 'eyaşê ku pir araqê vedixwe dema ku ne serxweş be kare qenc si'eta çeke. Îja anha kesê hem dindar hem jî ehlê kar in, yanî fezîlt û hemiyetê û nûra qelb û nûra fikrî di xwe de cem'kirine hindikin, têrnakin. Madem werêye emê, ne dîndar be jî yan ê ehil tercih bikin yan jî ê neehlê dîndar tercih bikin. Bes di sin'et de meharet, yanî kesên ehil tên tercîhkirin. Hem ev jî heye; wan kesên bê limêj û serxweş ne jontirk in, belkî ewana şontirk in (yanî Tirkê pîsê xerab in), rafiziyê xortê Tirka ne. Rafiziyê her tiştî hene, ê huriyetê jî kolê nefsê ne.

SEHA SÛRETÊ KAFÎRÛN

✍ Mela Muhemmedê BÊCIRMANÎ

بِسْمِ اللّٰهِ الرَّحْمٰنِ الرَّحِيمِ

قُلْ يَا اَيُّهَا الْكَافِرُونَ ﴿١﴾ لَآ اَعْبُدُ مَا تَعْبُدُونَ ﴿٢﴾ وَلَآ اَنْتُمْ عَابِدُونَ مَآ اَعْبُدُ ﴿٣﴾

وَلَآ اَنَا عَابِدٌ مَا عَبَدْتُمْ ﴿٤﴾ وَلَآ اَنْتُمْ عَابِدُونَ مَآ اَعْبُدُ ﴿٥﴾ لَكُمْ دِينُكُمْ وَلِيَ دِينِ ﴿٦﴾

“Bêje: Ey gelî Kafiran! Ewên ku hûn ‘îbadetê wan dikin (dıparêzin) ez îbadetê wan nakim (naperêzim). Hal eve hûn Jî ne 'îbadet kerê ê ku ez îbadetê wî dikim. Ez jî ne îbadetkerê wanên kû hûn îbadetên wan dikin. Hûn jî ne îbadet kerên Ê kû ez 'îbadetê wî dikim. Dînê we ji we re. Dînê min ji mire.”



Gelî bira û Xweha! werin em bi hev re di me'na vî sûretî de jî bifikirin û li serê baş bisekinin. Em bi nêrin bê ka Xweda û Xwediyê me emrê me bi çi dike. Me'lum e muşrikên Mekkehê têne ba Resulê Xweda. Jê re dibêjin: “Em û ti di naw xwede bazerekî bikin û em li serê li hev wer in. Were saleki emê 'ibadetê Rebbê te bikin. Salekê jî ti ibadetê senemên me bike. Bi vê sedemê Xweda Te’ala vî sûretî nazil dike û Resûlê Xweda pê cewaba wan dide û teklîfa wan reddike.Dîsa Me'lûm e sebebê nuzûla ayetan her çiqas xasbe jî xîtab ‘amm e.

Muxatebên ayetan hetani qiyametê temamê neslên insana ne. ji ber vê heqîqetê hepsa vî sûretî di wan Kafirên wî zemani de (kû îbadetê hinek senemên ji kevir û dara dikirin) şaş e. Lew ra Kafirên her zemaneki heta ên hev mekaneki hinek tiştên ji hev cuda ji xwe re kirine rê, îlah û senem û îbadetên wan dikin. Wan di parêzin. Bilxasse di dema meyî îro de ‘îbadetê sanema bi hawê berê gelek kêmbûye. Belê hinek senemên nû hatine çêkirin

www.arsivakurdi.org

www.bangaheq.com

û ji wan re îbadet bi hawakî nû tê kirin û têne hebandin. Mesela Çawa qewmmên Nmrûd û Fîr'ewn wan ji xwe re kiribûn îlah û bê îstîsna îta'eta wan dikirin, di dema me de jî hineka Lenîn, sitalîn, hina jî mawo hina jî Kemal ji xwe re kiribûne îlah û pût, ita'eta wan dikirin. Di pey wan de jî li pey fikr û qanûnên wan diçin. Hina jî **qewmiyet û rehperestiya ku 'ewil îblîs paristî,** diparêzin. Û temamê heyata xwe li ser wî **esasê ketî** divên awabikin. Hina jî kêf û şehwet û hewa xwe yî nefsanî ji xwe re kirine îlah. Bê qeyd û şert **ita'eta şehwet û kêfa xwe dikin**. Hinek jî bûne **'ebdê mal û pera**. wan di seriya her tiştî de digrin. Hinek jî bûne 'ebdê cah û meqam. Her tiştî li gori wan dikin.

Rebbê me û tevên kainatê emrê me dike ku em xwe Ji temamên cûreyên sanema, pûta û me'budên batil bêrî bikin û îlan bikin û bêjin: **Gelî kafir û bê ola!** ji Xwedayê kainatê pêve hemî tiştê hûn wan diparêzin ez naparêzim / ez hürmet û qimetê nadime wan û nadim pey wan. Dînê we ji were û ê min ji min re. Piştî ku Rebbê me ev emir daye me, me jî pê îman anîye, bi Quranê emrê wî qebûl kiriye û bi xwendina wê me îlan kiriye, divê de em ji temamên sanem û Me'bûdên Kafira dûr dibin. Baweriya me yî bi xweda û dînê wîyê heq **dive kû em li pey Kêf û xweziya xwe neçin.** Divê em li pey emrê xweda ê xwe herin. Tiştên muxalifên emrên wî be divê em xwe jê dûr bigrin û li hember derkevin. Me'na 'îbadetkirina ji xweda re ev e. Yan na wê gotin û kirinên me li hev ne nêrin. Ev yek jî ne li dunyayê û ne jî li axîretê wê feyda me nede.

Ji ber vê heqîqet û rastiya xuya divê em hay ji xwe hebin şeytanên îns û cinnî û hewa nefsa me, me najo bibal îta'et û îbadetê ğeyrê xweda ve. Çawa em divê xwe ji senem û pûtên ji dar û Keviran bi parêzin divê em xwe ji serokên kafir û bê ol jî bi parêzin. Divê em xwe ji fikr û dozên kufrê jî bi parêzin. Di vê em xwe ji te'essub û nijadperestiyê jî bi parêzin. Di vê em xwe ji teqlida moda û çûna li pey 'adetên Kufrê jî bi parêzin. **Divê em xwe ji îbadetê cah, mal û ewlada jî bi parêzin.** Lewra ev heryekî senem û pûtek in divê em perestgah û mizgefta dilê xwe ji wan pak û paqij bigrin. Bi vî hawayî dakû fikr û niyetê me 'emel û kirinê me rabûn û rûniştinê me, lebat û nivênên me ğeydû haştiyên me tev bibin 'aîdê xweda û li ser hesabê xweda Te'ala we Teqqeddes kesê ji vê yekê re muweffeq bûbe bi rehetî dikare ji Kafira re bêje: 'Dinê we ji we re û dînê min ji min re. /Hûn li pey dînê xwe. Ez li pey dînê xwe." Bes Kesê li pey serokên dijminên îslamê here ji fikr û dozên wan re bi xebite, biratiya 'esebî û qewmî bêxe ciyê biratiya îslamî, ji bedêla sunneta peyğember modê ji xwere bike rehber, axiretê jibîr bike dunyayê ji xwe re bike hedef... wê çawa bêjê 'gelî Kafira! dînê we ji we re û dînê min j imin re." Bêje jî gelo wê Kafir û musulmanên rast pê nekenin?!

Yanî însanê bi vî hawi nikare bi dilê rehet sûretê Kafirûn bi xweyne. Lewra gotin û kirinên wî li hev nanêrin. Aha ji ber kû ev suretê Pîroz vê heqîqeta Muhîm di xwe de digre, di rîwayetekî de Resûlê Xweda (salat û selamên xweda lêbin) gotiye: **"Ev sûret beramberê sêyeka Quranê ye** ". Di yekî de jî gotiye: "Beramberê çar yeka Qur'anê ye." İbni 'Ebbas gotiye: 'Di Quranê de sûretekî ji vî sûretî pirtir şeytan hêrs dike tûneye. Lewra (Bawerkirin û xwendina vî sûretî) Îmana tewhîdî û bêrîtiya ji Kufrêye." (Tefsîra Qurtubî Tefsîra sûretê Kafîrun) Hem jî ji ber vê heqîqeta muhim limêjên Kû di piştî Fatihê de sûretên diwan de werin xwendin nehatibin te'yînkirin sûnneta di teva de mirov vî sûretî û sûretê îxlas bi xune (Hedyetul-Hebib).

Hasilê Kelam ev sûret ji ber kû berîtiya ji şirke ye û meydan xwedandina ji Kafira re ye, Musulmanên vî sûretî bi xûne û pê emelke/ Xwe ji fikr û 'adetên Kufrê dûrke ji mûnafiqiyê tê paqijkirin û xweda nesreta wî li ser Kafira dide. Eva kû di Quranêde di pey vî sûretî de sûretê Nasir hatiye bi îhtimaleke mezin îşaret e bi bal vê heqîqetê ve. Xweda Te'ala me û we û temamên musulamana di rêya Qur'an û sûnnetê de bide meşandin. Amîn.

...Mela Ehmed Hilmî

Pêjn û nefesa âliman çiqas kêmket li ser ummetê zulûmat û îxaneta zingar me li ser sênga xwe dît. Bi cehlê em bûne derdest, herder şîn û girîn, avayî xera-bûn, çi qedr û qîmetên qedîm hunda bûn. Qelem şewitîn, murekkeb zuwa bû, welat perîşane Seyda. ‘Âlim bar dikin yek biyek.

Çi gotibû Resûlê Ekrem; “mirina ‘âlima mirina ‘âlemêye”. Du cara ez dişewitim ji boy çûna te. Carek me’lûmê herkesî-ye, cara din ‘âlimek bi tev secda xwey nebewî çû ji nava me, em tenê hiştin li vê dunya bê qîmet.

Di piştî çûna te bi sala zeman derbasbûn ku hêjî em çav li rêne. Ka pêjna heybeta âlimê vê malbatê heye tu bizîvirî ji rêya qudsî. Ax fîraq nayê hebandin Seyda, elema wê ji şewatê wirdeye.



www.arsiyakurdi.org

'Alimê "**Bîsmîllah**" ji sênga îxlasê dixweynin, bi yek herfekî li ser rûpelê heyatê li du cîhana seâdet dinivîsin. Çi kes hene di lêva de ji peyvê berjor naçin, piştî mirinê navê wan bi çemê tinebûnê de di herikin. Esera ji behra weraset bînakirî bi rêzên me'nayê hatîye hûnandin. Qelem û murekkeb, xet û defter rêz in jibo te'lîfa qelbên mu'min. Cîyê ku **murekkeba âlima lê biherike li wêder xûn narjê**. Li hember zulûmata cehlê bi rimbazîyû hunermendîyek serpêhatî, ayet ayet nûra hîreyê qelem pelê sorgula Muhammedî diweşîne. Ji derûnê asîman tîrijê îqra îlham dide rûyê zemîn. Şîrk bê çare ye, kufr û şeytan hiş berdane. Mektûba werasetê ji 'aliman re bi firrê dikeve ji hêlîna kevokê. Çiqas birînê naçar vebûne li ûmmetê murekkeb merhem danîne li ser dilê mecrûh her yek tebîbê dewrê. Her dilopek murekkeb birûska Qûr'anê tefsîr dikevin li rûpelê tarîxê. 'Emel û îxlas şîfa dinivîsin li ser sênga bikul 'âlimên âmil, bi qîyam û secda azadîyê. Bi îlhama Loqman û Îsa heyatê didin rûhên ji werema cehlê murdar ketî. Wird û zikir barana nîsanê havênê şeveqêne rojê dikemilînin.

Bi telîf û xerca heqiqetê wergerand bi heybet endamê xwe, 'âlimek bi îxlas e Mela Ahmed.

Bi qasî pêncîw çar sal ji 'umrê weqfê, em şahidin ku xwêdana 'ilmê rijandîye ser axa te'lîfê. Xezîna 'ilmê li sahilê kewserê di rêya se'yû cîhadê de li hember kûra cehlê xemilandîye rêz bi rêz. Dara qîyamê ku danî li dest û çengê me bi dûâyan û bi xwêdana 'ilmê hatî avdan. Sîyû sîwan ji ser me kêm nebû bi wefatê. Belê çûna 'âliman bal cennetê ji ê mayîn li heyatê gelek tenêbûnîye. Carna zemherira nîfaq û durûtîyê di zivistana 'esrê de derdiket pêşya wî. Bahoza ji ğerbê diherike tuxmê esaretê li axa welat direşîne, lê belê lehîya zanebûnê timî erda me şûştîye ji koletîya bê rûmet.

Di dema zor û kerbê de saqîyê havînê 'alimek teqwaye Mela Ahmed.

Pêjn û nefesa âliman çiqas kêmket li ser ummetê zulûmat û îxaneta zingar me li ser sênga xwe dît. Bi cehlê em bûne derdest, herder şîn û girîn, avayî xerabûn, çi qedr û qîmetên qedîm hunda bûn. Qelem şewitîn, murekkeb zuwa bû, welat perîşane Seyda. Âlim bar dikin yek biyek. Çi gotibû Resûlê Ekrem "mirina 'âlima mirina 'âlemêye". Du cara ez dişewitim jiboy çûna te. Carek me'lûmê herkesîye, cara din 'âlimek bi tev secda xwey nebewî çû ji nava me, em tenê hiştin li vê dunya bê qîmet. Di piştî çûna te bi sala zeman derbasbûn ku hêjî em çav li rêne. Ka pêjna heybeta âlimê vê malbatê heye tu bizîvirî ji rêya qudsî. Ax fîraq nayê hebandin Seyda, elema wê ji şewatê wirdeye.

Bi çûna te gelek kêmasî peyda bûn kanîyû mercî'â zana Mela Ahmed.

Bigre derê çîlexanê ey dil, yek Mela Ahmed bû bi qasî 'umrekî li ber van derda qam kir. Çi qîmet ji te re heye ku tu xwe didî ber vî barî. Bi yek xewnekî derîyê fîraqê vedibew ma qey rêya çûnnehatê tê meşandin? Ne ji hatif belki ji cîyek qudsî gazîye hat, lê me nizanibû hetanî piştî wusletê. Her tiştî li ser dev û rû hişt û çû bal gazîya şehsuwarê romehşerê. Di piştî sal û zemana de ez hêjî dişewitim, dil bûye kûra derda. Hesret û kerbê em berbat kirin ey dil. Hêjî dema ez 'âlimek dibînim li heyatê ez du hissa bihev re dikêşim. Her wekî Mela Ahmed li heyatêye …ez dihezinim. Hêjî bi tev heybet û pêjna xwe 'âlim hene li rû zemîn ez dilxweş dibim. Efsûna azadîyê di 'îlmê nubûwwetê de mewcûd e. Kesên zanawû 'âqilmend di îksîra îmanê de ğerq bûne. Murekkeba 'âlima efdeltirê xûna şehîdane.

Ji ber vê em qenc dizanin ku:

"ÂLİM WARİSÊ PEYĞEMBERANE"

Min xwend.
Li mîrasa te nihêrîw min dewran xwend.
Sedeqa carî girt destê xwew min heqîqet xwend.
Li şopa te em şahid in min însan xwend.
Guhdarîya qewlê te ye min cesaret xwend.
Derîyê te tim vekirye min merdî xwend.
Zikr û 'eşqa îlahîye min bilindî xwend.
Heskirina 'âlimane xêr û xweşî min zanebûn xwend.
Li suhbeta 'âliman rûniştim min şeri'et xwend
Mucadela heqqû batil bi 'âlima çû zirwetê min esalet xwend.
Ez meşîm li pey 'âlima, min îstîqamet xwend.
Ji hubra qelem nûra wehyê pêlda min îman xwend.
Qûr'anû sûnnet, îta'et û jîyane min Îslam xwend.
Brîna dil kûr e, şewat e min 'eşqê xwend.
Ez herikîm bibal rojê min me'rîfet xwend.
Bi stêrka re bûm heval min afaq xwend.
Bi kulîlka re ez vebûm min tebîetû exlaq xwend.
Herçî ku te naskirin û zanîn, ji bo bînakirina ûmmetê
'Alimek 'Amil e Warisê Peyğember Seydayê Mela Ehmed.

www.arsivakurdi.org



EY CANDAYÊ-J BO ŞERÎ'ET

✍ Mûhemmedê Gêra CE'FERÎ

Ey candayê ji bo şerî'et
Salihê qenc û bi ğîret
Heta hebin te-j bîr nakin
Birayê şehîdê li ğurbet

Şehîdê di riya quran
Gelek cesûr û qehreman
Minnet nedikir ji xayînan
Birayê şehîdê li ğurbet

Bi çûna te em hezîn in
Hêstira ji xûnê dirjînin
Le'netê li hova dibarînin
Birayê şehîdê li ğurbet

Ğulam û kûçikê ğerbiyê
Xûna mezlûm û beriyê
Divexun ev hovê çiyê
Birayê şehîdê li ğurbet

Li Belçîqa li ğurbetê
Bi destê çetê xiyanetê
Şehîd bûyî çûy cennetê
Birayê şehîdê li ğurbet

Ya Xuda qehr û le'netê
Bikê-l çetê xiyanetê
Li dunya û li axretê
Birayê şehîdê li ğurbet

Em hizb û benda Ellah in
Rêwiyê riya salih in
Fena fî sebîlîllah in
Birayê şehîdê li ğurbet

Xuda-b rehm û meğfîretê
Da te fedla şehadetê
Birî behşt û cennetê
Birayê şehîdê li ğurbet

Xuda li ser hewzê kewser
Me bighîne hev li wê der
Bike cîranê pêğember
Birayê şehîdê li ğurbet

www.arsivakurdi.org

DILDARÎ Û PERESTINA BI KUJERÊ XWE RE

✍ Mamoste Ehmed Dêrikî

Pêşîvanekî beradayî rabe û li ser navê bîrdoziya civakparêz gelê kurd bi darê zorê surgun bike û bi heman awayî çi qas mafên wan ên însanî hebin qedexe bike, gelo ev kes û bîrdoziyên wan wê ji kurda re bibin rê û rêç? Nexêr qet nabin û divê nebe jî.

Gava pelên salnameyê qulipî û dîrok sala 1937an nîşan da, jibo kurdan bi taybetî jî jibo Kurdên Qefkesyayê rêwîtiyeke bi darê zorê dest pêkir. Ev rêwîtî koçberkirin, surgunkirin, nefîkirin, tîbûn, birçîbûn û destavêtina namûsa wan bû. Xulase jibo gelê kurd rêbazek tunekirinê bû. Ji aliyê sazûmana civakparêz û pêşengê wê Stalîn ve bi awayeki zordarî kurdên Qefkesyayê ji axa xwe, ji xwezaya xwe, ji welatê xwe bi darê zorê hatin derxistin. Ev koçberkirin ber bi welatekî xerîb û sar ve pêk hat. Ev cihê ku ji wan re bûbû nîştiman û welat, Asyeya Navîn û Sibîrya bû. Bi taybetî Qazakîstan û Ozbekîstan bû. Hejmara van kurdên hatin surgunkirin bi dehhezaran bû. Kurdên Qefkesyayê berî bên surgunkirin rojname, radyo, pirtûk û dibistanê wan tên qedexekirin ango zimanê wan tê qedexekirin. Ev desthilatdariya sitemkarî heta mirina Stalîn ya di sala 1955an de berdewam kir. Kurdên Qefkesyayê di vê pêvajoya hijdej salan de di navbera man û nemanê de çûn û hatin.

Ev cihê ku ji wan re bûbû parêzgeh disa di bin desthilatdariya sazûmana civakparêz û pêşengê wê Stalîn de di bin zext û stemkariyê de dihat domandin. Ev koçberkirina bi darê zorê û jîyana di bin zulmê de heta bi mirina Stalin ango ya di 1955an de domiya. Piştî salên 1955an gef û zextên li ser kurdan sist bûn û ji wan kurdên hatibûn kaçberkirin jê hinek vegeriyan welatê xwe û hinek jî hîn li wê erdnîgariya surgunkirinê dijîn.

Kurdên ber bi Asyeya Navîn û Sibîryayê ve hatibûn koçberkirin, bi awayekî ji hev cuda wek gundan ji hev hatibûn veqetandin. Heta ku gava merivekî eqrebayên wan bimira û jibona biçûna serlêdana wan eqrebayên xwe, hewce bû ji desthilatdariya civakparêz destûr bihata stendin.

Ji rewşenbîr, zana, pêşeng û serdarên kurdan kîjana, van bûyerên qewimîye tîne rojevê û şermezar dike? Jiber zext û zilma li kurdên Qefkesyayê hatiye kirin ka gelo kî sazûmana civakparêz û pêşengê wê Stalîn tel'în dike?

Bi rastî neteweya kurd êdi hewceye ji kujerê xwe re nebe yar û evîndar. Vê rastiya hanê bibîne û dev ji birdoziyên wan ên tama xwînê têdeye berde. Hest û ramanên van pêşengên stemkar di nava xwe de nehewîne û neke nava xwe.



Civakparêz: Sosyalist
Cuda:Ayrı, Farklı
Desthilatdarî: Egemenlik
Destûr: İzin
Erdnîgarî: Coğrafya
Gef: Tehdit
Hest: Duygu
Kujer: Katil
Nefîkirin: Sürgün etmek
Netewe: Millet
Nîştiman: Yurt, Vatan, Ülke
Pêşeng: Lider, Öncü
Pêvajo: Süreç
Qedexe: Yasak
Rewşenbîr: Aydın, Entelektüel
Asyeya Navîn: Orta Asya
Salname: Takvim
Sazûman: Rejim, Sistem
Xweza: Doğa, Tabiat
Zext: Baskı

www.arsivakurd.org

TERBÎYA ZAROKAN

✍ Fatih AKMAN

Demekê di taxekê da mirovekî maldar dijîya. Du gedên wî hebûn. Belê zarokên wî, ne-hewî, bêcir û xerab bûn. Ji cîranê wî, mirovekî pîr 'aqilmend, xweşexlaq ku gelekî jê hez dikir hebû. Rojekê vî pîrê hêja jê re got:

"Cîran, tu van zarokên xwe bişîne ber mellê, terbî-yekê bide van zarokê xwe û 'ilmên dînî pêş wan ke jibo te wê pir bixêr be. Lewra zarokên 'ilmên dînî di'e-limin, exlaqên wan xweş dibe. Li min guhdar bike, tu xortî, belê ez ixtîyarekî roj û dewran derbaskirî me. Bila melle dersên edeb, terbîye, dîn û exlaq pêş wan bike. Piştra tê re'het bikî, gelek dua ji min re bikî û bixêr yad bikî."

Bavê zarokan kesekî zêde bêtecrube bû, pêre jî jibo maldar bû kûr û dûr nedifikirî. Lewra xort bû. Hebekî jî zêde biser dinyayê ve bû. Jiber wê hem qîmet neda gotina cîranê xwe yê aqilmend û hem jî jê ra wiha got: *"Ezê ji zarokên xwe re serweteke mezin bihêlim. Ev mal û milk besî wane, ne muhtacî dersên dînî û exlaqî ne."*

Di ser vê xeberdana wan da dem herikî, deh sal buhurîn. Rojekê zilam di firavînekê de ji kurê xwe yê biçuk re dibêje: *"Berxê min, tu karî qedeheke av bidî min?"* Kurê biçuk, ji bavê xwe re dibêje: *"Bavo! Wa av li wire, qedeh li wire, sura'hî li wire, avê ji xwe re dagir û vexwe."* Kurê wî yê mezin li gor aqlê xwe di'hezine û xwe davê nav gotinê. *"Bavo! Ma tu wî nasnakî, exlaqê wî nizanî. Çima tu jê avê dixwazî, sura'hî wa li wire, deste xwe bavêjê, ji xwe re dagire, vexwe û hinekî jî bidîyê."*

Belê çîroka me li vir qedîya. Ka em binêrin bê ji vê çîrokê em dikarin çi ders û şîretan ji xwe re derxin:

Yekemîn: Zarok fêkîyên malbatê ne. Mirov di pêş de bixwaze wan çewa bibîne, wan wilo bigihî-nin.

Duyemîn: Zarok sermaya dinya û axretê ne. Ê ku li dinyê wan bidest bixe, yan jî bi gotineke din ê ko dinya wan têxe bin xizmeta axîreta wan, di dinya û axretê de wan bi dest dixe.

Sêyemîn: Maldarîya mezin ewe ku mirov kari-be exlaq û edebê bide zarokan. Zarokên bê edep û exlaq mezin bibin, jibo dê û bav xisarin.

Çaremîn: Zarok îmtihanin, ya emê bi zarokan wenda bikin, ya emê bi wan biser kevin.

Pencemîn: Zarok di mesulîyeta mirovan dene. Barê berpirsyarîyê girane, divê em jê haydar bin û heqê wê bidin. Em şirîkê qencîya wan, xerabîya wan jî ne.

Îca divê berî her tiştî em li xwe binêrin, piştra li zarokên xwe, li terbiye û edeba wan, rewşa wan binêrin. Wesselam.



www.arsivakurdi.org

جَامِی چَارَیْ دَردَانِی

عَبْدُاللَّه جَوْهَرْ ✍

جَامِي قَلبُو جَانِ مَايِی
قَیْ مَا دَاءِمْ کِی اَللَّهِی
مَکَانِی رَحْمِی اَللَّهِی
جَایْ حُذُورُ سُکُونَتِی

جَامِی جَایْ ذِکْرُو طَاعَتِی
عِبَادَتُو سَلَامَتِی
مَکَانِی فِکْرُو عِزَّتِی
جَایْ بِرَاتِیُو وَحْدَتِی

جَامِی جَایْ عِلْمُو عِرْفَانِی
هِمْ مَدْرَسَیْ مُؤْمِنَانِی
مَکَانِ مَایْ سَعَادَتِی
جَایْ دَرسْ دَایِمشِی قُرْآنِی

جَامِی جَایْ جَهْدُو خَبَاتِی
هِمْ جَایْ دَعْوَتُو تَبْلِغِی
مَکَانِی وَعْظُو صُحْبَتِی
جَایْ شِیرَتُو کَرَامَتِی

جَامِی جَایْ تَزْکِی نَفْسِی
هِمْ جَایْ عَشْقِی مَعْشُوقَانِی
مَکَانِی ذِکْرِی اَللَّهِی
جَایْ بَاشِیُو مُحَبَّتِی

جَامِی مَارِی زَیْ جَنَّتِی
قَیْ شَیْطَانَانْ زَیْ زِنْدَانِی
مُؤْمِنَانْرِی جَایْ عِزَّتِی
جَایْ کِیفْوَشِیُو رَحَتِی

جَامِی جَایْ نُصْرَتُ اللَّهِی
هِمْ جَایْ هَیْبَتُو شَرَفِی
مَکَانِی عَسْکَرْ اَللَّهِی
جَایْ قُوَّتُو جَسَارَتِی

جَامِی مَحْکَمَیْ اِسلَامِی
هِمْ جَایْ حُکْمِی شَرِیعَتشی
مَکَانِی حَقُّو رَاشْتِیِی
جَایْ قُرْآنُ هِمْ سُنَّتِی

جَامِی جَایْ حُکْمُو حَلَالِی
هِمْ وَدَارْتِشِی حَرَامِی
مَکَانِی دَعْوَیْ اِسْلَامِی
جَایْ سَعَادَتُو آسَانِی

جَامِی چَارَیْ دَرْدَانِی
خَلَاصِی فِتْنَیْ دَجَّالِی
مَکَانِی جَعْدَیْ جَنَّتِی
جَیْ صُلْحُو عَدَالَتِی

www.arsiwakurdi.org

SÛREYÊ BEYYÎNE SER YO VATEYO KİLM

بسم الله الرحمن الرحيم

لَمْ يَكُنِ الَّذِينَ كَفَرُوا مِنْ أَهْلِ الْكِتَابِ وَالْمُشْرِكِينَ مُنفَكِّينَ حَتَّى تَأْتِيَهُمُ الْبَيِّنَةُ

رَسُولٌ مِّنَ اللَّهِ يَتْلُو صُحُفًا مُّطَهَّرَةً m فِيهَا كُتُبٌ قَيِّمَةٌ

✍ Yusuf Arifoğlu

Ayeta yoyini di kelîmeyê Beyyîne sure ri bîya nome.

Ina sure, guerê tay mufessîron Mekke di guerê tayini zî Medîne di nazil bîya. 8 ayet a.

Bi î'tîbarê tertîb ina sure, sureyê 'Eleq û Qedr dima yena. Ina muhîm a; çimkî sureyê 'Eleqi di wehyo sifte ra, sureyê Qedr di wextê nuzulê in wehiy ra û ina sure ura ura şirawitişê Qur'on û Peyğamberî ra behs bîyo.

Vercu, lazimîyê şirawitişê Resulî îzah bîyo. Ina lazimî hina wa: Ina dünya dı ha ehle k3itab ha kâfir ha fasiq ura i şirawitişê Resulî reya batilî ra xelisyeno. Delîlê in Resulî zî în î:

- In Resul, kîtabê Homê bi ura xu 'esil û raşt însononi rî vono.

- O kîtabêko yi ardo pak o û ğelatî ra çîki zî nêkowto mîyonê ci.

- Kîtabonê verînoni ra veta in kîtab, tahrif û xeribyayişi ra bi pawitişê Homê dur o.

Inay ra dima, ğelatî û çowtîyê Ehlê kîtab îzah bîya. Mesulîyetê ğelatî û çowtîyê yin 'aîdê yina. Eka Homa, yo Resul/Qasid bişirawo û yi bi wasitayê in qasidî ina hîdayeti ra rina dur bimonen û reya çowti ra bişîen mesulîyetê ğelatî yin rêk bena zêd.

Rina, ina sure ra ma inay musenî; Ê kîtab û Resulî hetê Homê ra şirawiyê mesajê hemin hina wa:

Reya heq ra ber terkkerdişê reyonê binon, tena bi îxlas Homê rî îbadet kerdiş, 'îbadet û te'eti di Homê rî şerik nêdepiştiş, nimac kerdiş, zikat dayiş bena.

Penî di hina fermon beno:

Ehlê kîtab û muşrîk, bawerî nêanî peyğamberî û cira rî açarnenî. Yi xirabê xirabon ê. Cezayê yin adirê Ceherme yo. Ê ku bawerî anî, 'amelo salîh kenî û ina ura di bi xowfê Homê cuwîyenî yi homê holon ê. Xelayê yin Cennet o. Homa yini ra wêş o, yi zî Homê xu ra wêş î.

Bi nomeyê Homê ku Rehman û Rehîm o.

1. Ehlê kîtab û muşrîkoni ra ê kafîr heto ci rî delîlêko zelal nêomen, yi kufrê xu veranêden!

Ehlê kîtab, ê ku peyğamberonê verînon ra weherê kîtab ê, yini rî bawerî kenî.

Muşrîk, ê ku peyğamberoni rî bawerî nêkenî û weherê kîtabeki zî nê yê.

În wurd grubî înkar û nankorî di zeypî yê. Qurono Kerîmi di, zaf ca di şîrkê ehle kîtab ra behs est o. Ma çend heb ayeton misal bîyar:

"Bîşek enonêko va: 'Homa, hîrini ra ayê hîrin o!' ê bî kâfir î."(Maîde: 73)

"Bîşek, ayêko vonî: 'Homa, lacê Meryem 'Îsa wo!' ê bî kâfir î."(Maîde: 17)

"Cuhudon va: 'Uzeyr lacê Homê wo!' Fileyoni zî va: 'Mesîh lacê Homê wo!' (Tewbe: 30)

Quron'i di yo ca di zî qey ehle kîtab wasifê 'muşrîk' nêşuğulîyo. Çimkî, yi dînê yin 'esil dînê tewhîd o; labelê yi bi 'emel û vatişê xu kowtî şirkî. Bî ehle kîtab, kom Homê rî şerik bidepiş bi nomekerdişi zî wu muşrîk o.



www.arsivakurdi.org

www.bangaheq.com

Çimkî, 'eslê dînê yin dînê şîrk o. Yin, çire dînê tewhîdi rî bawerî nêardi.

Cîyatî în wurd grubon tena wasif ser nê yo, hetê hukm û tetbîqkerdişê şerîati zî cîyatî est a:

Gueştê heywon eg bi deste yo ehlê kîtab ra bîyo birnayiş helal o; gera in heywon bi nomeyê Homê û bi usul bibiriyo.

Cîneka ehle kîtabi di zewaci zî helal o; labelê, o ku muşrîkon birno wuerdişê ey û cîneka muşrîkêki di zewac helal nê yo.

Îta di kelîmeyê 'kufr' me'nayêka hîra di şuğulîyawa û kufronê tewirin gena zerre xu. Mavac:

Tayî, Homê rî bawerî nêanî ayra kâfir î.

Tayî Home rî bawerî anî; labelê yi rî 'abdî qebul nêkenî inay ra kâfir î.

Tayî Home rî 'îbadet kenî; labelê zatê û îqtîdarê Homê rî şerîk depişên û inay ra benî kâfir.

Tayî, yoyitîyê Homê qebul kenî; labelê mahiyet ser Home rî şerik depişenî. Ê zî benî kâfir.

Tayî zî Homê rî bawerî kenî; labelê peyğamberê Yi rî bawerî nêkenî. Hina zî kiçî beno kâfir.

Tayî zî, la erzenî benatê peyğamberon; tiken qebul kenî tiken qebul nêkenî. Ina zî yo kafirî wa.

Elhasil, înson tewir tewir gure û 'emeloni ra beno kâfir.

Ina ayeti di Homa vono: 'Ehlê kîtab û muşrîkoni ra ê kafîr'. In vatiş ra, ina me'na nêvecêna; yin ra qismêk kâfir î. Raştîra me'nayê ayet hina wa:

Ê ku bî kafirî di qism ê: Yo, ehle kîtab yo zî muşrîk î. Ayeti di 'mîn' me'nayê tikeni di nêşuğulîyawa; me'nayê beyan/akerdişi di şuğulîyawa.

Halê kafiron hina wo; heta, heq ser delîlêk nêvîne bawerî nêkenî; labelê delîlêk bidîyo yin yan heq bi çimonê xu bîvînen rina zî zafê yin kafirîyî x ura fek veranêdonî. Delîlêk yan muetişê reya heq ra pê yi hîn nêeşkenî vacen, 'Kesî ma da'wet nêkerdî reya heq û hîdayet nêmuet ma rî.'

Ina raştî zaf ayetoni di bi uslubo tewirin fermon bîya. Mesela çend ayetoni di hina fermon bîya:

"Beyon kerdişê reya raştî 'aîdê Homê wo." (Nahl: 9)

"Bîşek, hîdayet kerdiş 'aîdê ma wo." (Leyl: 12)

"Ey qasidê mi! Senî ku Ma Nunî rî û peyğemberanê ba'dê yi rî wehîy kerd, Ma tu rî zî wehîy kerdi… Temomê înon peyğemberî mîjdon donî û hîşar kenî ku wa qey însonon ba7d3e peyğemberon Homê heti di delîlêk nêmono…" (Nîsa: 163,165)

" Ey ehle kîtab! Wextê fetrete peyğemberon seri peyğemberê Maş ima rî omi û hoş ima rî heq beyon keno ku baco şima nêvacên ma rî yo mijdon dayoğ û pêhesnayoğ nêomi…" (Maîde: 19)

2. (O delili zî) hetê Homê ra peyğamberêko rîpelonê pakon wuneno.

Îta di qey rîsaletê Resulullahî delîlêkê zelal est î:

- Nubuwweti ra ver û dima zî Hz. Muhammed ummî bi. Hina yo merdim xu ser nêeşkeno zey Qur'on yo kîtab binuso; esena ku in kîtap yi rî şirawuyo.

- Bi vatê û saliqdayişê yi ê kesonêko bawerî ardi heyatê yini di yo bedilyayişo pîl virazîya.

- A 'eqide ku yi muetên însonon me'quli bî.

- Yi 'îbadetê rind, emîr û usule kê qey heyat baş û wêşi'b teblîğ kerdên.

- Qal û güreye Hz. Muhammedî yobîn depiştên û her qalê yi raşti bî.

-Yi rî endek duşmenî bî û yi zaf zuarî dî; labelê rina zî de'wayê xu bi zixmî romiti…

Guerê lugatî me'nayê 'rî





www.arsivakurdi.org

pel'î, rîpelî nuşte yê. Labelê, Qur'oni di me'nayê 'kîtabêko peyğamberoni rî nazil bîyo.' di şuğulyawa. Qesdê 'rîpelonê pakon' kîtabêko çowtî, ğelatî tede çînî ya.

Eg, înson bion kîtabo Muqeddes û kîtabonê dînon bînon vîneno ku tay çîye raşt î, tay çîye hetê heq û eqil ra ters î. Eg inon û Qur'on tîverno inay endek hol fohm keno û vîneno Qur'ono 'Azîm çendek berz, pak û muqeddes o.

3. Ê (rîpelon) di hukm û şîretê raştî hê nuştê.
4. Êhlê kîtab, çi wext yini rî delîlêko zelal omi, bênatê xu di, kowtî îxtîlaf(cîya bî).

Ehlê kîtab, tena wextê peyğamberê ma nê, yi ra veri zî reya heqi ra vecîyê, kowtî îxtîlaf û yo bînoni ra cîya bî. Yi, omîyayişê wehîy û hîdayet ra pê reya raşti ra rî açarna û xu rî çowtî depişt. Ayra yi kerdinê xu ra mesul î. Hîn ê rîpelî pak nêmendî û kîtabê yini di emrê raşt û pakî çînî. Inay ra, Homê hewna yo peyğamber(Hz. Muhammed) şirawut û delîlê pak, zelal û raşt muetî yin. Bi ina wasita Homê, hewna yini rî kîtabêk şirawut in kîtab raşt o, tede çowtî çînî ya; qey bawermendon wesîleyê hîdayet o. Eg îta rap ê ehle kîtab bawerî nêaro û rina felqe felqe buko îxtîlaf hîn verê Homê di yo 'uzrê yin nêmoneno. Ina mesele zey ayetonê 'Beqara 213, 253; 'El-î Îmran 19, Ma'îde 44-50, Yunus 93, Şura 13-15, Casiye 16-18' zaf ca di vîyerena.

5. Halêko yin rî emir bîyo, (gera) yi batil ra rî açarnê û dîn tena a'îdê Homê bîkerê û ci rî 'ebdî bîkerê û nimac bîkerê, zekât biden. Aha, dîno raşt (û zixm) ino.

Ê emîr û nehiy zeg Resulullahî rî ome, peyğamberonê ehle kitabi rî zî 'eynî emîr û nehiy ome'b. A 'eqîdeya batıl û 'amelî nêbaş ehlê kîtabo ekayin eştî bî dînê xu, ê yini rî emir nêbî.

Dîno raşt û zelal, her tim bi îxlas Homê rî îte'et kerdiş, Homê rî îbadet kerdişi di şerik nêkerdiş, Homê ra ber her çî ra rî açarnayiş, nimac kerdiş û zekât dayiş o.

Ina ayeti di vateyê 'dînu-l qeyyîme" ser mufessîr hina voni:

-In dîn, dînê a mîllêt a, ku yi hê hîdayet sera yê.

-Îta di mewsuf, bi sîğayê mubalağa/zedî giridîyeno sifatê xu. Yanî in dîn zaf qeyyim/zixm o.

6. Bîşek ehle kîtab ra ê ku bî kafir û muşrîkî hê mîyonê adirê cehermi dê, yi uca di ebed'ul ebed monenî. Aha în (est î în) xirabê mexluqaton ê.

Îta di kufir ra meqsed, Hz. Muhammedi rî bawerî nêardiş o. Yanî ehle kîtab û muşrîk, omîyayişê rîsalet dima qasidîyê Hz. Muhammed înkar kerdo. Qaşuka Resulullah, yini rî rîpelê pak wenden, delîlê raşt muetên ci; labelê yin rina înkar kerd. Ayeti zî seba in kufrê yin penîyê yin xirab m arî kena eşkera.

Merdimo kâfir, mîyonê mexluqatê Homê di tewr xirab yo mexluq o. Heta wu, dereceyê xu di heywonon ra cêr o. Çimkî heywononi di 'eqil û hîş çînî ya; labelê kâfir weherê 'eqil û hîş ê, rina reya heq ra rî açarnêno.

7. Bîşek enon zeg bawerî ard û amelo salîh kerdo, aha ê (est î ê) xeyrinê mexluqaton ê.

Kom, ina dunya di zerê xu pak depiş, Homê û peyğamberî rî bawerî biker û amelo salih bîkero wu mîyonê mexluqatoni di tewr xeyrin o. Heta melekotini ra zî bi derece berz o; çimkî, melekêt bîîrade yê; labelê înson weherê îrade yo. Eg wu îradeyê xu bi vaştişê xu reya xirabi din ê reya heqi di bişuğuln wu hetê Homê di berz û 'ezîz o.

8. Homê heti di sewabê yin cennet o (ku in cennet) bine yi ra royê zelalî şînî û yi uca di ebedî monenî. Homa yin ra bîyo razî û yi zî Homê ra razî yê. In sewab qey ê kesonêko Homê xu ra tersen(recifyen)î.

Kom Homê ra bi şerme, bi edebe huzurê îlahê bi ters û guna ra dur bimono û 'ezabê Homê ra xu bi pawo, bi rizayê îlahî hereket bîkero yi rî xelatêka pîl û ebedî est a.

www.bangaheq.com
www.arsivakurdi.org

Kengî Ya Reb Dê Bibînim Ku Li Min Dergeh Vebî

✍ Şêx Mûşerrefê XINOKÎ

Kengî ya Reb dê bibînim ku li min dergeh vebî
Em jî her wek van hecacan j-bo me jî ev rê vebî

Qeyd û zincîrê di min bişkên ji hepsan derkevim
Dest û lingê min bi rih bin j-bo me jî destûr hebî

Ez bi toza Mekke û axa Medînê kil bikim
Her dû çavan ca we ku çavê me jî rohnî bibî

Heftê caran çar kenarê Ke'beê serxoş bibim
Hêstiran ez pir birêjim ca qirêj zail bibî

Carinan qesda berê reş kim bi keyf û lezzetan
Zahirî dev batinî tev c abi wî kamil bibî

Nuqteyek betin li ser min da ji şirka rehmetê
Daxilî hicra Zebîhullahê me jî cihkek hebî

Derd û êşan birîn xoş bin bi ava Zemzemê
Ji Sefa û Merweê j-bo min sefa hasil bibî

L-'Erefatê dest û rû ervaz bikim ahan bidim
Keh binalim geh bikalim ca du'a meqbûl bibî

Ez hucûmkim ser neyaran li Mina û Mizdelîfe
Ca heta saqim ji wan yek qet l imin peyda nebî

Wan cihan yek yek bi 'işq û lezzetan ez bihn bikim
Ca ku rê pey tey bibî hem ca ku dil pê hey bibî

(Cumle eczaê beden ger zahirî ger batinî
Da bi ah û naleê 'umre hemî seyqel bibî

Da bi rehmet xaneê xirbeê min te'mîr bibî
'Alema sorî bi mêj û du'an zail bibî)

Piştî wê qesda Hebîbullah tebîbê dil kulan
Ez bikim bazari yû lerzê ku mehder çê bibî

Yê ku Mekke lew mubarek bû ji yumna payê wî
Yê çi kes bigrî rikaba wî murad hasil bibî

Meş'ela nûra Îlahî dergehê rehme Xuda
Destegîrê cumle xelqan çi welûyyû çi nebî

Pê ku Geylaniyû Riffa'iyû Weysul Qerenî
J-xidmeta dergahê wî her yek tekî 'alem dibî

Cebraîl û çendi rûhanî j-bera xelqa dine
Dikirin qesda Medîna Wî ku Reb razî bibî

Kengî ya Reb wê derê zana mezin dê bihn bikim
Ev dilê bê hasil min ta ebed serxoş bibî

L-rewdeê ya ne Uhud ya ne Quba û ya Beqî'
Yek bi yek qelbê xu pê derman bikim rahet bibî

Ya Resûlellah meded destim bigêr û min bikêş
Ger tu himmet kî kesî çenda ku dûr nêzîk dibî

Ya Resûlellah ger ne laîq im tu laîqî
Gerl lena laiq nezer kî wê demê laîq dibî

Sed selat û sed selam l-rewda te bin ya Seyyidî
Al û eshab hem digel bin hem kesê j-benda te bî



www.arsivakurdi.org



15Ê TEMMÛZÊ, YÊ XWEDÊ EW RÛREŞ KIRÎ

✍ Mustafa TURAN

Yekî bifikirin şev û roj bi navê Îslamê xeber dide. Di camîyan de we'za dide. Hem digrî û hem xelkê digirîne. Di malan de însanan li dora xwe dicivîne. Roj bi roj hevalê wî zêde dibin. Her dem dixebite, hetta nazewice. Her tiştê wî jiboni doza wîye. Murîdê wî li dora wî perwanene. Her murîdê wî li hêvîya emrê wîne. Ku berê wan bide wî serê dinyayê jî, dîsa ew nabên na; ewê herin. Bi vî şiklî gihaye 'umrê xweyî dawî.

Meriv çi difikire di heqê vî kesî de? Tebî'îye meriv bêje, ev çi danake mezine ji teref Rebbul'alemîn! 'Eql û fikrê însan disekine. Çawa Xuda evqas nî'metê pir bide yekî û ew yek, negihîje riza Xuda? Wextê meriv li ser halê Şeytan difikire, meriv meselê xweş fêm dike. Lewra Şeytan, 'umrê xwe di zikr û te'eta Rebbul'alemîn de derbas kiribu. Meqamê wî pir bilind bû, di asîmana di nav melaîketan de dijîya. Lê wî çi kir? Ji dêvla ji halê xwe re şikir ke, wî çû nefsa xwe mezin dî û li ber Xwedê rabû û emre Xweda bi cî neanî. Jiber ku ji kirina xwe poşman nebû, Xweda jî ew qewirand ji hizûra xwe û le'neta xwe lê anî.

Lazime tu kes, hesaban bi ser hesabê Xuda re neke. Lazime tu kes, di qelbê xwe de li pêşber doza Xwedê xayîntîyê xwedî neke. Lewra zû yan jî dereng, wê Xuda hesabê wî xerake û wê xayîntîya wî derîne holê.

Kesê ehlê Xweda be, ewê hevalê hevalê Xuda be jî. Ewê ji mu'mina hez bike. Ewê bi mu'mina re hereket bike. Wextê mu'minek bikeve 'erdê, ewê destê wî bigre û wî ji 'erdê rake. Wextê dilê mu'mina biêşe, ewê dilê wî jî biêşe. Wextê birayên wî yên mu'min bigrîn, ewê jî bi wan re bigrî; wextê bikenin, ewê jî bi wan re bikene. Hem lazim e ew, jiboyi mu'mina, her û daîm dilovan be, lê jiboyî kafira jî dijwar be.

Çiqas yek bêje, ez ehlê Xwedê me û meriv binêre ku ew hevaltîyê bi neyarê Xudê re dike, meriv bera zanibe ku ew ne rast dibêje. Kesê ku alikârîyê bi neyârê Xudê re bike, ew neyârtîyê bi Xudê re jî dike. Kesê ku bû alikârê hevalê Şeytan, ew dibe hevalê Şeytan jî û kesê pişta xwe bide Şeytan û hevaltîya Şeytan bike, dixwaze bera şev û roj limêj bike; rojî bigre; dîsa jî ew nesalihe. Her çiqas ew di gotinê xwe de, ayet û hedisa jî bi xweyne, bi navê Xudê û Resulê wî re bigrî jî, dîsa jî ewle pê nabe û î'tîbar bi gotinê wî nayê kirin.

Ev kesê me'lûm, bi salan, jibona dilxweşkirina filleh û yehudîyan xebitî. Di vê oğirê de, te'wîz liser te'wîz ji

dînê Îslamê dan. Bi kul û ğemmê mu'mina re 'eleqedar nebû. Li ser zarok û gedên Yehudîya girîya; lê hêstirekî xwe, jibona zarok û gedê mu'mina nerijand. Xwe û hevalên xwe parast, lê ji ğeyrî xwe û hevalên xwe, kes musliman nedî û merhemet li wan nekir. Hetta jibo xwe biparêze û xwe mestir bike, kesên musliman avêtin ber devê şêr û guran. Heq neheq, heq dan hevalên xwe. Heqê 'îbadên Xwedê xwarin. Dewlet tev xistin destê xwe û kesê ji ğeyrî xwe, ji dewletê tesfîye kirin; avêtin.

Vî kesê me'lûm, hêlîna xwe, di nav bexçê deccal û Şeytan de ava kiribû. Deccal û şeytanan emir didan wî. Dixwestin ku dînê Îslamê, bibe dînekî wekî xiristîyanî. Dînêkî ku di hindirê qelb û mizgevtan de bête hepskirin.

Wextê hîle û lîsktikê wî, li welatê me hatine eşkerekirin; wê demê emir ji Şeytanê mezin sitend. 15ê Temmûza 2016an, bi tevê hêzên xwe yên xayîn, rabûne ser linga. Xwestin ku welat tev bixine bin emrê xwe. Kemîneke mezin hazir kiribûn liber millet. Bi çek û sîlehên millet, êrîş û hicûm dan ser millet. Xwestin ku îrada gel bixne bin linga. Jibo vê armanca xayîn, berê tenqa dane nav bajaran. Firok û teyyare firandin û bombe û fuze barandin bi ser millet de. Di tarîtîya şevê de leşkerê Şeytan, berê tivingên xwe dan ser milletê musliman. Xwîna muslimana rijandin. Ne gotin ev millet muslimane û rijandina xuyna muslimana ne helale.

15 û 16ê Temmûzê rûyê munafiq û leşkerê şeytana reş bû. Îmana muslimana qewîn bû. Bi tekbîr û selawatan millet geş bû. 'Ezm û cesareta millet, zora tenq û teyyara bir. Xayîna xwestin ku rojê li muslimana bikin şev. Lê bi nesreta Xuda, roj li wan bû şev. Xwestin ku kemînekê li ber ummeta Îslamê deynin. Lê Xuda kemîna wan xera kir. Ew rezîl û ruswa kirin di nêv 'alemê da û hem ahê mezlûma ji wan re nehişt.

Werin em guhdarî kin bê Seyda Mela Cizîrî, ç igotîye berî sed salan. Tu dibê qey teswîra 15ê Temmûzê kirîye:

...

Ez dibêm azir zemane dê qîyamet rabitin
Lew şeva tarî kişandî û nehişt eswed xurab

Xweş li min 'alem siyah ma stêr û kewkeb qet neman
Ez ji vê rojê ditirsam axirî zû kir şîtab

Ev ne ew iqlîme ya şems û kewakib tê bi seyr
Ez ne wê erdê dibînim ya ku lê ew mahîtab

Cinn û teyyarek mi dî wer bû di min winda kirim
Dame ber pençe'w kulaban hilfirandim wek 'îqab

Sufle wê înam û avêhtim zemîna zulmetê
Lê ku hişyar im gelo yan xewne min dîtî bêxab

Dêwê mel'ûn û munafiqê Xudê rûreş kirî
Ma bi bala hilkişitin 'aqîbet çêbit selab

Ehremîn te'lîmî dabû Ebyedî dest tê hebû
Pur bi vê te'lîm û rayê hatibû çûbû xîtab

...

www.arsivakurdi.org

Însan

✍ ‘Ezîz MEZRAQENTERÎ

Xwedê însan çêkirî
Bi sûret kamilkirî
Dev û lêv çav û birî
Çiqas şêrîne însan

Him hişk û him jî nerme
Him sar û him jî germe
Carna bêdenge terme
Bi hêlek hale însan

Çi zengîn be çi feqîr
Çi ğulam be çi jî mir
Ya serbilind ya heqîr
Qetî wê bimre însan

Xwedê daye wî eqil
Daye wî him çav û dil
Gelo jibo çi xafil
Dimîne hewqas însan

Ev bejn û ev bal û qam
Ken û girîyû kelam
‘Ilm û hilm û him selam
Çiqas delale însan

Carna dibe gunehkar
Carna dibe tobedar
Carna dibe şermezar
Gelek ecêbe însan

Di ser ‘ewra difire
D-binê behra dihere
Serhişke pir bê‘are
Çiqas xerîbe însan

Ev qencîyên bêjimar
Bağ û bostan û dewar
Ellah didime her car
Ma qey nabîne însan

Ew zarokê bêmecal
Weka çira şîrhelal
Bi dayka xwe ra heval
Çiqas mehsûme însan

Ew digrî gul hişk dibe
Dikene gul vedibe
Dil miqabilî dil dibe
Bi ken û girîye însan

Ev barê gelkî giran
Ne hilgirtiye çîyan
Ji ğeyrî ademîyan
Çiqas d-‘inite însan

Daye resûl û kîtab
Nî'met bê hed û hîsab
Qelem ziman û xîtab
Naşikirîne însan

Kenê zarokay ji dil
Qet nahêle derd û kul
Di gulzarê de bilbil
Ciqas balkêşe însan

Ji dil evînda rdibe
Dîn û him sewda dibe
Wek Memê Alan dibe
Pir evîndare însan

Rebbê xwe jibîr dike
Herdû çavan kor dike
Xwej heqiyê dûr dike
Çiqas nankore însan

Çi şaqîyû gunehkar
Çi xerab û şermezar
Li hêvya tene Ğeffar
Lew ‘evdê tene însan

Bi eşq û evîndare
Bi bîr û bi bawere
Bi rêyek dûrve dere
Her roj rêwîye însan

Şên be her der gulistan
Çiya jêr dibin zozan
Jê tê dengê bilbilan
Gulzare dilê însan

Şev û roja bi gazî
Nizane çi dixwazî
B'halê xwe nabe razî
Pir bigazine însan

Xelas nabe tu caran
Bê lutfa te ey Rehman
Ji zor û tengasîyan
Qet der nakeve însan

Her ku bîr dibe însan
Dev jê bernade şeytan
Bi weswesew xeyalan
Gelkî diêşe însan

Di qehere kor dibe
Weka agir sor dibe
Merhanet jê dûr dibe
Dibe cinawir însan

Jibo dinê rih dide
Barê giran l-mil dide
Sekn û hedan qe nade
Pir timakare însan

Ya reb ma ne ji te be
J-lutf û kerema te be
Ji rehm û ‘efwa te be
Gelo wê çibke însan

Yan wê başiyê bigre
Yan xerabiyê bigre
Her kîjan rêyê bigre
Bi îradeye însan

Hêlek wî jî qabil e
Hêlek wî jî habîl e
Hin dîne him baqile
Çiqas xerîbe însan

Hewcedara j-bîr nake
Xwe jibo wan kar dike
Parîyê xwe par dike
Û pir comerde însan

Ezîz dû dirêj neke
Xwej rastîyê dûr neke
Mirin qet ne heneke
L'dinyê mêvane însan



www.arsivakurdi.org

Xweş Awezên Yûnusan

✍ Azad RÊBIWAR

Xişte xişte kêra bû bi serde jî hîre hîre cadûyan
Li kuçeyên te welat hovîtîyek kes nedîtî pêde bû
Xêrxwazîya wan li zinge zinga deriyan divedan
Şeş û heftê Cotmehê xwîn ji şaneşînan digernijî
Pakrewanê dilgiran in xweş awezên yûnusan

Ma qey bejn û bala we dizîne canê min
Derbehişka hûn êşandin, canborî ne di rê de
Ma çima dernayin hûn ji nav bexçên kewseran
Belgê darên hejîran ma ê cardîn şîn û geş nebin
Şahidên sermest in êdî xweş awezên yûnusan

Zarok ji wir û bi şûn de ma ê hêjî bigerin li cejnan
Bi xeml û xêza xemilî li kuçeyên teyî herhilî
Gulîstanek sorgulî ye heta hetayî Kurdistan
Şîndar e êdî her tim li ser xunçe gulên xwe
Pakrewanê dilgiran in xweş awezên yûnusan



arsivakurdi.org

‘HERF Û NUQTE–1



✍ Fexreddîn ŞEMREXÎ

Ziman ji destpêka hebûna însanîyetê ve heye. Meriv dikare bêje nivîsandin jî ji destpêka însanîyetê ve heye. Lewra însan û pêxemberê ewil, bavê însanîyetê ‘Hz. Adem (‘e.s) bi ziman derdê xwe ji Rebbê xwe re gotîye, dema hatîye şandin rûyê erdê jî, jê re 10 rûpel fermanên Xweda hatiye şandin û li gorî wan fermanan tevgerîyaye. Bi pirbûna însan û qewman jî ziman ji hev cuda bûne. Dibe ku ziman tev bi ‘Hz. Adem hatibin hînkirin û her qewmek li gorî zimanê xwe xeber dabe û dibe ku ziman tev ji zimanê ‘Hz. Adem derketibin û belav bûbin.

Lê tiştê qet’î ewe ku xeberdan berî nivîsandinê tê û xeberdan û ziman nîmeteke pir mezine ku Xweda ev qencîyê bi însanan kirîye. Însan bi ziman û xeberdan li hev dikin, ji hev fêm dikin, derd û meqseda xwe dibêjin, fikr û hîssîyatên xwe tînin ziman, armancên xwe pêk tînin. Însan bi ziman û xeberdana xwe ji heywana bilindtir û qîmettire li cem Xweda. Zimanê heywana jî heye lê pê xeber nadin. Di Qur’ana Kerîm de emrê ewilî yê ji pêxemberê me ‘Hz. Mûhemmed (s.‘e.w) re hatiye şandin “Îqre - bixwîne”ye.

Ziman rewş û rengê millet nîşan dide, li gorî bîr û bawerî û jîyana millet rengîn dibe, li gorî şert û rewşa coğrafî, civatî, ‘urfî, exlaqî, ekonomî, şaristanî xwe nû dike, yan jî diguhere. Lê rêzik û qa’îdeyên ziman li gorî zimanê millet tê meydanê, ne ku ziman li gorî qaîdeyan teşe digre. Her wiha çi biçûk çi mezin her însan ji hînbûna zimanê dayikê re musaîd e. Lewra Xwedayê Tea’la însan weha xuliqandîye, yanî hînbûna zimanê dayikê tiştekî fitrîye. Alfabe û nivîsandina milletekî jî dîsa rengê wî milletî nîşan dide. Alfabe û nivîsandina milletekî li gorî ya milletekî din bê guhertin, ewê gelek kêmanî û zehmetî biqewime hem li ser xeberdana millet hem jî li ser jîyana millet. Lewra bi vî awayî ji milletê alfabe û nivîsanadina wî bê guhertin tê xwestin ku xwe li gorî milletekî din rengîn bike, xwe têxe bin kirasê wan. Ev jî zor û zulm e.

Li Tirkiyeyê piştî cimhûrîyet hat avakirin, bi inqilaba ‘herfê alfabeya ‘Usmanî hat guhertin. ‘Herfên ‘erebî hatin hilanîn û di dewsa wan de ‘herfên latînî hatin dayîn. Di şevekê de millet bû cahil. Millet ji ‘ilm û zanînê, ji xwendin û mazîyê hat mehrûmkirin. Kitêb û eserên ku bi ‘herfên ‘erebî hatibûn nivîsandin, hatin yesaxkirin. Li însana nivîsandina ‘herfên latînî û qa’îdeyên xwendina wan hate ferzkirin. Bi ‘hewl û qanûnê, ‘herf û nivîsandina ku rewş û rengê millet bû, li gorî fikr û zihnîyeta ğerbê hate dîzaynkirin. ‘Herfên ku di alfabeya latînî de tune bûn, yan jî nivîsandina wan, dengên wan bi ‘herfên latînî nedihatin nivîsandin nehatin qebûlkirin. Bi carekê ve bi hezaran eserên kitubxane û medreseyên ku çavkanîyên zanînê, rengê şaristanîyê û serbilindîya li nav milletan bûn, bêqîmet bûn, mehkûmî tunebûnê bûn, ketin bin toz û kadînên tarî. Kewwar û kadîn bi salan bi bîna ‘hubra wan helmijîn.

Bi vê inqilaba ‘herfê, medreseyên Kurdistana bakur jî yekser zirar dît. Xwendina li medreseyan pir dijwar

www.arsivakurdi.org

www.bangaheq.com

bû. Kesê cesaret bikira biça li medreseyan bixwenda û 'alimê ku cesaret bikira ders bida feqe û xwendekaran, bi sed kul û derdî xwe didan ber zor û cefayan. 'Heta dewrekê xwendina latînî - pirê wê bi meqseda ku destekê nedin 'hewlên dijminantiya dîn û millet - wek 'heram hat dîtin di nav 'aliman de, lewra bi 'herfên latînî, 'urf û adetên gawiran jî bi wan bizorê didan qebûlkirin û ji wan dixwestin ku li gorî alfabeya ğerbê binivîsînin. Her çiqas li ber vêya diberxwe dan jî, xwendin û tedrîsa bi 'herfên 'erebî bere bere kêm bû, eserên li pîyasê marûzî wendabûn û bêqîmetbûnê bûn. Milletê ku bi sedsalan bi helbest û qesîde û mewlûdên şêx û aliman di bağ û bostanê Îslamê de hatibûn xemilandin û kemilandin, ji wan mal û hêjayên xwe mehrûm dima. Nivîsandina kitêban roj bi roj kêm bû. Millet û 'alimên ğîretkêş ketin cehd û ğîreta sitirandina dîn û îman û namûs û hîcab û mûshafê.

Xwedî û pîştevanîya zimanê kurdî, eserên Kurdî û nivîsandina bi Kurdî medreseyên welêt bûn, 'alimên van medreseyan bûn ku di wan de ders didan û hinek mîr û begên welêt bûn ku pirê wê ji bo navûdengîyê be jî li evan medrese û 'alimên wan xwedîtî dikirin. Bi sedsalan helbest û eserên Kurdî bi saya wan gihaştibûn wê dewrê. Feqet piştî ku cimhûrîyet hat avakirin, li Tirkîyeyê teqlîdkirina jîyana ğerbê hat destpêkirin. Bi danîna 'herfên latînî û bi vê qanûnê vekirina mekteban, millet ji çavkanîyên 'ilm û edebî dûr kir. Di vê heyamê de hinek kesên ku ji hêla qewmî ve ji cimhûrîyeta Tirk a nû nerazîbûn lê ji hêla fikrîyatê ve ew jî wek Kemal terefdarê jîyana modern bûn, dest bi tevgerên mîllî kirin. Hinek kesên ku berîya cimhûriyetê yan jî piştî cimhûrîyetê revîyabûn derveyê welêt, li Rûsyayê li Ewrûpayê û li Sûrîye û Lubnanê bi cî bûn, bi herfên latînî dest bi nivîsandina Kurdî kirin. Di vê dewrê de gelek kitêb, kovar û rojnameyên Kurdî yên bi herfên latînî derketin. Jibo alfabe, gotinên pêşîyan, îdyom, gramer, rastnivîsîn, çîrok, mesele û metelok, hîkaye, dîrok û ferhengan xebat hatin kirin, meqale hatin nivîsandin. Jibo zimanê kurdî her çiqas feydeyên wan hebin jî, hinek zirar jî bi xwe re anîn. Lewra kesên li ser îdeolojîya bêbawerî û çepgîr, kesên ğerbîxwaz û sekuler, li gorî şertên 'alema ğerbî fikirîn û xebatên xwe kirin. Bi vî awayî:

1- Dijminantiya Îslamê kirin. Digel dijminantiya bi 'eqîde, emr û tarîxa Îslamê re, bi salan îddîa kirin ku dînê Îslamê nehiştiye Kurdî bipêş bikeve, jiber Îslamê Kurdî zimanekî bêxwedî bûye. Dîsa îddîa kirin ku 'Hz. Omer kurd tev qetil kirine. Îro çavkanîyên 'alema Îslamê û 'alema ğerbê jî eşkere dikin ku ev îddîa pûçin. Lewra Kurd bi mislumanbûnê hînî nivîsandin û mektebê bûne û dest bi nivîsandina kitêban kirine di medresan de, bi vî şeklî zimanê kurdî 'heta roja me hatîye parastin. Bê gotin ku berîya Îslamîyetê berhemên kurdan hebûne jî, negihaştine dewra mislumanbûna wan. Di heqê vê yekê de di hinek kitêban de çend xeber û hinek herf hatibin nîşandan jî, jixwe di dewra mislumanbûnê de kurd ji xwendin û nivîsandinê gelek dûr bûn. Piştî ku misluman bûn, bûn xwedî mekteb û dewlet jî û di dewra Selaheddîn Eyyûbî de bûne împaratorî jî.

2- Bi vê dijminantiyê xebatên ku ji zimanê kurdî peyv û gotinên Îslamî, 'erebî, farisî, osmanî derxin kirin. Di vê 'hewlê de jî Kemal û zihnîyeta wî teqlîd kirin. Di kurdî de di şûna wan peyvan de xwestin ku peyvên nû pêk bînin. Di netîceyê de peyvên ku bi sedsalan bû bûbûn malê kurdî, jê derxistin. Kurdî rûçikandin, dewlemendîya kurdî kêm kirin û hinek peyvên ku ne li gorî rûhê kurdî bûn deranîn. Lê belê ji zimanên ecnebîyên ğerbî stendina hinek peyv û kelîmeyan, nekirin ğem û derd û ji wan zimanan gelek peyv stendin. Hin kes vê zihnîyetê hê jî didomînin.

3- Alfabe û gramer û rastnivîsîna kurdî jî li gorî zimanên ğerbî xwestin lihev bi'edilînin. Terîm û tabîrên gramerê li gorî zimanên ecnebî beyan kirin. Alfabeya kurdî jî li gorî wan alfabeyên ecnebî 'edilandin. Di encamê de herfên alfabeya kurdî hindik bûn, cumle û peyv li gorî wan zimanan bihev ve hatin girêdan. Jixwe ev di tirkî de jî hatibû kirin. Çawa di tirkî de ğeyna 'erebî kirin g, "h, 'h û x" yên 'erebî tenê bi "h"yê hatibûn nîşandan (Xaliq -navê Xwedê- halik nivîsandin), evana jî 'h û ğeyna ku di kurdî de hene, bi "h" û "x"yê nîşan dan.

Di ziman de pirbûna dengan, ji hînbûnê re nabin problem. Îro di zimanê Îngîlîzî de nêzî 80 deng hene, belkî zêdetir jî û jibo hînkirina vî zimanî nabe pirsgirêk. Jixwe kurd çawa ku misluman bûn, 'herfên xwe yên kurdî û 'herfên alfabeya 'erebî tev bikar anîne. Pirbûna ewqas 'herfan û dengan, ji xwendin û nivîsandinê re nebûye pirsgirêk. Eger derdekî weha hebûya û paqij

www.arsivakurdi.org

kirina zimanê kurdî ji peyv û gotinên 'erebî û osmanî dozeke meşandinê ba, ewê di serî de Şex Ehmedê Xanî bimeşanda û jibo zarokên kurdan "Nûbihara Biçûkan" û kitêbên 'aqîdeya Îslamê, 'aqîdeya îmanê nedinivîsandin.

Piştî vê destpêkê li ser hinek deng û 'herfên kurdî meriv dikare van meseleyan bîne ziman: Di kurdî de herfên "ç, k, p û t" bi du dengî tên xwendin. Hinek mîsalên wan li jêrin:

Ç (jidandî): **Ç**al, **ç**em, **ç**ar (perçê qûmaşê), **ç**ikandin (tîk kirin), **ç**êlek, **ç**av, **ç**êr, **ç**il (nefsok), **ç**ikandin (av çikîya). (nejidandî): **Ç**ar(reqem), **ç**and, **ç**ol, **ç**ê, **ç**il (reqem), **ç**end

K (jidandî): **k**ar (heywan), **k**elem (strî), **k**ej, **k**evok, **k**êr (jêhatî), **k**er (kesê deng naçê), **k**er (perçe), **k**êl (dirûtin), **k**or (kesê nabîn), **k**ul (birîn), **k**ur (bayê kur), **k**ur (traş, qusandin), **k**ur (ewlad), **k**ur (heywanê guhên wî/wê pir kin), **k**êm, **k**al (yextiyar), **k**evir … (nejidandî): **k**ar (xebat-kelîme nêre), **k**ar (qezenc-kelîme mê ye), **k**elem (lehane), **k**êr (amûrek birînê, kêra tûj, kêra ko), **k**ûr (bi berjêr ve, çala kûr), **k**êl (rex), **k**en, **k**al (fêkiyê hê baş negihaştiye), **k**iras….

P (jidandî): **P**ar (sala borî), **p**êrar, **p**oz (bêvil), **p**ez, **p**ey (li paş), **p**eyv, **p**êl (binpêkirin), **p**îvan, **p**eyivî, **p**îjê kevirê **p**an … (nejidandî): **P**ar (Parçe), **p**er (rex), **p**oz (resîm), **p**eşk (beş), **p**ûrt, **p**êl (mewc), **p**iştî, **p**ûç, **p**aldan, **p**er û bask, **p**eşk (niqut), pişt.

T (jidandî): **T**arî, **t**a'l, **t**a (benik), **t**olaz, **t**or (kesê gewî), **t**er (heşîn û teze), **t**erm (laş), **t**ûj, **t**eng (ne fireh), **t**evdan (tevir kirin), **t**evizîn, **t**în (germî), **t**erk (qelişîn) …. (nejidandî): **T**arîx, **t**a (nexweşiyek), **t**erm (terîm), **t**în (reşbûn), **t**im, **t**or (tora masiya), **t**erk (terikandin, devjêberdan), **t**eng (kêlek), **t**ev (hemî), **t**îbûn, **t**eşî, **t**êr (çewalê li ser heywan), **t**êr (ne birçî), **t**êr (biqîm), **t**evdan (tevlîhevkirin) …

Meriv dikare evan herfên jidandî bi şeklê îtalîk, bolt an jî bi şeklekî cûda binivîsîne jibona ferqîyetê. Lewra ji mîsalan jî eşkere dibe ku hinek kelîmeyên nivîsîna wan yeke, bi deng û xwendinê jihev ferq dikin. Kesê bi kurdî dipeyive, ferqa wan ji hev derdixe, lê kesên bixwazin kurdî hîn bibin ewê nizanibin ferqa wan û teva bi awayî nejidandî bixwînin ku wê di xeberdanê de gelek caran zelalî û safbûna kurdî xera bibe û kêmasîyê çê bike. Hemî welatên ğerbê jibo dengên herfên xwe ya herf û sembol bikar anîne yan jî hinek herf anîne ber hev.

Di derxistina dengên **"x" û "ğ"**yê de jî ferqîyet heye. Herdû herf jî xas di kurdî de hene. Nexasim hinek mîsalên bi "ğ"yê li jêr hatine dayîn. Heger kelîmeyên ku ji 'erebî derbasî kurdî bûne meriv bide serhev, hejmareke mezin peyde dibin. Jixwe belkî ji 600-700 salî zêdetir ev herf hatine bikaranîn. Her wiha 'herfa 'hyê jî di kurdî heye û hinek mîsalên wê û ferqîyeta wê ya ji "h" yê jî li jêr hatine dayîn. Bi vî awayî ev herdû herf belkî ne kêmî herfa "u"yê tên serifandin.

Ğeyd, ğem, ğela, ğewirîn (bêhişketin), xew (razan), ğelet, Ğenîy (Navekî Xwedê), xanî (mal), ğar (hicûm), ğarandin (êrîş birin), xar (strî), ğef (gaf), xef (dizî), ğîz (xiril), xîz (xêz kirin), ğur (zikê wî dike ğureğur, ğurînî), xur (lingê wî duxrê, xurînî), ğazğazok (heywanek), ağa, ğeddar, ğezal, ğureğur, ğezeb, meğel, zeğel, leğer, êlağ (meydana fireh a heywan lê meğel dibin), Qoğî (Navê gundekî), Qerejdağ, ğayz (ğayzîbûn), kağiz, sağ, ğulğul, ğelet (şaş), xelat (werîs), dilğelandin...

H (nejidandî): **H**êl (alî), **h**atin, **h**esp, **h**eman, **h**în (hê), **h**ol (meydan), **h**ino **h**ino, **h**erî (-tirîn, herî baş, baştirîn) **H** (jidandîye, ji qirêkê der tê) : **H**al, **h**êl (hêz, qûwet), **h**emî, **h**emandin, **h**în ('elimandin), **h**ol (bi jor ve hopkirin), **h**ine, **h**erî (axa pir şil), **h**elal, **h**amî, **H**ezretî Muhemmed('e.s), **h**ilî (keçhilî, berxa hilî), **h**elîn (helandin), le**h**pek, **h**eyf, **h**ezkirin, **h**ezar (1000), **h**ewn (sebr), **h**ewandin ('ezimandin), **h**ewce, **h**eb (tene), **h**ewş, **h**olik (ciyê jibo sîyê hatiye çêkirin bi devî, çilo û pelan), de**h**kere (mesele), **h**enek, **h**enûn (nerm), **h**emmal, **h**edûr (hizûr), **h**eydar (agahdar), **h**eft, qe**h**we, **h**ebûb (kaya hebûb), **h**ût, **h**orî, qe**h**reman, **h**ersim (arsim, hê nebûye tirî), **h**ewr (navê darekê), **h**esîl, **h**eps, **h**ewl ….

Dîsa '(eyn) jî di kurdî de heye û tê bikaranîn. '(eyn) tê ser herfên dengdêr a, e, i, î, o, u, û. Wan hinekî tûj û dirêj dike. Hinek mîsal evin: 'Alim, şî'ar, şe'ar... 'Elî, 'emel, 'esr, 'ewr, 'ebr... 'Işq, 'ilm, 'irq.. 'Îbad, î'tîqad.. 'orîna devê, si'or (heywanek).. 'urf, 'umir, şi'ûr,

Ev 'herf di ziman û xeberdana gel de hene, di peyvê de tên bikar anîn. Di Zazakî û Soranî de jî ev herf hene. Her wiha di Soranî de bikaranîna herfên 'erebî, serifandina wan nabe pirsgirêk. Ji ber vê yekê, nabe ku zimanê Kurmancî ji wan xalî bimîne. Bi herfên 'erebî di nivîsandina van herfan de gelek kêmasî tê çareserkirin…

www.arsivakurd.org

www.bangaheq.com

HALÊ UMMETA ÎSLAM

✍ M.Mustefa'yê Mela 'Elîyê Êzdarî

Îro li tevê cîhan
Mustez'efin misliman
Ya Reb hewar, el eman!
Azad ke ehlê îman

Li Sûrîyû Kurdistan
Li Filîstîn û Lubnan
'Iraq, Mısr û Araqan
Agir disoje cergan

Ya Rebbena, Rebbena
Xwedyê jâr û rebena
Nehêl tenê mu'mina
L' ber neyar û dijmina

Baranekê bibarîn
Agrê nav me vemirîn
Rake j' nav me qehr û kîn
Neherike bera xwîn

Eva serê sed sale
Ku ev ummet dinale
Ketîye xwar bêhale
Hêstrê çe'va dimale

Bike yek mislimana
Hem dewlemend û zana
Xelasîyê bid wana
J' xefk û qeydê şeytana

J' îxtîlafî-w nezanî
J' feqîrî yû xizanî
J' bêkêrî yû kislanî
Hat ser me perîşanî

Destê zalim bişkîne
Wan bi hevdu bixîne
Quwweta wan bistîne,
Wa j' nava me derîne



www.arsivakurdi.org

Ez im, MEMO...

✍ Fethî EYYÛBÎ

Bi nav şehîdê 15ê Temmûzê
Zîn û evîna min jîyan û azadî ye
Ez bi secda şehadetê mertebe mertebe grêdayî me li ber deryê Heqq.
Di sênga teyrê hêşîn de hurr û azade me bi rengê xil'eta Hz. Huseyn.
Havîn e...
Di nîvê tirmehê em herikîn bi çemê Kewserê de.
Ciyê du benda dighîne hev...
Şahide ji mere gerden û behra Stembol
Bi qasî lorîkê dayîkan hûrik hûrik di rijîyan huzn û girîn ji stêrkên asîman
Em jî şahidin, em şehîdin di şeva giran de
Ew şeva dirêjû tarî
Bi qanda ummetek brîndar.
Ezim, MEMO...

Ew şev, her yek ji me Mecnûn bû, Kerem bû, Ferhat bû, welhasil Sîyabend bû.
Lê belê Zîn'û Xec'û Şîrîn'û evîna dilê me 'eşqa azadîyê bû.
Emên evîndarê rizgarîyê, dema lazmantîyê xwîya dibin û bi firê dikevin.
Wekî Mus'eb, Henzele, Hubeyb û wekî rûhên pak û paqij.
Ez 'aşiqê heqîqet bi nûr û remz û nîşan
Xizmetkar im ji bona dînê henîfê zîşan
'Ezîzê rûyê zemîn cundîyê her dewranê
Evîndarê mizgîna Peyğemberê 'alîşan
Di kelamê qedîm de ji bo min hene sened
Di herba heqq û batil ji bo Xwedayê semed
Herdemî li pêş im ez feda me bi mal û can
Yûsûfê zîndana me şehîdê de'wa ebed
"Heyat xweşike MEMO…
Weka gula berbirro
Cenan û bexçevan zilan û kulîlkê ku dighînin, dixwazin bi şibhê jîyanê bixemlînin.
Gul û sumbul heyatê mizgîn didin bi xweşkayî û bêhn û neqşê xwe
Şehadet jîyane di bizrê avêtî de ji evên mayîn re di piştî we de
Şehîd ne mirîne sağin di nav bazikên letîf de.
Raserî me bi firê, şehîdin temaşa dikin. Hûn dibînin xweyna we herikî, mewcû pêla rakir pîya.
Ciw warê me bûne lalezar li hember tuğyana 'esrê.
Avayên me bûn mişar û zevîyên kulîlka bûk û zavê.
Weka gula berbirro me bi rojê re berê xwe da nîvê asîman.
Tarîx lime nû bû hûn bawer bin di vî qernê paşî de.
Bayê Rehmanî agirê tuğyanê li xwedyê wî vegerand.
'Emelê xebîsa di qirikê de 'asê bû, li ser pira gerdenê fetisîn di xweyna we de

www.arsivakurdi.org



Xweda hê jî bi nezera rehmetê li vî warî di nihêre
Bi zanebûn û 'izzet hesabê kêm û ketî ji hevdû pinçû-parî bû.
Civîn çêbû nav neyara li me dixwun tim gefa ye
Bayê ğerbê ajot ser me ew bêbextê bê wefa ye
Tim çav nas bin wa birano bê rûmetî tim cefa ye
Nas kirina qenc û xerab pêk anîna heq sefa ye
Ey dil çava bide seknandin îman şên e li vî warî
Karwanê heq rabû pîya vê erda me kire carî
Li pey heqyê em meşîne me da ser mil evî barî
Ji boy Mehdî hazirî ne, bi mal û can bi vî karî"
-Ez, MEMO!
Memê Zîna dilê her evîndarî.
Mêrxasê şeva giran, Rustem û Hemzeyê bê rext û tiving.
Ez peya me, di beza azadîyê rêwîyê bi per û firîn
Bi sênga nepenî li neyarê bêbext pêsîr tengî datînim bi rimbazîyek 'egîdî
Ez nemzedê xelaskarî, li ba mezlûma cîh digrim.
Du perê min hene
Yek 'eşqa azadî, ê din jîyana ebedî.
Min ji ava şehda zelal vexwar û mizgîna azadîyê rohnî kir li ber çavê min çar alîyê welat.
Ruhê min bi şalûr û bulbula re li gulîstana jîyanê dema ku danî...
Gulên Muhammedî şên û şa bûn, sosin û nêrgiz û beybûn bihar anîn nîvê havînê.
Ez MEMO...
Huzna çar alîyê welat di sênga min de civîya, derdê min li cennetê derman dibîne.
Gerdena Stembol Kerbela ye, em çengek şehîdin di tirmehê de.
Zîna 'esr û dehra li ber dilê min awaz û gazîya xwe gihand Xwedayê 'aşiqa.
Her yek ji me mizgîn û rohnayîye di şeva nîvê havînê de.
Carek din emin Fatih, Selaheddîn, welhasil Heyder'ê Kerrar'û Tariq û Zengî.
Derîyê fethê ez vedikim di her dewranê, li şerq û ğerb û zozan û her bendê cîhanê
Ez im Memê Stembol û Amed û Cizîra Botan û hemî welatê şêrîn.
Di nav gulistanê de sorgulek nazende me
Di eywana 'eşqê de ez yarek bazende me
Geli dost û hevala li meydana herb û cengê
Di roja se'y û cehdê merdekî ferzende me
Yek caran ev dile min xweş bifirê dikeve
Bazikê min li deryê 'eşqê sekin dikeve
Hesret û evîna dil diqede bi yekcarî
Ruhê min mest dibe ew dem bi şewq tê li heve
"Çerxa felekê dizîvire MEMO...
Tarîx dîsa li me nû bû,
Kufr û nîfaq yek in, neyar neyar e, xayîn xayîn e.

www.arsivakurdi.org



15ê Tîrmehê

✍ Nûreddîn QOSERÎ

Hemd ji Xweda re be ku qasid û resûl ji insan re şandine, mexlûqên xwe ji hebûna xwe haydar kirine. Selat û selam li qasidê paşî Mu'hemmed (s.'e.w) û li al û eshabên wî be.

Nivîsa min ya vê mehê wê di heqê metoda tebliğa Hz. Nuh ('e.s.) û ders îbretên wê de bûya.

Lê ji ber ku bûyerên di 15ê Tîrmehê de li welatê me qewimîn zêde girîng bûn, pêwist bû ku di zihnê me de bête qeydkirin daku em tucarî wan bûyeran jibîr nekin. Ji ber vê yekê min mijara nivîsê guherand. Bêgûman ewê dîrok wan bûyeran qeyd bike. Hewla derbeyê biserkefta, ewê bandoreke zêde mezin li jîyana me bikira û mexdûrê herî mezin ewê qewmê me bûya. Jiber vê li me dikeve ku em ji gellên din zêdetir li ser vê hewlê bisekinin û di dîroka xwe de bi çixêzeke herî qalind qeyd bikin daku qet neyê jibîrkirin.

Ka em bi hevre binêrin bê wateya ewan bûyeran çi bû û bi çi sedeman hatibûn holê. Bêgûman têtе zanîn ku ev sed sale erdnîgarîya Îslamê bi zeîfbûna dewletên Îslamê yên dawîn, gelek nexweşî û zulim dîtiye. Piştî feşkilandina dewleta Osmanî, bi dehan dewletên biçûk hatine avakirin li ser vê erdê, bi destê emperyalîstên ğerbî. Her

www.bangaheq.com

çiqas ev dewlet bi navê netewe û gel ava bûbin jî di 'heqîqetê de dewletên ğûlam bûn. Ağayên ğerbî jibo her dewletekê xûlamekî sadiq danîye ser kar û bi destê wan ji alîkî ve zulmê li xelqan dikin, ji aliyê din ve dewlemendîya ser û binê erdê ji ağayên ğerbî re didin birêkirin. Xwediyên erdan li ser erda xwe him dixebitin, him jî birçî dimînin. Lê ağayên ğerbî û ğulamên wan bi ked û xwêdana gelan di nava kêf û şahîyê de digevizin. Ji salên 1920î 'heta sala 2010an rewşa 'alema Îslamê ev bû.

'Heta li Tûnisê xortekî xweyî te'hsîl agirek pêxist. Vî xortî weke hemdemên xwe jiber ku karekî li gorî te'hsîla xwe bi dest nedixist, ji ser 'erebokeke biçûk fêkî difirot û debara xwe dikir. Lê zabitê îdara zulumkar ev kar jî jê re gelik dît û dezgeha wî xera kir. Xortê biğîret ev hal bi şewitandina xwe şermezar û protesto kir. Ev karê wî bû sedema berxwedana temamê gellê Tûnisê. Di encama vê berxwedanê de, dîktatorê Tûnisê ji welêt revîya.

Ew berxwedan û encama wê, bû mînak jibo hemî gelên ku li nava welatê xwe bi destê diktatoran ji xaçperestan re bûne dîl. Xelqê Misrê, yê Lîbya û Be'hreynê, 'heta giha Sûrîyê. Lê ev berxwedana bişeref a li Sûrîyê hate fetisandin. Navend şolî bû, dewletên xaçperest bi tevê fitne û fesadîya xwe daketine 'holê, inqîlaba mezlûman bi şebekeyên xwe yên veşartî û çepgîr dizîn û berovajî kirin. Di vê navberê de kaos û bêhêvîtî di nava xelqê de derkete 'holê. Dirêjbûna şevê ji ğerbiyan re fersendeke nû deranî 'holê. Êdî de'hfikên nû li ber me vedan, Ji bêrêber û bêtifaqiyê em ketine devê xefkê wan.

De'hfika nû weha xûya dibû: "Xelqê misliman xwe bixwe berdin hev. Nehêlin yek ê dî têk bibe. Çi dema ku aliyek kêm bibe, çek û silehan bidnê li hember aliyê din. Bi vî hawî ewê nedîyarî û kaos dirêj bibe." Di vêya de qesta wan du tişt bûn. Ewê çek û sîlehên xwe bifroşin, wê gel jî bi hevdû bidin qelandin. Digel vana wê bi dirêjbûna şer, qewm ji 'ilm û çanda xwe dûr bikeve. Ev jî wê coğrafyayê ji du tiştan xalî bike: Yek Îslam ya dî muslumanî. Lewra tu kes nikare di nava gengeşî û micadeleyê de ehemîyetê bide perwerdehîyê. Proje û plana wan weha bû, jixwe 'halê Iraq û Sûrîyeyê li ber çavaye.

Lê ev de'hfika xaçperestan li welatê me yê Tirkiyê eşkere xera bûn. Bêgûman bi hewla derbeyê dixwestin ku li Tirkiyeyê jî vê rewşê bînin holê. NATOyê bi rêberîya Emrîka û bi destê leşkerên paye bilind ên di nava artêşa Tirkîyeyê de ku pirê wan bi rêxistina Pensilwanyayê ve girêdayî bûn qesda derbeyê kir. Jibonî serkeftinê çi xebat û tedbîrên beşerî hebûn, bêkêmanî bi cih anîn. Lê Xwedayê Teala nexwest kelha ku kesayetên dersa Qur'anê fêrî zarokên welêt dikirin hêjî di zindanê wê dene bikeve. Lewra nêz bûye ku ev bahadirên Qur'anê ji zindanê derên û ala Tew'hîdê bi ser tevê ala xin. Dîsa hê kesên ku hew jibona riza Xweda Li ber hemî ze'hmet û bêîmkanîyan dixebitin hene. Bêguman ALLAH (c.c.) keda wan berhewa nake. Ez bi temamê qelbê bawer dikim ku wê ALLAH (c.c.) di pêşerojê de, ser rûyê vê 'erda ixtiyar bi 'edaleta Îslamê û keda ğemxurê Îslamê tijî bike.

Xweda di 15ê Tirmehê de tirs ji nava dilê tevê vî xelqî bi carekê rakir. Xelqê canê xwe, malê xwe, zar û zêçê xwe dane ber paletên tanq û derbê teyaran. Bi sedan can dan û welat teslîmî ğûlamên xaçperestan nekirin. Çimkî Iraq, Sûrî, Lîbya û Yemen liber çavan bûn. Dizanibûn ku hikûmet bikeve, pêşî ewê welat bibe du perçe, dûvre jî çar perçe, an jî ewê li hêvîya însafa xaçperestan be, kêfa wan çend perçeyan bixwaze, ewê bikin hevqas perçe. Di vê heyama perçekirinê de ewê çend milyon can bi gulan, çend bi xerdel û kîmyasalan, çend jî ji birçîbûnê helak bibin, gava li 'halê welatên cîran bê nêrîn, wê bê fêmkirin. Li ber ronîya van me'lûmat û tefekkuran, 'halê erdnîgarîya Îslamê û emelên xaçperestan xweşiktir tê fêmkirin ku XWEDA ev kerem û ni'met li me muminan kirine li hember teşebbusa derbeyê. Jixwe ev rûpel ne cihê zêde dirêjkirina îza'hatêye. Hew me xwest ku ev bûyera dîrokî di rûpeleke Kelhaamed de jî bête qeydkirin. Xweda îdarevanên ku edakirina şukrê van ni'metan biheq tînin cih, nesîbî me bike, daku nî'met berdewam be. **Amîn.**

www.arsivakurdi.org

EXLAQÊ PÊXEMBER 'ELEYHÎSSELAM

✍ 'Ebdurrehîm OMERÎ

Rebbê 'alemê Pêxember ('e. s) ji me re kiriye nimûne û mîsaleke pir xweşik. Ew li ser exlaqekî mikemmel bû. Çunki wî edeb û terbiya xwe ji Rebbê 'alemê sitendibû. Ka em bi nezereke giştî li exlaqê ronîya çe'vê me 'Hz. Muhemmed (sav) binêrin:

"Wexta yekî bang dikire wî, digo kerem bik" "Nigê xwe di civatan de dirêj nedikir.""Wextê li ser heywana xwe di rê de kes bidîta, ew siwar dikir.""Xwe ji kesî bilindtir nedidît. Pir dilnizm bû.""Eger bihata civatekê li ku derê cîhê vala bidîta, li wê derê rûdinişt. Tu kesî aciz nedikir." "Karê xwe ji kesî re nedihişt, wî bi xwe karê xwe dikir." "Îştîraka cenazeyan dikir." "Eger eshabê xwe sê roja neditaba, sûala wan dikir. Ku bi rêkê de çûbana ji wan re du'a dikir. Malbatê wan zîyaret dikir." "Axaftina Pexember ('e,s) pir şêrîn bû û dil nerm dikir. Ji bo gotina wî xweş fehm bikin, hêdî hêdî û yekoyeko diaxivî. Bi qehqeha nedikeniya lê belê tebessum dikir, timmî devliken bû."



"Pexember ('e,s) ji zarokan pir hez dikir. Silav dida wan, ew himbêz dikirin û deste xwe yê mubarek li ser serê wan digerand, li halê wan dipirsî." "Nexweş ziyaret dikirin û ji wan re du'a dikir.""Ji mêvana gelekî hez dikir. Ji mevanên xwe re xizmet dikir. Digot: **"Meznê qewm, xizmetkarê qewme."** "Ji kesî re peyvê nexweş nedikir. Dilê kesî nedişkand. Me'dê xwe tirş nedikir." "Li 'eybê insanan nedigeriya. Ku 'eybeke yekî bîdîtana jî 'eyba wî li wechê wî nedixist.""Ku kesek li ba wî bişteğilîya, lê guhdar dikir. Peyva wî qut nedikir.""Li paqijîya xwe pir miqatebû. Timmî dirarê xwe bi miswakê paqij dikir. Digot: **"Paqijî ji îmanêye."**

"Pexember ('e,s) her daîm rastî digot. Jiber vê hetta neyarên wî jî jê re digotin **Muhammedul Emîn/ Muhemmedê rast.** Heger sozek bida, ji wê soza xwe venedigerîya. Û ji derewçîyan hez nedikir.""Hz. Muhemmed (s. 'e. W.) pir camêr bû. Ku yekî tiştek jê bixwasta, nedigot na û ew vala venedigerand. Digo: **"Ez encax belav dikim, ê ku dide Allahû Tealaye."** "Gelek 'efûkar bû. Dijminê ku pir te'de dabûyê jî jibo Xwedê 'efû dikir. Kesê ku xerabî pê kiribûn, wî qencî li wan dikir. Yekî go qencîyek pê kiribû, wî qencîya wî jibîr nedikir." "Hurmet dida ixtîyaran. Hedîye qebûl dikirin û wî jî hedîye didan. Digot: **"Hedîya bidin hevdû da hûn ji hev hez bikin."**

"Hz. Muhammed ('e,s) dîlawer û qehreman bû. Hz. Omer (r. 'e.) dibêje: **"Min ji Resulê Xwedê cesûrtir/dîlawertir kesek nedî."** Hz. 'Eli (ra) jî dibêje: **"Em di herbê de bûn, wexta herb germ dibû û zor li me dihat, me xwe dixist paş Resûlûllah. Lewra ji wî bêtir kes newêribû nezî dijmin bibûya. Bi wesîla wî me xwe ji dijmin mihafeze dikir."**

"Nimejên xwe di wextê da bi cema'et dikir. Digot: **"Nimej, sitûna dîne û ronîya çe'vê mine. Bi cemaetê re bin. Muheqqeq mîha ku ji pez veqete, wê gûr wêbixwe",** "Digel ji gunehan dûr û berî bû jî rojê heftê carî carna jî sed carî ji Rebbê xwe tobe û îstîğfar dixwest.""Di du'ayên xwe de vê du'ayê gelek dikir: **Ya Rebbî tu hem li dinyê û hem jî li axretê qencî û başîyê bimedî. Û tu me, ji agirê cehennemê bisitirîne."** "Go yekî mizgînîyek bidayê, wî hemd û şikir dikir ji rebbê xwe re. Û diçû secda şukrê." "Eger di rê de leqayî mu'mînekî biba, ewil wî silav didayê, destê wî digirt, pê re musafaha û jê re du'a dikir.""Berî razê destnimêj digirt. Sûretê qul huwallahu ehed, **qul e'ûzû bîrebbîl feleq, "qul e'ûzû bîrebbînnas û amerresûlû** dixwendin. Û li ser alîye xwe yê rastê radiza."

www.arsivakurdi.org

TU MÊVANÎ

✍ M. Salih MISQEYNTERÎ

Mirine derdê bêderman, çima hewqas tu nezanî,
Ğafil nebe eya însan, li vê dinyê tu mêvanî

Xweda da te umrê delal, nan û nî'met ava zelal
Çav û guh ziman û qal, li vê dinyê tu mêvanî

Wî (c.c) ev dinya ha bêmîsal, temam mexlûq 'erz û 'îyal
Tev çêkirin eya heval, li vê dinyê tu mêvanî

Xweda da te 'eql û kemal, bejn û bal û husn û cemal,
Mal û meqam, 'ilmê delal, li vê dinyê tu mêvanî

Ji vê xewê çavan veke, gunha teva bike terke
Exlaqê baş bik mesleke, li vê dinyê tu mêvanî

Cennet heqq e ne henek e, 'îbadetê jibîr neke
Îman teqwa çi xweş çeke, li vê dinyê tu mêvanî

Dinya temam mulkê te be, li hember te kes tune be,
Tê jî bimrî ğafil nebe, li vê dinyê tu mêvanî

Tu rebenî belengazî, bi mal û mulk nebe razî,
Tê jî barkî rût û tazî, li vê dinyê tu mêvanî

Li jîyanê tu binêrî, xweşîw ta'lî ken û girî
Dewam nakin wê bihurî, li vê dinyê tu mêvanî

Çi te'm heye li vê dinê, dost jihevdû qetandinê
Wê çêbibe bi mirinê, li vê dinyê tu mêvanî

Bila dinya nebe armanc, digel mal û mulk û zewac
Li ser sera wê neke tac, li vê dinyê tu mevanî…

Zavatîyê hem xortanî, mûyê reş û ev ciwanî
Wê rojekê bibin fanî, li vê dinyê tu mêvanî

Salih dinya nabe ware, tu j-qelbê xwe birîndare
Xwedê tenê bike yare, li vê dinyê tu mêvanî…

www.arsivakurdi.org

"Xwedêyo! Tu Kê Bivê 'Ezîz Dikî, Kê Ji Bivê Rezîl Dikî"

✍ Muhammed ŞAKIR



"Bibeje: Xwedêyo! Tuyî xwediyê xwedanîyê.
Tu kê bivê milk didî wî û kê bivê milk jê distînî.
Tu kê bivê 'ezîz dikî, kê jî bivê perîşan dikî.
Xêr û bêr her di destê te de ye.
Bêguman Tu li ser her tiştî qadir î." (Alî îmram. 26)

Amenna ya rebbî…
1) A rast meriv dibêje qey ev ayeta han hê nû nazil dibe. Ji 15'ê Tîrmehê û vir de ye welat li gor qanunnên derasayîyê tê îdarekirin û birêvebirin. Ya ku em tê de diherikin pêvajoyeke dîrokîye. perfetên mezin di xwe de dihewîne. Ji wan hinek, ji niha de xuya jî bune. Heke ev badîre û xetera han bi selametî bê qevastin dê xweşî û mizgînî ya di vê ayeta pîroz de hê nêz bibe. lê xal û nuqta ku em li ser bisekinin û ders û îbretan jê derxin, bi tene ne ev e…

2) 'Esil heqîqeta meselê û ya ku lazim e em li ser bisekinin, ders û îbretan jê derxin, tecellî û xuya bûna îrada Rebbê 'alemê ye. 'Esil mesele ev e. Lê mixabin, pirê mirovan vê heqîqeta hanê nabînin an jî naxwazin bibînin. Sebebên vê yeka han gelekin…

3) Keseki ku bi qasi piçekê jî îman di dilê wi de hebe, Bêguman wê zanibe. Ji 15'e Tîrmehê bigirin heta îro, buyer û hadîsên mezin yê dîroki ku aniha em tev bi hev re di nav re derbas dibin, bê şik nûr û tecelîya Rebbê 'alemê ye ku di vê ayeta piroz de bi gelek mane û wateê xwe eşkere û dîyarî buyê. Nexasim buyerên 15'ê Tîrmehê… Heke

www.arsivakurdi.org

ne îrade û alîkarîya Rebbê âlemê ba, îro him welat û
him jî millet wê di rewşeke dîde ba…

4) Mirov 'aciz e. Bêhêz û bêqewet e. Digel vêna bêsebr, bêxebat û
Bêteheme jî. Rebbê 'alemê ne wisa ye, Ew ji her kêmasî
Û pûçiyan pak û bêriyê. Bixwaze keseki rezil û şerpeze bike
Ji bo wî di cîh de sedemên zexm, qewîn û bi hîkmet pêk tîne
Amade dike. Dû re jî textê rûmetdarîyê ji binî dikişine û
Serberjêr, serseri û sernixûn dike. Ji bo vê, mînak zehf in.
Fîr'ewn, qarûn û yê din. Di vir de Qurana pîroz fêrxan e
Û dersxane ye… "vêca hey gelî 'akilmendan ders û ibretan bigirin." (Heşir, 2)

5) Gava ku em hevoka "Tu kê bivê 'ezîz dikî kê jî bivê rezîl
Dikî…" dixwînin, heqîqetên him şewq û xuya buna di vê îbarê de
Him jî îrada ku di temamê ayete de hema
ji her alî ve li me dide û bi hawîrdor me dipêçe, me
germ dike. Wek tîrijên rojê… tîrejên ayeta pîroz jî li
me dide. Li çav û ruyên me, li hiş û mêjiyên me, li dil
û hinavên me, li nefs û ruhên me û hema li hemû
hebûnên me dide. Kezeba me hênik, hundir ê me germ
dike. Aram û dilşadîyê dibarînê. Bînayî û çirûsê dixe
çavên me, ruyên me rewnaq dike. Hinek perdê ğefletê
diçirîne û bi vî awayî bergeh û nêrina me fireh dike,
barana besiretê dibarîne bi ser me de…

6)Bi alikariya xwedê Te'ala meriv mizginên herî mezin di
Wateê vê ayeta hanê de dibîne. Ji hîkmetê Wî sewal nayê
Kirin. Lê carnan Ew hinek maneyên di ayetên xwe de
bi wesîla hinek bela û musîbeta diyar dike, carnan jî
bi wesila hinek bûyer û hadîseyên gelemperî dîyar,
eşkere û nazil dike. Di bûyerên 15'e Tîrmehê de jî
maneyên vê ayeta pîroz ji nû ve nazil bû û dibe. Çimkî
di vê bûyera bi 'îbret de xwedê Teala neyarên xwe û
neyarên hemû mu'min û mustezefan carekî din rezil,
kepaze û şerpeza kir. Hemd û sena her ji wî re ye.

7)Helbet herkes, her kom û hêz wê ji alî xwe ve li vê
Hadîsa dîrokî binere. Lê ez dibêjim xwedê Te'ala di
vir de umrekî nû da me. Jî bo me qewl û moleteka bi
hucet bexişand û derfetên xurt û zexm da pêş me.
Da ku ji vir û pêve em xweş bimeşin, em hê xweş
Bibînin, yar û neyarê xwe hê zû ji hevdû biqetînin
bide ali… welhasıl, da ku xwedê Te'ala neyarê
Xwe rezîl û me jî 'ezîz û serfiraz bike…

www.arsivakurdi.org

BI SEROKÊ PLATFORMA KARWANÊ ŞEHÎDAN

MELA OMER ÇELÎK RE HEVPEYVÎN



Her weke tê zanîn di qetlîama ku di 7ê Cotmeha 2014an û pê de di serî de li Diyarbekirê û seranserê herêma Bakurê Kurdistanê hat rast kirin de gelek şexsîyetên misliman yên qedirbilind û mêrxas hatin şehîdkirin. Piştî vê jî platformeke bi navê "Platforma Karwanê Şehîdan" ku serokê wê mela **Omer Çelîk**'e hat sazkirin. Me jî di vê hejmara xwe de cîh da hevpeyvîna bi serokê vê Platformê re. Beriya ku em we bi hevpeyvînê re bi tenê bihêlin, bi vê wesîleyê em careke din şehîdên Îslamê ku ji bo hakimkirina hukmê şerî'eta Xweda xwîna xwe rijandine û xwe gorî kirine bi minnet û rehmet yâd dikin… Kerem bikin.

Seydayê 'ezîz, serê ewil li ser xêrê be Platforma Karwanê Şehîdan. Beriya ku em behsa armanc û xebatên platformê bikin, em dixwazin hinekî li ser ehemîyet û grîngîya şehadetê bisekinin. Jibo ummeta Îslamê şehadet tê çi maneyê?

Xweda ji we razî be. Şehîdî jibo ummeta Îslamê meqamekî pir mezin û qedirbilind e. Wexta eşqa şehadetê ket dilê ummetê û jibo gîhiştina şehadetê micadele kirin, ew çax ummeta Îslamê-âlema Îslamê serbilind bû û pê serfîraz bû. Dîsa çi wexta ku dev ji şehadetê berdan û tirsa mirinê kete dilê wan û li pey dinyayê meşîyan, Xwedayê teala ummeta Îslamê xiste bin lingê zalim û kafiran. Ji ber ku şehadet piştî pêxembertîyê meqamekî herî mezine, qewmên ku şehadet ji xwe re kirin armanc û hedef û ji mirinê netirsîyan, ji wan re meğlûbîyet tine. Ew millet ew qewmê han ji zilletê dûre.

Wek me di serê ewil de jî gotibû, we platformeke nû saz kirîye. Xaye û armanca Platforma Karwanê Şehîdan çiye?

Belê xaya me ew e ku çawa me li jor behsa ehemîyeta şehadetê kir, em dixwazin şehadetê bi xelkê xwe bidin fêmkirin. Emê bi vê wesîleya Platformê ji gelê xwe ra şehîdî û şehadetê bidin fêmkirin û ji mislimanan re şehîdîyê bidin hezjêkirin. Heta ku xaya şehadetê baş neyê fêmkirin, xelasîya me jî wê tune be. Yek ji xaya me ya duyemîn jî eve ku piştî şehîd dighêje Rebbê xwe, li pey xwe tiştan dihêle. Ev tişt çine? Wek çawa ewlad dihêle, dê û bav dihêle her çiqas şehîdî jibo me xelat û xelasîyeke mezin be jî li gor nêrîna me ya beşerî ya dinyayî şehîd ji dinyayê çûne. Ji ber vê qasî dibe ku ehlê mala wî bê kes bimîne, bê xweyî bimîne. Xaya me ewe ku em malbatên şehîdan bê kes û xwedî nehêlin. Em bêjin; xwedîyê we emin. Jibo ku misliman ji çûna şehadetê netirsin, nebêjin malê me malbata me bêxweyî dimîne. Bila hemî kes vê yekê bizanibe ku malbatên şehîdan, ewlad û 'eyalên wan ne bêxwedîne. Emê hata ku ji destê me were li wan binêrin û xwedîtîyê li wan bikin.

Ji bo ku hûn vê armanca xwe hem bi raya giştî re û hem jî ji mislimanan re bidin fêmkirin, hûnê bername û çalakîyên çawa li dar bixin? Ji kerema xwe re ji me ra behsa bernameyên Platforma Karwanê Şehîdan bikin.



Serê ewil xebata me ya herî grîng eve ku em malbatên şehîdan tesbît bikin. Maddî manewî çi ji destê me bê em bikin, ji ewladên wan bigrin, xanê wan, dê û bavê wan piştî me çû ew tespît kirin, emê alîkarîya wan bikin.

Ya duyemîn jî emê heyat û jiyana şehîdan li hev bicivînin hem bi nivîskî û him jî bi wêne û dîmen emê pêşkêşî gelê xwe bikin. Ji xelkê xwe re heyata şehîdan wek nimûne bidin nîşan.

Ji bilî vê jî emê konferansan li dar bixin û behsa şehîd û şehadetê bikin. Di hedefa me de em bajar bi bajar bigerin û behsa şehîdîyê bikin. Lewra milletekî ji şehîdîyê hayîdar be ew timî hişîyarin û zindî ne. Ji wan re tirs tune ye ew her tim serkeftîne.

Seydayê 'ezîz, jibo ku we wexta xwe ya biqîmet ji me re veqetand em teşekur dikin, mala we ava be. Ji bo Platforma Karwanê Şehîdan jî her tim dûadarin û serkeftinê hêvî dikin.

www.arsivakurdi.org

EWEL KU YARÊ DA ME

✍ Melayê CEZERÎ

Ewwel ku yarê da me yek zerreyek ‘înayet
Qismet me xemr û cam e di deftera hidayet

‘Husn û cemalê canan nadêritin tu payan
Herçî nebit bîdayet esla nehin nîhayet

Feyza ‘ulûmê ‘hîkmet cama sedef ku gêra
Me ji destê mu‘xbeçan dît bi mis‘hef û bi ayet

‘Arif ‘heta nenoşî ji destê meyfiroşî
Ğaib nebû ji hoşî peyda nekir wilayet

Gunah û zuhd û tamat hilnagirit xerabat
Kesê bi vî derî ret divê bikit rî‘ayet

‘Işqê ji herdû çeşman ewwel di dil eser kir
Lê zerre zerre axir sotin kir û sîrayet

Şakî s-silahê herdem bi kuştina Melê bit
Gazindeyan ji kê kim ji kê bikim şîkayet

Cama di destê şahîd jengê ji dil dişotin
Pîrê mu‘xan ji rendan weh weh dikir riwayet

Etwarê ‘işq û mestî esrarê putperestî
Teqrîrê sed rîwayet nakit li bo kîfayet

Lî yetmeînne qelbî ‘eyn u1-yeqîn dibexşit
‘Eyn ul-‘iyan divêtin kafî nehin dîrayet

Mîrî yû padişahî mûyek li nik Melayî
Nadim bi mulkê ‘alem yek zerreyek ‘înayet

www.arsivakurdi.org

RÊZENIVÎSEK LI SER HINEK SITRANÊN NÊZDÎROKA ME

✍ Cewdet KARAMAN

Gelî xwendevanên delal û bi rûmet! Eger Ellah Te'ala destûr bide em dê di vê nivîsa xwe de bêhnek li ser Sefera Sariqamişê bisekinin û qesîdekî kêvn a ku li ser vê bûyera 'hezîn hatiye hûnandin teqdîmî we bikin.

Her wekî ku tê zanîn hilweşîna İmperetora 'Usmanî di sedsala 19. de herî zêde bi lez û bez bû. Lewra di vê demê de di nav sînorên İmperetora 'Usmanî de wek nîjadperestî û 'xerbperestî nexweşînên 'xerbî yên cûrbe û serhildanên muxtelîf dereketin holê. Hê ev ne bes bû hêzên koledarê 'xerbî jî xwestin ku agirê tevlihevî û fitnê di nav sînorê İmperetora 'Usmanî de dadin. Ji ber ku di nav sînorên 'Usmanîyan de gelek serhildanên nîjadperestî pêk hatibûn ji Balqan bigre 'Heta Lîbyayê Artêşa 'Usmanîyan di şerekî yeman û bêeman de westiya bû. Ji deverên muxtelîf gelek xortên terr û teze çûn şer û nefetilîn. Her carê ji bo perçekî welat seferberlik dihat îlankirin û xortên terr û teze diçûn riya man û nemanê. Riya man û nemanê yanî çûna seferberlikê di nav Kurd û Tirka de bû bingeha gelek sitranên muxtelîf.

"Dayê Yemen e gul û çemen e
Ê diçe hew tê gelo çi sebeb hene" [1]

Di 'halekî wihareng de hêzên emeperyalîstê 'xerbî li ser şêlandina gelên mezlûm bi hev ketin. Di encama vê bihevketinê de hêzên emperyalîst û koledar bûn du birr. Hêzek ji van hêza wek Almanya, İtalya û Awusturya Macarîstan bi navê dewletên İtilafî, ya din jî wek İngiltere, Firansa, Rusya bi navê dewletên İttifaqi hat binavkirin.

Bi rastî pevçûn û şerrê herdû aliya jî li ser parvekirina m e n - fî'eta dunyayê bû. Lewra İmperora 'Usmanî bi nexweşînên îçtîmaî yên muxtelîf nexweş ketibû û ber hilweşînê ve diçû. Ji ber ku sînorê İmperetora 'Usmanî gelek berfireh bû temmamê van hêza di xwestin ku li ser axa muslumana konê hakîmîyeta xwe vedin û ji Hindistanê bigre heta Afrîqayê axa gelê musluman û mezlûm bi şêlîn in. Merkeza xîlafetê İmperetora 'Usmanî wek şêrê birîndar û extiyar bû. Lê xofa wê hê jî di dilê ehlê kufrê de şax vedida. Tirsa wan ew bû ku birînê vî şêrî bi cebirin wê ev şêr ji xwelîya xwe vejî û ji nû ve bibe hakimê cîhanê. Lewra çiqa ji destê wan hat hewqas gengeşî û fîtne xistin nav milletên İmperetora 'Usmanî.

Piştî Tenzîmatê di nav arîstoqratên 'Usmanî de mêla 'xerbperestî bi pêş ket. Gelek rewşenbîr û arîstoqratan zen dikirin ku rabûn û vejîna İmperetora 'Usmanî bi 'xerbîbûnê mimkûne. Lewra ehlê serayê gelek serleşker û biroqratên xwe şandin Ewrûpa. Giranîya van rewşenbîra di qalibê ehlê kufrê de bi dilqê muslumana vegerîn welatê xwe. Van kesa hem biroqrasîya 'Usmanîyan hem jî artêşa 'Usmanîyan teslîmî ewrûpa kirin. Wek mînak di vê demê de hêzên Behrî di bin qumnadrîya "Amîral Lîmpûs" de bi bal İngilzan ve, Hêzên Berrî di bin Qumnadarîya "Von Sanders" de bi bal Alman ve, Hêzê Asayîşî (cendirme) jî di bin qumnadariya "General Baûman" de bi bal Firansiza ve hatibû sipartin.

Ji ber ku artêşa Ûsmanîyan bi giranî bi bal hêzen 'xerbî ve

hatibû sipartin wexta ku hêzên 'xerbî bi hev ketin İmperetora 'Usmanî jî mecbûr ma ku bi alî kî re 'hereket bike. Lewra İmperetora 'Usmanî di destpêka Şerrê Cîhana Yekemîn de ji bo îttîfaqek qewîn li rê û rêçika geriya

Biroqratên 'Usmanî ewil li derê Firansa dan, xwestin ku bi wan re 'hereket bikin lê bersîva wan bi awayek menfî hat dayîn. Biroqratên 'Usmanî paşê li derê Almanan dan. Ji ber ku pêdiviya Alman jî bi vê tifaqê hebû Almanan ev teklîfa 'Usmanîyan qebûl kir û di duduyê Tebaxa 1914ê miladî de ji teref İmperetora 'Usmanî û Alman ve peymana tifaqê hat İmzekirin.

Dewleta 'Usmanî ji bo ku barê ser milê hevkarê xwe sivik bike li hêla Suweyşê bi İngilîza re li hêla Anadolê jî bi Uris re ket 'herbê. Bi rastî ev politiqa polîtîqakî şaş bû. Lewra ji ber ku bi sala di 'herbê de mabûn Leşkerên 'Usmanî ji şer westiyabûn. Ji xwe Milletê 'Usmanî jî ji hêla aborî ve di rewşeke xerab de bû. Lewra tu îmkanek milletê nema bû. Ne nan hebû ne dan. Gel di nav feqr û zerûreteke dijwar de bû. İmkana sewqîyata çek û cebilxana jî tunebû. Malmîratê Ûris di qeraxê Be'hra Reş de kemîn danîbû. Çi geştîya ku jibo alîkarîya leşker bi rê diket Ûris ew geştî noqî behrê dikir. Çek û sîleh û muhîmatên herbê tenê bi pişta heywanan û barê însanan dihat temînkirin.

Gelê Anadolê bi fedekariyek bê hempa pişta xwe dida ber barê muhîmata û diket rê. 'Heta ku muhimmat digiştin leşker roj û meh dibôrîn. Ji ber ku di 'Herba Cîhana yekemîn de seferberîya 'ûmûmî hat îlankirin mêr û xortên xama di mala de nema bûn. Lewra jin û xortên 12-13 salî ji leşker re cebilxane dikşandin. Ji xwe neqlîyata leşkeran jî bi meha di domîya. Wek mînak leşkerên ku ji Yemenê dihatin ji çar meha zêdetir di çol û çolistanan de rêwîtî dikirin hê di gihîştin Erzeromê.

Wek temmamê welatê 'Usmanîyan li Kurdistanê jî 'halê seferberlîkê berdewam bû. Xortên terr û teze bûkê serbixêlî û destbi'hine di mal de dihiştin û diçûn eniya şer. Jin û zarok û sebiyan jî bi piştê cebilxane dikşandin. Naçarî û birçîbûn jî bûbû barê ser bara.

Welatekî bi sar û serma, leşkerên bê cil û kinc erd hişk û asîman dûr. Tenê gazî û hewar bi bal erşê 'ezîm ve ye. Ji bil Artêşa 'Usmanî gelê Kurd jî wek milîs organîze bûne û di eniya Qafqas de derdikevin pêşberî Ûris. Carna kesên wek 'Ebdul Mecîd Beg bi şûrê tazî dajon ser Artêşa Ûris û topa Ûris dîl digrin.

Leşkerên Qazax û Mîlîsên Ermen jî vê rewşê wek furset di 'hesibînin û bi Ûris re êrîşî muslumna dikin. Musluman jî di vî şerrê man û nemanê de di ber xwedinin û destanê mêrxasîyê dinvîsin. Wek mînak serleşkerê Ordûya 3.Hesen İzzet Paşa di Kanûna Ewila sala 1914ê miladî de li Koprukoya Qersê êrîşê dibe ser artêşa Ûris. Artêşa Ûris di vî şerî de têk diçe lê mixabin Hesen İzet paşa teqdîkek şaş bikar tîne û bi paş ve vedikşê pozîsyona xweparastnê digre. Gelê musluman nexasim gelê Hesenqelayê vê rewşê na'ecibînin, çend kesa di şînin pêşberî 'Hesen İzzet Paşa û dibên: "Paşa hûn bi ku ve di revin. Ma hûn namûsa me di nav lepê Ûris de dihêlin. Me ewladên xwe ji bo van roja şand hewara we. Yan em bi hev re bimrin yan jî emê 'heta nefesa xwe ya dawî şer bikin" Mixabin ev feryad û fîxan fêde nadin.

Vekişandina 'Hesen İzzet Paşa rê li ber Ûris vedike. Leşekrên 'Uris kar û tedbîrê xwe baş dibînîn çek û cebilxaneyên nû ji xwe re peyda dikin. Lê hêza Muslumana permeperîşan e. Gel ji şer westiya ye. Vekişîna bi paş ve dibe sebebê demoralizasyona leşkeran. Bi ser naçarî belengazîyê de jî nexweşînek wek tîfusê di nav gel û artêşê de belav dibe. Gelek leşker ji ber vê nexweşînê dimrin. Ji ber ku şert û mercên îstîxbarî kêmin car cara leş



www.enaksurgi.org

kerên musluman bi şaşî atêş li hev girê didin. Gelek leşkerên musluman di şerrê Sarqamişê de ji teref birayên xwe ve bi şaşî tên şehîdkirin.



'Hesen İzzet Paşa piştî ku artêşa 'Usmanî ji milê şer ji bo pozîsyona xweparastinê bi paş ve vedigerîne moralê artêşê xera dibe. Lewra ji xwe bê îmaknîyê nefes li leşkeran çikandibû tam furseta biserktinê hatibû ber derî leşker bi paş ve hat vekişandin. Ev rewş bû sebebê nerihetiyê. Paşê Hesen İzzet Paşa istîfa kir û dev ji serleşkerîya Ordîya 3. Berda. Piştî 'Hesen İzzet Paşa, Enwer Paşa bu serleşkerê Orduya 3. Enwer paşa piştî ku wezîfa serleşkerîyê girt ji bo taarûzê berê leşkera da Sariqamişê. Ev şansê dawî bû yan wê leşker qir biba yan jî wê zaferek ûmumî bi dest bixista.

Di zivistana bi sar û serma û seqem de leşkeran berê xwe dan Çiyayê Ellahûekber û ber bi Sariqamişê ve meşiyan. Sefera Sariqamişê di 22yê Kanûna ewil a sala 1914ê miladî de dest pê kir û heta 5ê Kanûna paşîn domîya. Di nabeyna van rojan de sermayek dijwara wek zemherîr hebû. Bilindbûna berfê ya li erdê ji metrê zêdetir bû. Erdê cemed girtibû. Ji xwe kincên zivistanî di dest leşker de tunebûn, peydakirina kincên havînî jî zehmet bû. Di gel van şert û merca leşkerên 'Usmanî bi fedekarîyek mezin çûn seferê.

Çiyayê Ellahûekber çiyayek asê bû. Şert û mercên demsalî jî çetîn bûn. 'Adeta erd û asîman li Leşkerên 'Usmanî hatibû hev. Ê ku ji ber sermayê dimirin ji xwe dimirin ê ku diman jî seqet diman. Di encama vê seferê de teqrîben şêst hezar lekrerên 'Usmanî ji ber sermayê xenîqîn û şehîd ketin. Destê gelek kesa di nobetê de li ser tetika tivingê qerimî. Ji ber ku ax jî 'hişk bûbû û erd nedihat kolan cinazê leşkeran heta pêla biharê nedefinkirî ma.

Ev bûyera hezîn hem di nav Kurda de hem jî di nav Tirka de ji gelek sitranbêj û dengbêjan re bû îlham. Gelek sitranbêj û dengbêja sitran û beyt û qesîde li ser vê bûyera hezîn hûnandin. Hinek ji wan nuho tên bilêvkirin hinek jî bi borîna demê re hatin jibîrkirin.

Ev qesîde jî yek ji wan qesîda ye ku bingeha xwe ji vê bûyera 'hezin girtiye û bi wesîla dengê sofî û derwêşa gîha ye dewra me. De ka werin em bi hev re guh bidin qesîdebêjê xwe. Bê ka rewşa vê bûyerê çawa di nuhurîne. Kerem kin.

Ewela Remezanê 'esker kişya Diyarbekir
Kişyabû 'Elîparê çekê 'herbê li xwe kir
Ewela Remezanê 'esker kişya Diyarbekir
Kişyabû Çelîparê çekê 'herbê li xwe kir
Têlê li ser têlê dihat imdad xwestin ji Diyarbekir
Eskerê me hindik bû qal û qişla qîm nekir

Hewar e hewar e oy hewar û gazî ye
Hewar e hewar e lo oy hewar û gazî ye
Gaziya giran çêbû li ser Bavê Feyzî ye
Ê bi şûr bajo ser topê Ebdulmecîd 'xazî ye
'Arifê bi tenêyo İlahî tu bikî waylî e
'Arifê bi tenê ye ya Rebbî tu bikî waylî e

Ji Deşta Farqînê lo bavo heta Qumrîyê
Êvara İnyê bû xeber hat nav ordiyê
Ji Deşta Farqînê bira lo heta Qumrîyê
Êvara Cum'ê bû xeber bela bû li nav ordiyê
Ateş emrî dan 'esker bû 'hirmîna boriyê

www.bangaheq.com
www.arsiv.com

Ateş talîm dan 'esker 'hirmîn kete boriyê
Ji Deşta 'Hesenqelayê birano 'heta vira
Xwîna sor nuqutiye lo li daran û kevira
Xweziya du 'hev hevala hevdû 'helal bikira
Çekê herbê li xwe kirin çûne herba kafira
'Heyfa daykê lawika di zurî weka gura
'Heyfa lawikê lawika lo di zûrî weka gura

Hay nayê hay hay nayê îmdada şer 'ê nayê
İmdada şerî'etê Muhemmed Bavê Fatma yê
Di gaziya me de wê bişîne 'Elî Şahê Merdayê
Şêrê Rebbî were wê li kafir bike fet'hayê

Ji deşta Farqînê birano heta Qumriyayê
Êvara Cum'ê bû xeber hat nav Turkiyayê
Eskerê Osmnalî bi hev re berê xwe dayê
Çi herbek girane lo ê ku dere ji wê de nayê
Eskerê me rabû bi hev re berê xwe dayê
Çi 'herbek girane lo ê ku dere ji wê de nayê

Hay nayê hay hay nayê îmdada şer'ê nayê
İmdada şerî'etê lo Muhemmed Bavê Fatma yê
Di gaziya me de wê bişîne 'Elî Şahê Merdayê
Şêrê Rebbî were wê li kafir bike fet'hayê

Herbeki li me çêbû li 'Hesenqelayê sê gira
Qaleka li me qewmiye li Qumrîkoyê li sê gira
Herba vî Urisî bira neyê serê gura
Herba vî kafirî lo bira neyê serê gura
Ji hevdû veqetîn çûn şer tev du bira
Herba vî Urisî bira neyê serê gura

Çekê herbê li xwe kir çûne herba kafira
'Heyfa dayikê lawika lo di zûrîn weka gura
Çekê herbê lêkirin şandin herba kafira
'Heyfa xortê teze winda kir xort û bira

Hewar e hewar e oy hewar û gazîye
Hewar e hewar e lo oy hewar û gazî ye
Sebebê dînê pêxember kafir e ermenî ye
Sebebê dînê Muhemmed lo milletê ecnebî ye

Herbekî li me çêbû li 'Hesenqela li ber çem e
Qalekî li me qewimîye li Qumrîkoyê li ber çem e
Mîrat mayê gula bi hewa ra lem bi lem e
Birîndar kirine erdê birîndar dane cem
Şehîdê me kirin erdê birîndar dane cem e
Birîndar ketin erdê lo ne tuxtor û melhem e
Melhema birîndara li cem resûlê ekreme
Melhema kull û birîna li ba ersûlê ekrem e

Hewar e hewar e gazî li malê ewliya
Ji nexweş meqam û ji şehîd û xaziya
Hewar e hewar e gazî li malê ewliya
Ji nexweş meqam û ji şehîd û xaziya

Selîm û Sariqamiş di qarşiyê hevdûda ne
Ellah û Ekber da'x mezê li kal û pehlewan e
Eskerê Osmanlî bi hezara şehîd dane
Hin Ereb û Zaza tevê Tirk û Kurda ne
Not hezar eskerê me qefilîne ji serma ne
Şîrqînê 'eynelîya tê teqîna surmelîya ne
Şîrqînê 'eyenlîya tê bavo teqîna surmelîya ne
Bavo bi hev ra lêxin îro roja giran e
'Herba vî kafirî neyê serê gura ne
Herba vî Ûrisî bavo neyê serê gura ne

Hewar e hewar e gazî li malê ewlîya
Ji nexweş meqam û ji şehîd xaziya
Hewar e hewar e gazî li malê ewlîya
Ji nexweş meqam û ji şehîd xaziya

Gelî xwendevanên 'ezîz! Bi rastî me dixwest ku em bi berfirahî li ser sefera Sariqamişê bisekinin. Lê ji ber ku sînorê nivîsa me me'hdûde em meselê li vir kurt dibirin. Eger Ellah Te'ala destûr bide em dê di jimra kovara xwe ya dî de xwe berdin deşta Farqînê Şêx 'Ebdurrehîm û sitrana ku li ser wî hatiye hûnandin bi bîr bînin.

Heta jimara dî bimînin di xêr û xweşîyê de. Em ji we re duadar in ji dûayê we hêvîdar in. Fî emanîllah.

1-) Ev peyvên sitraneke Tirkî ne ku li ser SeferaYemenê hatiya Hûnandin.
Tirkiya wê ya ojinal whareng e. "Ano Yemendir gülü çemendir/Giden gelmiyor acep nedendir…"

www.arsivakurdi.org



NE WELAT û NE XEBATIM

✍ M. ʻEbdulletîf Neqşî

Ne welat û ne xebat im
Ne ava û rojhelat im
Ne kole bixwe welat im
Ji lew mexlûqê Rehman im

Wî ez dame bi sozdarî
Bi tewhîda Xuda Barî
Bi ʻalem ra xweş û gorî
Go Ğeffar e meger ʻebd im

Bi Quran be heq jiyan e
Di vê dunya şîrîn şîn e
Bi qencan re tev evîn e
Ji ğeyrî wan tercîh nakim

Me ne efkarê însana
Çigo pîstir ji heywana
Hemî şaş in ne rêzana
Bi Yasîn û bi Quran im

Eya dîndar melaw zana
Me be hefsarê dest wana
Te nadin pêş bi tu vana
Bi agahan gelek zanim

Bi wê rîh û bi wê şaşê
Tu gav navêy bi yoldaşî
Ne raste ew riya kaşî
Veribke bêje poşman im

De em herin ba Mûhemmed
Ew çêtire-j bav û weled
Xapandina dîn û cesed
Kengî rabe ev lam û cîm.

نه وه‌لاتو نه خه‌باتم

✍ ملا عبداللطيف نقشي

نه وه‌لاتو نه خه‌باتم — مه نه ئه‌فكارێ ئينسانا
نه ئاقائو ڕۆژهه‌لاتم — چيگۆپيستر ژحه‌يوانا
نه كۆله بخوه وه‌لاتم — هه‌مي شاشن نه ڕێزانا
ژله‌و مه‌خلوقێ ڕه‌حمنم — بياسين و بقورئانم

وي ئه‌ز دامه بسۆزداره — ئيا ديندار وه‌له‌و زانا
بته‌وحيدا خودا باري — مه‌به هه‌فسارێ ده‌ست ڤانا
بعاله‌مڕا خوه‌ش و گۆري — ته نادن پێش بتو ڤانا
گۆ غه‌ففاره مه‌گه‌ر عه‌بدم — بئاگاهان گه‌له‌ك زانم

بقورئانبه حه‌ق ژيانه — بوێ ڕيهو بوێ شاشێ
دڤێ دنيا شيرين شينه — تو گاڤ ناڤێي بێوڵداشي
بقه‌نجانڕه ته‌ڤ ئه‌ڤينه — نه ڕاسته ئه‌و ڕيا كاشي
ژغه‌يري وان ته‌رجيح ناكم — ڤه‌ربكه بێژه پۆشمانم

ده ئه‌م هه‌رن با محمد
ئه‌و چێتره ژ باڤو وه‌له‌د
خاپاندنا دين و جه‌سه‌د
كه‌نگي ڕابه ئه‌ڤلام و جيم



www.arsivakurdi.org



SÊ KOM AX

✍ Mamoste ŞEMREXÎ

Wezîr ‘Asim li mala xweye. Kincê xwe li xwe dike. Taştê dixwe. Hinekî bikêfe. Difikire gelo ka bê çi bike. Ji xwe re dibêje “Ê madem îro te’tîl û rehetiya mine, ezê derkevim dervê bajêr, bi hawê îro derd û kulan nebihîsim.” Ji malê der tê. Kincekî ğerîb li xwe kirye. Jilew zêde nayê naskirin. Di kuçan de, di nav însanan de derbas dibe. Gava ku diber bexçan re derbas dibe, çavê wî li beranê padîşah dikeve. Di nava bexçên xelkê de çawa bi serbest diçêre, digere. Wezîr dinêre kes li dora wî tune, ji xwe re dibêje: “Padîşah bi vî awayî neheqî li xelkê dike. Beranê xwe bera nav bajêr daye. Li ku bixwaze li wir diçêre, digere. Kes nikare ‘eleqa xwe jê bîne. Ê ku beran biqewrîne yan jî zirarekê bidê, ewê bê cezakirin. Ma ev însaf û ‘edalet e yaw? Madem tu ji beranê xwe pir hez dikî, wî di xaniyekî xweşik de, bi gîha û çêra teze û rind xwedîke. Nator û bekçiyê ber destê te ne hindikin.” Dûre bi hawê ser guhê xwe re bavêje, dibêje “Eeeh! Çi ji min re? Tu dibê qey bi serê min maye.” Radibe diçe, rêya xwe dewam dike.

Beran ji bexçekî derdikeve, dikeve bexçekî din. Xwedyê bexçe digel zarokên xwe, li nav bexçe dişuğulin. Kurê zilam dibêje “Bavo! Heywan ket nav bexçe.. Kiş kiş. Ho ho! Mîrat!” Hem diqîre hem jî kevir davêje beran. Bavê wî diğeyde û dibêje “Hiş be kurê min! Bila kes pê nehise. Beranê padîşah e. Kesê zirarê bide beran, ewê bê cezakirin.” Bi kurê xwe digre, nahêle tiştekî bike. Ji dûr ve du eskerên padîşah jî hêdî hêdî dimeşin, bi wî alî ve tên. Zilam ji xwe re dibêje “Xwedê kir ku em nedîtin. Ewê em tev ceza bikrana.”

Wezîr bi gerê derdikeve dervê bajêr. Hinekî betili

ye. Dixwaze here ser kaniyê, here bin hênkaya siya daran. Dere nav bexçe. Du heb meriv jî li wir dixebitin. Silavê li wan dide. Diçe ser avê. Her dû zilam silavê lê vedigerînin û xeberdana xwe dewam dikin. Wezîr piştî avê vedixwe, li wan dihesîne.

KESÊ 1. : Ji esl û feslê re 'îlm û zanebûn divê. 'Îlm û zanebûn, 'emel û siyaset dixwaze. 'Emel û siyaset, kakinya heq û 'edalet dike. **KESÊ 2. :** Ji heq û 'edalet re, hêz û hîmmet hewceye. Hêz û hîmmet jî şefqet û xîzmeta jibo millet dixwaze. Xîzmet jî divê lîllah jibo Xweda be. **ASIM:** Gotinê we pir bi me'nebûn. Ev hûn 'êrif in, hûn serraf in, hûn kînin? **KESÊ 1. :** Em rebenê Xwedênin. Tu dibînî em ji xwe re dipeyîvin. **ASIM:** Na xêr! Evana naşbin peyvê belengaz û rebena. Niha çi durr û gewher di we de hene hew Xwedê zane. Ka hela ji vî rebenê Xwedê re jî bêjin. Kesê bi esl û fesl herhalde padîşahe. Gelo padîşah yekî çawaye? KESÊ 1. : Kesê çû ser text, divê pê re hebe bext. **KESÊ 2. :** Çawa ji yê berya wî hatiye sitendin, ewê ji wî jî bê sitendin dema biqede mî'adê wî çi wext. **ASIM:** Ji peyva xweş re îtîraz tuneye. Lê gelo wezîr û siyasetmedarên padîşah çawanin? **KESÊ 1. :** Li ber dilê padîşah canone, lê bi rastî nanone, danone û şanone. **ASIM:** Ha ha ha! (Hinekî dikene) Ev tiştekî pir ğerîb bû. Min pir meraq kir. Gelo çawa dibin cano, nano, dano û şano? **KESÊ 1. :** Xwe bi padîşah dane hezkirin. Bi vî awayî li ber dilê padîşah bûne 'ezîz û cano. **KESÊ 2. :** Ger girtin qîmeta dinyê ji her tiştî bêtir, dibin nano. Ew çax ji bextewariya padîşah û xelkê zêdetir, li menfîeta xwe dinhêrin. Wezîr her car bi serê xwe weka tesdîq bike dibêje 'Hiiiii'

Di nava suhbetê de 1.Kes bi tevriyê xwe hêdî hêdî 3 kom axê dide ser hev. **ASIM:** Lê çawa dibin dano û şano? **KESÊ 1. :** Ji ber menfîeta xwe, hêsîrê destê padîşah in. Padîşah ku xeteyê wan bibîne, weka kutandina dano wan ceza dike. **KESÊ 2. :** Dûvre jî weka tîyatro û şanoya, li ber çavê xelkê wan rezîl û zelîl dike ji bo ji kesê din re bibin 'îbret. ASIM: Way li min! Hûn rebenê Xwedê, çawa şol û şuğlê padîşaha dizanin? **KESÊ 1. :** Lê padîşah jî tev ne yek in. Kesê bi 'edalet û xîzmeta lîllah be, Xweda qedr û dengê wî bilind dike. **ASIM:** Ew jî were ye. (Berê xwe dide sê kom ax û dipirse) Gelo ev sê kom ax çinin? Em sê kesin, her yek axa me yekîye? **KESÊ 1. :** Na na! Ev koma axa ewil, li serê wî kesî be ku sirrê xwe ji jina xwe re dibêje. **ASIM:** Tiştekî 'ecêb e. **KESÊ 1. :** Koma axê ya duda, li serê wî kesî be ku bîr û baweriya xwe bi erkanê dewletê tîne. **ASIM:** Ev jî 'ecêbe. **KESÊ 1. :** Ev koma sisiya jî li serê wî kesî be ku qûta xwe ji eqreba dike. **ASIM:** Tiştên pir ğerîbin evana. Ez bêjim ne wilo ye, nizanim. Berî hinga we tiştên xweş digotin. Ya qenc ez van tişta biceribînim. De haydê bi xatrê we gelî rebenên Xwedê.

Wezîr vedigere diçe nav bajêr. Beranek wek beranê padîşah dibîne û distîne. Tîne dixe axur. Di wir de xwedî dike. Paşî diçe beranê padîşah jî didize û dixe axur. Dûvre ji jina xwe re dibêje "Vaye min beranê padîşah diziye. Emê serjêkin û bixun." **JINIK:** Tu çi dibêjî? Padîşah pê bihese, ewê te bikuje. **ASIM:** Heger tu ji devê xwe dernexe, kes pê nahese. **JINIK:** Ezê çawa bêjim, çawa kuştina te bixwazim? **ASIM:** Ew çax ezê beran serjêkim û gazî hinek dostê xwe jî bikim.

Wezîr beranê kirîbû digro, sor dike. Gazî hevalên xwe yên wezîr jî dike. Li malê bi hev re dixun, vedixun û suhbet dikin. Gava Asim qehwê tîne, **WEZÎRÊ 1. :** Birayê 'Asim! Ev çi zehmet bû te kir, ne hewce bû. **ASIM:** Ka çi bûye? Ev çend sale em bi hev re dixebitin. Em carekî werne bahev ma qey pire? **WEZÎRÊ 2. :** 'Asim rast dibêje. Em bûne birayê hev. Muhbeta me hem xweş hem jî lazim e. **ASIM:** Tengî heye, firehî heye. Zehmetî heye, rehetî heye. **WEZÎRÊ 1. :** Divê em di her halî de piştevaniya hev bikin. **WEZÎRÊ 2. :** Çawa! Him jî divê ji herkesî bêtir. **WEZÎRÊ 1. :** Em dost û hevkarê hevin. Divê tu carî em hevûdin bi tenê nehêlin. **ASIM:** Baş e. E jî wilo dibêjim. **WEZÎRÊ 2. :** Pênc rojê dinyê zû diqedin, lê qedr û qîmeta dosta naqede. **WEZÎRÊ 1. :** Xisar û ketî ew e ku meriv dost û birayê xwe jibîr bike. **WEZÎRÊ 2.:** Mêr diçe, nav û meydan dimîne. Ti derdê dinyê divê nikari be dostaniya me biqurifîne.

Suhbeta xwe diqedînin. Wezîr xatir dixwazin, radibin diçin.

'Asim rojekê diçe ziyareta merivekî xwe yê nexweş. Meriv û civat li wir hazirin. Hinek yextiyar hinek jî navserene. Xêr hatin lihev dikin. 'Asim halê nexweş dipirse. Dûvre dest bi muhbetê dikin.**KESÊ**

www.ararat.org

www.bangaheq.com

1. : ‘Eferî ji te re xwarziyê min! Weha merivê xwe bipirse. **KESÊ 2. :** Pismamê ‘Asim! Xwedê ji te razî be. Ji aliyê merivaniyê tu bêqisûrî. Em kes nikar in ji te gazina bikin. **KESÊ 3. :** Şopa camêriya bavê xwe dimeşîne. **KESÊ 4. :** Em çi bikin jî, em nikarin ji bin mineta xêr û qenciyê bavê wî derkevin. **KESÊ 1. :** Xwarzê! ‘**ASIM:** Keremke xalê hecî! **KESÊ 1. :** Me bihîstiye ku padîşah ji bo zîra’et û ‘imarê, araziya bi îcarê dide millet. **‘ASIM:** Belê xalê hecî! (Koma axa jibo meriva tê bîra wî) Heger hûn bixwazin ezê ji we re ‘eyar bikim. **KESÊ 1. :** Xwarzê, tê qenciyeke mezin bi me bikî. Bila xêra dê û bavê te be. **KESÊ 2. :** Xwedê û pêxember ji te razî be. Tu çavê meyî. **KESÊ 3.:** Zaryê birayê rehmetî Hecî Xalid, heyran ji berê de baş in. **ASIM:** Bi îzna we be ezê rabim. Dîsa Xweda şîfa û silametiya xêrê bide. De bi xatrê we. **CIVAT:** Oğra xêrê be. Emanetî Xweda be. (Radibe derdikeve)

Rojekê wezîr li malê ye. Di odê de rûniştiye. Difikire. Carekê lê hayî dibe ku di sitûyê xanima wî de qolyeke zêrînî mezin heye. Pir diqehire. Diqîre. **‘ASIM:** Xaniiiim! Ew çi qolyeye? **JINIK:** Min çû kirî! **‘ASIM:** Bê min tu çawa diçîw dikirî? Hew Xwedê zane ku bi çiqas pereye. **JINIK:** Ma çi bûye? Kêfa min jê ra hat, min jî sitend. **ASIM:** Tê here vegerîne. Têrxwarin li serê me nexistiye? **JINIK:** Ez venagerînim. Tê herî bi serê xwe beranê padîşah serjêkî, tiştek pê nayê. Lê gava ez herim ji xwe re qolyek bistînim dibe qebehet ha! **‘ASIM:** Tew zimanê te jî dirêj bûye. Ezê bi kêrê ji binî de jêkim. (Baz didê. Jina wî jî direve û di kuçê de diqîre) **JINIK:** Ha hoooo! Wezîr beranê padîşah serjê kiriye. Dixwaze min jî bikuje. Haa hoooo!

Însan li wan dicivin. Du heb leşkerên padîşah bi wir ve tên. Gotina jinikê dibîhîsin û hema di cî de ‘Asim girê didin. Asim ji xwe re dibêje “koma axê ya ewil rast bû” Gava leşker bi milê wî digrin, wî kaş dikin û dibin, ji wan re dibêje “Ez ‘Asimim, wezîrê padîşahim.” Lê tu leşker, li wî guhdarî nakin. Di rê de, di nav lepê esker de, ‘Asim dibîne ku merivê wî li rexê rê sekinîne. Dilê meriva bi wî dişewite, lê ji wan tu kes newêre alîkariya wî bike. ‘Asim li wan dinêre û ji xwe re dibêje “koma axa duda jî rast bû” Di birinê de hinek ji însanê li hawêrdor wan kom bûne ji hev re dibêjin “Evyax ma ne wezîrê padîşahe?” “Erê wezîr e.” “Çima wî girêdane? Sûc û gunehê wî çiye?” “Beranê padîşah serjê kirye.” “Tu nebê sûcê wî girane. Divê bê kuştin.” Hinekî din jî weha diqîrin. “Bikujin! Kesê beranê padîşah serjêke, ceza wî kuştine.” “Tew wezîre jî. Hew Xwedê zane bê çiqas xerabiyê din kirne.” “Qaşo ji bo wî digotin çiqas baş e. Ji zalima re nehêlin. Bikujin.” “Ma qey te bi me’aşê xwe têr nedixwar? Tu rabû çû te beranê padîşah serjêkir.” “Ceza nankora daliqandine, bikujin!”

Asim dibin meydanê. Serleşker ji eskera dipirse: “Sûcê wî çiye we girtiye?” “Beranê padîşah serjê kirye.” “Şahidê we kiye?” “Jina wî eşkere dike.” “Heta padîşah di heqê wî de qerarek bide, li vir bisekinin.” “Ser çava!” Serleşker diçe. Ji ber ku herkesî bihîstiye, wezîrê din jî tên. Li halê Asim dinhêrin. Di şûna wê merselê sağkin, rastiya wî fêm bikin, radibin weha dibêjin. **WEZÎR:** “Ma bi rastî wî, beranê padîşah serjê kirye?” **LEŞK:** “Erê! Jina wî xeber da.” **WEZÎR:** “Ê kû beranê padîşah bikuje, ceza wî kuştine!” “Destdirêjiya beranê padîşah, neqebûlkirina hukmê padîşahe.” “Însan encax dîn û kêmaqil be, dikare beranê padîşah serjêke.” Serleşker tê û dipirse “Wezîr ‘Asim! Tu qebûl dikî kû te beran serjê kirye?” **ASIM:** “Min beran serjê kirye.” (Serleşker dîsa diçe. Wezîr îja weha dibêjin) **WEZÎR:** “Ma qey nizanîbû ceza vî sûcî daliqandine? Kuştin heq kirye.” “Cezayê kesê weha, lazim e ji millet re bibe îbret.” “Divê kesê weha neyê ‘efûkirin.”

‘Asim, piştî gotinê wezîran dibîhîze ji xwe re dibêje “koma axa sisêya jî rast bû” Serleşker tê. Fermanê dixwîne. “Wezîr ‘Asim digel zanebûna ku ewê tu kes têkilîya xwe ji beranê padîşah neyne, dîsa jî beran serjê kirye. Emrê padîşah guhdarî nekirye. Ji ber vê yekê, ji bo ji millet re îbret be, li vê meydanê ewê bê daliqandin.” Dar hazir dikin. ‘Asim dibin binê wî. Kindirê davên sitûyê ‘Asim. Berî wî daliqînin, serleşker jê dipirse: “Peyva te ya paşîn çiye?” ‘Asim jî li însanan, li merivên xwe, li wezîran dinêre û dibêje “Min beranê padîşah serjê nekirye. Vêga di axurê min de ye. Min beranekî din serjê kiribû.” Leşker derin beran tînin. Herkes ‘ecêbmayî dimîne. Serleşker dipirse ku çima weha kirye, ew jî mersela her sê koma axê dibêje.

Not: Kesên baş û qenc, ne weke jinik û meriv û wezîrane.

Li Ser We Em Hezînin

✍ Mela Mizgîn

Şehîdên dînê Îslam li ser we em hezîn in
'Ezîzên Mumina tev li ser we dil birin in
Xwezî bi wî meqam û cîyê hûn lê dimîn in
Şev û roj le'neta em li dijminê we tînin

Şehîd geh hûn Huseynin geh Cengîz û Fethîne
Hesen, Riyad û Tûran, Mehmûd û Cum'alîne
Fehad û 'Ebdullah'in, geh Lutfîyê Wanîne
Belê Mîzgîn piçûkê we ev carê Yasîne

Şehîd hûn pir 'ezîzin di qelbê ehle îman
Hetanê enbîya jî xwezî tînin bi we can
Meqamê we bilinde liba Mewlayê Rehman
Gelek medhê we daye Resûlê Cinn û însan

Li we daîm bibarin şehîd Selam û rehmet
Xweda yê Heq mekanê we û me bêxe Cennet
Ji ûmmetê re xûna we bike hêz û quwwet
Mubarek be hezar car li we ev heq Şehadet

www.arsivakurdi.org

Şîretên Bi Rûmet-2

✍ M. Mahmûd TIBYATÎ

❊ Desté alîkarîyé bidne hev. Xwe bixwe ji hevra bibne pîbar û alîkar. Alîkarîya rojeké bi mirovén mü'min re xértire ji îbadeta heyvek mizgefta.

❊ *Heta hun karibin ji kirina güneha birevin da ku hun ji miriné netirsin. Ji deyna xwe dur bigrin da ku li Diné hun azad û serbilind bin.*

❊ Hévîya qencîyé ji başé ümmeté bikin, di bin hîmaya wan de bijinin. Doza başîyé ji zalim û dilhişka nekin. Çüngî la'neta xweda bi serwan de dibare.

❊ *Qencîyé bi dé û bavé xwe bikin û ji wan re başbin. Qet ji bîr nekin, hun çi ji dé û bavé xwe re bikin, huné wé ji ewladé xwe bibînin. Lewra qencîya bi dé û bava hem xér e, hem wesîfa ewlattiyé ye û hem jî umur diréj dike.*

❊ Wek Qur'an a pîroz me şîret kiriye, ji dé û bavé xwe re nebéjin "Of"

❊ *Xwarina xwe bidne mirovén muteqqî û qencîyé bi mirovén mü'min bikin.*

❊ Selamé lihev bikin û desté xwe bidne hev da ku ji dilé we kînn û hesudî deré.

❊ *Mutewazî bin, bera rabun û runiştina we bi feqîr û xizana re be; da ku hun ji kibré azade bibin û bibne layiqî rehma xweda.*

❊ Xilata bidne hev. Lewra dana xilata hezkiriné zéde dike û kîné ji dila derdixe.

❊ Bi 'İffet û xweyî namus bin da ku jiné we jî bi iffet û namus bin.

❊ *Deruwa nekin lewra derew riziq teng dike.*



www.arsivakurdi.org



Birano! Qibla Me Bila Yekbe

✍ 'Ebdulbaqî BOTÎ

Ey birayên Tirk û Kurd û 'Ereb û Faris û netewên din! Li hev bicivin û li cem hev rûnin. Ne ku yek li rast yek li çep. Çiqeys birayên we yên din jî hene wana jî hildin li cem xwe. Ne Selmanê Farisî, ne Suheybê Rûmi, ne Cabanê Kurdî û nejî Bilalê Hebeşî bi tenê bihêlin. Nêzî hev bibin û xwe bigehînin hevûdû. Sefên xwe bişidînin weka safên nimêjê. Çawa ku Xweda wesfên we dide "Bunyanûn Marsûs" wek binaya kils û ber hevûdû bigirin. Da ku fitnebaz û fitnexaz nekarin fitnê têkin navbera we.

Hizir bikin; ji buna rêveber, qiral û melik ên xwe ên ne qenc; we bi hevûdûra şer û pevçûn dikir. Ji kerema Xwedê hûn ji hafa agirî hatin dûr xistin û Xweda ûlfet xiste qelbê we. Hûn ji hevdûra kirine bira. Dijbiratiyê nekin nebin nankorê vê ni'metê.

Birayên minê hêja Ji ber vê yekê neheqiyê li birayên xwe yên din nekin. Wana nizm û biçûk nebînin. Evê baş bizanin ê birayê xwe biçûk bibîne ev

guneh jêra bes e. **Eger tu "hem tirk, hem jî misilmanî; yan jî ji netewek dinî û misilmanî; bizane hem Kurd hem jî misilman, yan jî ji netewên din jî insan hene.** Ji ber vê yekê yê kurdewariya xwe yan jî xwe bi netewa xwe bide naskirin, wî bi îmanzeêfîyê itham nekin û wî teslîmê bê îmana nekin.

Eva tu dibînî; ez jî kurdim. Belê Xweda şahidbe tu carî û li tu derî kurdewariya xwe min li pêş misilmantiyê ne xistiye... Ji ber ku neteweperest nînim ji hêla neteweperest ên kurda ve nizm û biçûk tême dîtin. Her wiha ji ber ku kurd im neteweperestên tirka jî min biçûk dibînin...

Birayê min ê ezîz! Nebî tu bikeve evê şaşiyê ku dibên "hemd ji Xwedêre em hemû tirkin". Birastî şikurdarî tenê ji bona taybetiya îman û islamê lazime.

Tu! Birayê minê hêja ê Kurd! Bi sedan sale Pêşiyên te tenê dînê xwe li pêş her tiştî girtîye, ji ber vê meziyetê tawanbar û sûcdar têne dîtin. Ey birayê minê belengaz; ka guh bide min. Ezê heqîqetên ji Xwedê û ji Resûlê wî hatine, ji tera bêjim. Neko gotinên filozofên Xwedê nenas û komînîsta.

"Hûn giş xwe bi benê Ellah ê Banî bigirin û ji hev neqetin. Qenciya Ellah Teala ya liser xwe bi bîr bînin. Gava hûn ji hev re dijminbûn vêca hogirî xiste navbera dilê we, îcar hûn bi qenciya wî ji hev re bûn bira. Hûn li ser keviya dojehê bûn, xweda hûn jê xelas kirin. Herwiha Ellah Teala ayetên xwe ji we re diyar dike da ku hûn riya rast bibînin". (Alî Îmran 103)

Jibîr neke; tu misilmanî. Te li ber çokên sehabên Pêxember îman aniye. Di şopa dîrokê de ên weka Mewlana Xalid ji bona dînê Xweda bilind bibe! Merd û 'egîd perwerde kirine û ji te re bûne mamoste û pêşîvan. Evê berpirsîyarî ya xwe jibîr neke. Nebe ku wanê te tine dihesibînin tu biwan bixape û bikeve xeter û xeletiyê

Çi qeys kurdên ku tu biwan serfirazî! li jiyana wan binihêre. Tu wê bibînî tev bi İslamê serfiraz û serbilind bûne û tev ji bona serfiraziya İslamê xebitîne.

Belê ka binihêre ewên te kaş dikin li bal dojehê ve ka ji devê kîjan peyvekî bi xêr derdikeve? Kîjan ji bona dînê te dixebite? Ma tu nabînî çi anîne li serê qewmê te yê bi şeref û namûs; binihêre di demekî kin de ciwanên kurd anîne çi halî? Jinên kurda dibên êdî "em ne namûsa tu kesîne"...

Gotinên min ji tera pur hene bira. Belê ez dizanim ji bona tu gohdarî bikî jî tehemila hineka tuneye ku ez van gotina ji tere bêjim. Û ez dizanim tiştên ku tu jî ji minra bêjî hene.

Belê dizanim em mazlûmin, mustez'efin. Em inkar kirine, imha kirine, koçber kirine, şêx û pêşîvanên me 'idam kirine, goristanên wan ji me veşartine, em cahil hiştine, em ji agirî avêtine deryayên kûr. Belê bizane me pêdivî li dorpêçkirina wan marên wan nîne. Ji litfa Xwedê keştiya Nuh di nav meda ye û kirasê Îbrahîm di destê meda ye...

Hûn ê din! birayên min ên Ereb zarên wanê ku bûne sebeba misilmanbûna min, zarên muhacir û ensarên pêxember! Gûman heye ku em ji we hiz nekin? Ka we çawa hiz ji Suheyb, Caban û Selman kir, we ew hemêz kir! Em jî bi wî awayî jiwe hiz dikin.

Werin em tev bigirin destê hevûdû. Dest nedin destê bîyanîya. Bi rastî em in xwediyû dostê hevûdûne. Firsetê nedin wanê ku dubendiyê têxe navbera we û berê we bidin hevûdû...

Her wiha şîa û sunnî, selef û xelef, teriqet, cema'et, medrese û mekteb, sazîyû partiyên islamî! Hûn çi dixwazin ji hevûdû? Ma nebese êdî ev berberî? Gelo ka em ji kêre dixebitin. Weka Samirî her yek jime golikek kiriye qıble ji xwere. Golika hineka mezhebê wane, a hineka teriqeta wane, a hineka cema'eta wane, a hineka şêxê wane, serokê wane, partiya wane, 'eşira wane, qewmê wane, malê wane, meqamê wane û herwiha. Bi rastî di vê hengâme de muwehîd pur kêmin. Ji bona vêye çawa ji qewmê Mûsa re Xwedê got "nefsa xwe bikujin" bi vî halê ku em dijîn; ez bawer im ji me re jî dibê nefsa xwe bikujin. Lewra em tev nefsa hevûdûne û îro em hevûdû dikujin. Misilman li tevê welatên misilmana de xwûna hevûdû dirêjin sebeb eve.

Evê baş bizanin dijmintî û dijberiya me ji me ra faydê naîne. Tenê dijminên me jê sûd û istifade dikin. Ewjî me dixapînin. Ewên ku xurafeyên berya islamîyetê ji were dîn nîşan didin baweriyê li wan neênin. Baweriyê neênin li wan xelaskar û Kehremanên sexte.

Tenê xelaskarî di islamêde ye. Îzzet û şeref tenê ya Xwedê û ya Resûl û ya bawermendaye. Emanetê Xweda bin bimînin di xêr û xweşiyêde



DI PIRSGIRÊKA KURD DE JI HÊVIYA "ÇARESERİ" YÊ HETA HEYAMA PEVÇÛNÊ -2

✍ 'Ebdulqadir TÛRAN

1.2. Teşebbusên Çareseriyê yên Dewra Ak Partiyê

Hêzên Çekdar ên Artêşa Tirk, eşkere li hember îdara Sûriyê herb dianî rojevê. Ev jî bû sebeb ku Ebdullah Ocalan ji Sûriyê derkeve. Digel vê yekê, Ewropa jî li ber PKKê helwesta xwe nîşan dida û hinek fealiyetên wê yesax û qedexe dikirin. Ev yek nîşan dida ku ji bo orgutê dewreke zor dest pêdikir. Paşê serokê PKKê li tu welatî nedihat xwestin, hetta Îtalyaya ku Partiya Komonîst lê îktîdar bû bi xwe, li Ocalan xwedî dernediket, evana derdixist holê ku mêzîn guherîbûn. Di nav van şertan de Ocalan teslîmî Tirkiyeyê kirin. Di pêvajoya piştî vêya de, Ocalan ji tirsa îdambûnê, li gorî daxwaza rayedarên dewletê, emir da ku orgut vekişe dervê sînor û şer neyê kirin. Tirkiyeyê bi îdareyên Îran, Iraq û Sûriyê re têkiliyên qenc bipêş xistin û bi Yewnanistanê re çareseriyê anî rojevê, ev jî bûn sedema ku PKK stratejîya xwe biguherîne.

Bi hilbijartinên meclîsê yên 3ê Mijdara 2002an, Ak Partî bi tena serê xwe îdara welêt xist bin kontrola xwe. Di heyama ewil a îktîdara xwe de, enerjîya xwe ji bo baştirkirina şert û mercên jiyana xelkê serf kir. Di siyasetê de jî ğeyret kir ku li nav welêt rasterast neyê pêşberî mîhraqên wesayetê û li derveyê welêt jî hewla jibo endamtiya tam a Yekîtiya Ewrûpayê da. Lê di vê dewrê de di warê pirsgirêka Kurd de, di sewiya gotinê de be jî nîşana ewil a "Pêvajoya Çareseriyê" hat dayîn. Di 2005an de Serokwezîr Receb Teyyîb Erdoğan, di mîtînga Diyarbekirê de li pirsgirêka kurd xwedî derket û îşareta ku wê îrada "çareseriyê" nîşan bide da. Ev yek atmosfereke musbet pêk anî. Di pêkanîna vê yekê de, digel ku para îdealên "firehbûnê" yên ji bo pêşeroja Tirkiyeyê yên Ak Partiyê hebû, tesîra ku PKKê di sala 2004an de ji aliyê mîhraqên hêzdar ve, dîsa teşebbusî êrîşên çekdarî dikir jî hebû. Her wiha teşwîqên alîyên lîberal-çepgîr ên pevgirtiyên dewra ewil a îktîdara

www.ararat.org

Ak Partiyê ku nexasim li ser medyayê û ji aliyê îmaja li derveyê welêt bandoreke wan a mezin hebû jî zêde tesîr dikir.

Gava dem dibû 2009an, Ak Partî bi "Operasyonên Ergenekonê" li nav welêt digirt ser mîhraqên wesayetê. Di eynî wextê de alema ğerbê, jibona çavkaniyên enerjiyê yên wek gaza tebiî' bi ewle neqlî Ewropayê bibin, meyla ku PKK bêçekdar bibe dikir. Lewra dombûna êrîşên PKKê, wê emniyeta xeta borîyên enerjiyê yên di sehayên pevçûnê re derbas dibûn, têxista rîsk û talûkê.

Bi misaîdbûna konjoktura hundur û derveyê, Ak Partî ewilî bi navê "Vebûna Kurd" an jî "Vebûna demokratîk", paşê jî bi tesîra bertekên mîllîyetperwerî bi navê "Projeya Yekîtiya Mîllî û Biratiyê" hinek teşebbus rast kirin. Di sala 2013an de "pêvajoya çareseriyê" hat termînolojîkkirin. Gavên wek TVya Kurdî, dersa kurdî ya bijarte, guhertina di alfabeyê de, rakirina tetbîqatên wek sonda xwendekarên mekteba pêşîn hatin avêtin. Lê belê teşebbusên han, bi awayê wa'deyên kin û navîn û dirêj bi detay nehatin plankirin. Digel vêya tu ferqiyê nexistin navbera Pirsgirêka Kurd û bêçekdarkirina PKKê/tevlîkirina PKKê ya nav sîyasetê, li ser van xisûsiyetan pevre hatin sekinandin. Evana tev bûn sedema ku "**pêvajoya çareseriyê" seqet hat holê**. Hem hikûmet hem jî PKKê, heqên însanî yên sereke yên Kurdan, di destên xwe de rehîn hildan û ji hev re kirin mijara bazarîyê. Wekî din hikûmetê PKK wek tek temsîlkarê kurdan kire muxatab, lê orgutê ev yek bes qebûl nekir. Digel her tiştî PKKê, pêvajo wek gavên tasfiyekirina xwe dît, ne eşkere be jî bi desteka hevkariya Rûsya û Îranê û piştî 2010an jî bi desteka Îsraîlê di ber xwe da, li herêmê xebatên avakirina zemîna ku bibe hêzdarê serwer ê bêalternatîf pêk anîn. Di vî warî de, weka wê di beşên pêş de jî bi detay bên dîtin, hinek qezayên rê qewimîn/hatin qewimandin. Bi vî awayî tiştê ku Ak Partî ji bo "pêvajoya çareseriyê" difikirî, li gorî dixwest bi pêş neket.

2. "ALÎ Û AKTORÊN PÊVAJOYA ÇARESERÎYÊ"

2.1. Alîyên/Aktorên Eşkere û Veşartî Yên Pêvajoyê

Şayet bê qebûlkirin ku armanca esas a "pêvajoya çareseriyê" -ku beyanên alîyan di vî warî dene- tebiî' alîyek ê mûxataban û çareseriyê, divê dikaribe temamê xelkê kurd temsîl bike. Lê hikûmetê ji dewra ku pêvajoya çareseriyê daye destpêkirin ve, ev xisûsiyet ciddî îhmal kiriye. Pirsgirêka kurd, tenê daxin sewiya mesela asayîşê, yekser pê xwe ji bin bar didin alî. Bêşek pirsgirêka kurd bi ser PKKê ve, zemîneke pevçûnê û ji lew a ewlehiyê peyde kiriye. Di vî warî de divê tebiî' muxatab PKK be. Feqet heqên esasî yên kurdan, endeksî sîleha PKKê kirin, ev jî pirsgirêk, ji çareseriyê zêdetir, mesele bêtir tevlîhev kiriye.

Eger formata îdeal a meşandina "pêvajoya çareseriyê" li hêlekê bê hiştin, di dewrên borî de alîyekî pêvajoyê, di meqamê dewletê û şexsê Receb Teyyîb Erdoğan de, îktîdara Ak Partîyê ye. Alîyê din yê pêvajoyê jî PKK û şebekeyên wê ne. Jibo peyva "şebekeyên wê" gelek sebebên muhîm hene. Lewra îktîdara Ak Partiyê, di serokatiya Erdoğan de yekwicûd xuyaye, lê alîyê PKKê -hinek taktîkên bizanebûn bin jî- carna hevûdû derewçî dikin. PKKê, ji ber ku lîderê orgutê ye, Ocalan wek alîyekî pêvajoyê yê asayî qebûl kir, lê dewletê xwest ku Ocalan ne wek aliyekî duyem, wek mûxatabê 'esil û tenê hilde. Dewletê bawer dikir ku tesîra Ocalan li ser orgutê xurte, ji lew dixwest Ocalan kontrol bike û pêvajoyê bimeşîne. Lê li dijî vêya PKKê metoda "kaosa bikontrol" şuxuland, dest bi êrîşên bitesîr kir û bi "înîsîyatîfa yekîneyên herêmî", hewla ku Ocalan ne hakimê hedîseyane da. Orgut ne orguta 15 sal berê bû û di nav de destê Emerîka, Almanya û Îranê hebû, jibo peydekirina endam û mensûban, tu zehmetî nedidît û bûbû ku kengî bihata xwestin, ew wek sîleheke konvansiyonel dihate bikaranîn. Gaziyên Ocalan ên di Newrozê de, bi tiştekî nehatin hesibandin, dewletê nexwest ku pozîsyona Ocalan êdî bê niqaşkirin. Îcar qirar da ku seha BDP (Partiya Aştî û Demokrasiyê)/HDPê (Partiya Demokratîk a Gelan) bê firehtirkirin û di warê mûxatabiyetê de bibe aktorek. Lê vê xisûsiyetê, hinek meseleyên nû pêk anîn. Lewra mîhraqên hêzê yên navneteweyî ku bi ser HDPê re teşebbusî dîzaynkirina siyaseta hundur a Tirkiyeyê dikirin, rê li ber vekirin ku Ak Partî, bi awayê sînorên tesewwira HDPya bûye Tirkiyeyî derbas bike, têxin sehayê.

Ji lew di heqê Selahattîn Demîrtaşê hevserokê HDPê de, gotinên Bulent Arinçê alîkarê serokwezîr, meriv difikirîne: "Ev çil sale ez siyasetmedarim. Ez dizanim ku kî projeye yan na." Bi vî awayî di rastî de eşkere dibû ku alîyên pêvajoyê, ji awayê xuya dikin ne îbaretin, li ser maseyê hêlên dizî hene. Di hevdîtinên Osloyê de, hebûna "welatekî ecnebî ya navbeynkar" jî îşaretî bal vê rewşê dikir. Her wiha hêla PKKê, jibo kontrolkirina agirbestîyê, bi israr dixwest ku "çavdêrê navneteweyî" hebe, ev jî di vî warî de "enflasyona terefan" nîşan dide.

www.rojavakurd.org

SELAM Û QÎYMETÊ SELAMÊ

✍ M. Mehmûd TIBYATÎ

Selam: zikrê xweda ye. Selam ji 99 navê xweda naveki wî ye. Bi ma'na : ewê ku ji 'eyba, ji kêmasîya, ji qusura, ji fenabunê, ji zewalê 'arî ye. Ewê serkanîya xilasî û xêr û xweşîyê ye. Ewê, go buxwaze wan derdixe selamet û xweşîyê.

Aştî, rihetî, evîn, huzûr û xweşi ye… Selam kilîteke, derîyê dilê mü'mina vedike.

Selam bêjêyek e, dema mirov leqayî hevdû dibin muhibantîya nêzîkî di nabêna xwe de bikar tînin. Şiteğalîyek hurmetê îfade dike. Sunnetek ji bavê me Adem ('a.s.) maye û gihaşte hetanî roja me. Nişanê muhibantiya di nabêna mirovên Musluman de bikar tîne selam.

Selam digel Sünnet e yadîgarek ji Adem ('a.s.) ji me re maye. Di civaka Îslamê de qîymetekî wê yî herî girîng heye. Sunnetek pêxemberî herî bi rewş e. Belkî di dirêjîya 'emrê xwe de sunneta herî pir mirovên musluman bikar tînin selam e.

Li gor hedîsek ji Ebû Hureyre hatiye neqil kirin Pêğemberê me (s.a.w) wiha dibêje: ***"Dema xweda bavê me Adem ('a.s.) xuluqand jê re got: Here selamê li van melekê runiştî bike. Û piştre bala xwe bide wan bê selama te çawa vedgerînin, lewra selama te û yan zarokê te jî dê ev be."*** **Adem (as) çu cem meleka û go: Esselamu 'eleykum. Meleka gotin: Esselamü 'eleyke we rehmetullah; bi selama Adem (as) ve "we rehmetullah" zeliqandin." –Buxarî, Enbîya: İstîzan: 1 Muslim, cennet:28-**

Di warê selamê de Xweda di Qur'ana pîroz di sûretê Maîde de wiha ferman dike: **"Dema bi Selamekê hûn hatine selamdan, hûn jî ji wêna qenctir bi selamekê Selam bikin. Ya jî bi selameke weke wê bersivê bidin. Bê gûman xweda hesabê hemî tiştî dipirse." -Maîde: 86-**

Mufessirê Qur'anê di derbarê vê ayetê de wiha dibêjin: Ayet emre me dike; dema mirovek raserî komekê yan jî însanekî bibe pêvist e bibêje **"Esselamu 'eleykum".** Mirovên muxetebî vê selamê dibe lazim e bibêje: "**We 'eleykumusselam** Yanjî bibêje: **We 'eleykumusselam we rehmetullahî we berekatuh.**" Belê kesên wiha selamê bide, hezkirin û hûrmeta xwe şanû dide û kesên bi selameke hê xweşiktir jî Selamê vegerîne ew jî dilnizmî û hilma xwe pêşkêşî mirovên hember xwe dike.

Dîroka selamê gelek kevn e. Berya pêxemberê me jî Selam hebû. Di jîna pêxemberê berya wî de jî em selamê dibînin: **"Xeberê mêvanê Îbrahîm ê bi rûmet ji te re hat? Di bîra xwe bîne dema ew derbasî huzûra Îbrahîm bibûn û jê re gotin Selam ji te re be. Îbrahîm jî got ji we re jî Selam." -Zariyat: 24-25-**

Adabê dan û sitendina Selamê hene: **"Kesê suwar li yên peya, Kesên dimeşe li yên rûniştî, civatê hindik li yên pir lazim e selamê bidin" –Buharî; Îstîzan: 4,5,6. Müslim selam: c. 1 s. 2160**

Dema mirov here civatekê û ji wê civatê were lazim e meriv selamê bide. Heger ji civatê yek bi tenê jî bersiva selama meriv bide mesûlîyet ji ser temama radibe. Bes heger Kesek bersiva selama meriv nede kesê di hundir wê civatê de tev günehkar dibin.

Selama li mirovên mezin nîşana hürmetê û ya li zaroka jî nîşana tewadu'ê ye. Ji Eshabê Pêxember (s) Enesê Kurê malik dema leqayî zaroka dibû Selam li wan dikir. Jê re gotin; "tu çima selamê li zaroka dikî?" Hz. Enes got: "Lewra min dît Resûlê xweda dema leqayî zarokê biçûk dibû bê Selam di ser



www.arsivakurdi.org

www.bangaheq.com

wan re derbas nedibû. Belê Resûlê xweda bi vî hawî zarok hînî dan û sitendina Selamê dikir.

"Dema hûn daxilî hundirê mala bûn, bi hêvîya jînek feyizdar ji ba xweda, selamê li hev bikin. Ha vaye xweda ayetê xwe ji we re wuha vedike, hêvî heye hûn 'aqil bikin." -Nûr:61-

Dema mumin herin cennetê wê leqayî selamê bibin û li cennetê jî xwe bi xwe dê selamê li hev bikin Rojekê mirovek diçe ba pêxember (s) û dibêje "Esselamû 'eleykum" û rûdinê. Resûlê xweda (s) dibêje wî; te 10 xêr qezenc kir.

Piştre yekî din tê dibêje: Esselamû 'eleyküm we rehmetûllah. Resûlê xweda dibêje wî; Te 20 xêr qezenc kir.

Piştre yekî din tê û dibêje: Esselamû 'eleykûm we rehmetûllahî we berekatûh.

Resûlê xweda dibêje wî: Te 30 xêr qezenc kir. **-Riyadussalîhîn: 852. Hedîs-**

Resûlê xweda (s) dibêje: ***"Her kî berya selamê bişteğile bersivê nedne wî" -Ebu Naim, Muxtarul hedîs-***

Di gelek ciha de meriv selamê bide mekruh e. Dema mirovek xwarinê duxe, Qur'anê dixûne, li xutbê guhdar dike, nimêj dike, li taharetê be, di himamê de be lazim e meriv selamê lê neke. Dîsa kesê meriv zanibe gunehê kebair (mezin) dike meriv selamê lê neke qenctir e.

Hedis: "Di nava însana de însanê herî 'aciz, ewê ku du'a nake û yên herî çukus jî ewê ku selamê nade." –Teberanî-

"Bi wechê bi ken meriv selamê li însana bike herwekî meriv sedeqe bide."

Di jîna rojê de dan û sitendina selamê gelek hêjaye. Bo têkiliya meriv bi însana re zede bibe lazim e bi selamê asasê muhibbantiyê bê avêtin. Lewra Selam hezkirina nabêna însana zêde dike, biratîyê dijdîne. Ji ber vê Resûlê xweda dema mafê biratîya muslumanay li ser hev rêz dike selamê jî zikir dike.

"Ebu Hureyre dibêje: Resûlê xweda (s) wiha gotiye: "Hetanî hûn îmanê neynin hûn naçine cennetê, û hetanî hûn ji hevdû hez nekin hûn Îmanê naynin. Ez tiştekî ji we re bibêjim ku hûn vêna di nabêna xwe de bikar bînin wê hezkirin têkeve nabêna we: Di nabêna xwe de xwe bi xwe selamê zêde bikin." –Muslim, Îman: 93; Ebu Dawûd Edeb: 131-

Ey Gelî Xorta!

✍ Ebûzer BAYRAM

Ey gelî xorta,
Werin em rûnên
Ji wer çend peyv bikim
Win baş guh bidinê

Min go li dinyayê
Gelek 'eşq hene
'Eşqe herî bi xer
Ji wer bêjim çiye

'Eşqa ewwilî
'Eşqa Xweda ye
Di pey 'eşqa Xweda
Ya Resûlulla ye

Ji bilî van 'eşqa
'Eşqên mecazî ne
Xapînok in
Qêrînê wan in

Ji mer dikin gazî
Ey birayê min
Win guh qet nedinê
Tim şiyar bin

Qet ğafil nebin
Van 'eşqê mecazî
Me dibin cehnemê



www.arsivakurdi.org

LI KURDİSTANÊ SELAT U TEKBİR

✍ Şerîf EMÎN

Milletê Kurd, daîma evîndarê İslamê bû. Kurdistan jî her daîm buye warê selat û tekbîran. Di vî warî de delîl u mînak dîroka Kurd u Kurdistan e. Lê belê sed sal e ku Rejma Kemalîst di çar hawêrê Kurdistanê de, bi awayek sistematik dixwaze ku nesleke sekuler derxe holê. Bi rastî Kemalizm di vî warî de qismen bi ser ket. Hem Kurdista ji dîn dûr xist hem jî nesleke sekuler derxist holê.

Kurdistan sed sal berê bi dîn u diyanet bû. Bi şêx û mela, bi feqî û medrese u mizgefta dihat naskirin. Ehlê Xaç u Seneman nexasim jî Kemalîsta Gelê Kurd bi destê zorê tebdîl kirin, tenkîl kirin. Da ku Kurd ji dîrok, ziman û jîyana bav u kalê xwe re xerîb bibin. Lewma bê 'hed dek û dolab li serê Kurdan gerandin.

Rewşa Dîroka Kurda: Piştî Osmanîyan dewletên emperyalist nexasim İngîlîzên dolabger, li ser milletê Kurd û axa wan, gelek hesabên giring kirin. Hesaba herî mezin, nîfaq u perçekirina İmperetora Osmanî bu. Emeryalîstên 'xerbî ewil di şexsê Şerîf Huseyn de qaşo teklîfa dewlet u azadîyê li Kurda kirin. Lê belê Gelê Kurd di şexsê Şêx Mehmud Berzencî de yekîtîya ummetê u payîdarbuna Osmanîyan xwest. Gelê Kurd ji bo selameta meqamê xelîfet û dînê İslam, îteata hukumata Stenbolê kirin. Malbata Berzencî u Gelê Kurd bo van fî'l u daxwezîyan di nezera emperyalîstan de hatin me'hkûmkirin. Hê ji vê jî bêtir mexdûr bun. Cî u warê bav u kalan ji teref emperyalîstan ve hat talankirin.

Serhildan û qiyamên Kurdistane 'heta sala 1980 bi temamî **li gor şerîetê** hatine holê. Qadî Muhemmmed di çilê 1946ê miladî de Cumhurîyeta Mehabâdê li ser qanuna İslamî avakirîye. Şêx E'hmed û birayê wî Mele Mistefa Berzanî jî tekoşîna xwe li gorî hukmê Kur'anê domandine. Piştî van tevger u hereketa Seîdê Kurdî bi qelema xwe, Şêx Seîd Palewî jî bi şurê xwe li hember sîstema laîq ji bo ehkamên İslamê mucadele kirine.

Heta van salên nêzîk li Kurdistanê dengê biratîya İslamê, dengê selat û tekbîran tucar kêm nebûye. İtîraz û dijberîya gellê mezlûm bi tenê ji bo mexdurîyeta dîn u mehkûmkirina mezlûman peyda bûye.

Wek mînak li Tirkiyê şehîdên ummet û tew'hîdê herî zêde ji Şerqê derketine. **Se'îdeyn**, Metîn Yukselê kurê Mele Sedreddîn(1979), Sedat Yenîgün (1980) Şêxmus Durgun (1985) ji wanin. Ji sala 1980 şundatir gelek şehîdên Mustezef u Evindarên Peyxember, bı hezaran mehkum u girtîyên Hîzbullahî ji dîsa neferê İslam u ummetê ne. Kurdistan her daîm warê şehîdan bû. Gelo çima anha dengê "selat u tekbîran" ji dengê "Faşîst, Kemalîst u Sosyalîstan" bilindtir naye guhê me? Çima îro dengê kufr u zulmê, dengê lâdînî û fuhşîyatê bilindtir tê?

Belê raste dengê tekbîran, tefekkura İslamî dîsa heye. Lê belê bi gotina Mewlane Celaleddînê Rûmî;

"Sirr-î men ez nale-î men dûr nîst/ Lîk çeşm u gûş ra an nûr nîst" Em jî wek Mewlana dibêjin; "Sirrê min ji nalîna min dûr nîne./ Lê belê ji her çav u guh re fêmkirina sirra min nesîb nîne!" Em baş dizanin ku îro di nav ummetê de gelek camî'a û kesan Gelê Kurd bê mehkeme înfaz kirine. Ev bê însaf li ser biratî û 'effwa biratîyê tucar nafikirin. Di nezera wan de Gelê Kurd bi temamî faşîst u terorîst in.

Musebbîbê vî 'halê Kurda bi giştî Rejma Kemalîst bi xwe ye. Kêm be jî para birayên meyê Musulman jî tê de heye. Birayên meyê Tırk û dîgeran şert û şurtên kurdıstanê, agir u cehennema wî welati nedîtin. Xebata kufrê, zulma şedid, lêdan, heps u zindan, bi hezaran failê meçhul jî tu carî neket rojeva wan. Nalîna helbestên Kurdistanê hilkişiya asîmana lê neçû guhê musluma.

"Serê çîyan girtî mij u dumane kekê min
Serê çîyan girtî berf u barane bavê min
Ferman rakirine ser me her çar bırane kekê min/Bavê mın"
(Fermana Kekî Axa-Dersim)

"Rebbîyo ti hilneynî
Meriv xirab bike şêst u şeş gundê Gelîyê Zîlan'e
Malan xırabe bike bêlînî ser pagane
Zarokan bıkuje heta berê di dîyane.."(Qetlîama Zîlan)

Edebîyata Kurdan ekser ji van helbest u kilaman hetîye wicûdê. Gelo ev nalin u qêrîn bo çi bûn. Bo çi ev milletê bêkes feryad dikir. Kê ev gell ker u gêj kır. Çima kesî dengê xwe li hember vê zulmê der nedianî. Em gilî û gazine xwe ji zalim û ehlê kufrê nakin. Lewra ew wezîfa xwe pêk tînin. Gili û gazinê me ji kesê Musulman u Ummetê re ye. Bırayên meyê dîndar u wefakar çi alîkarî kirin. Gelo bi heqî şahidiya xwe bikar anîn an na. Gelo birayên me yên Musluman kêjan zalim u zordar telîn kirin…? Di dîroka nêzîkde pel u qanad neman em dinêrin tu tiştek tunne!

www.aisiyakurd.org

www.baigalicq.com

Birati u hevaltî wisa nabe.
Walle nabe, Bîlleh nabe, şer giran e bilind nabe..! Daxwaziya Xuda ev e: Ewê çê bibe, baş bibe, aşitî, biratî u civandina Ummetê ewê bîna bibe. Lê belê bi xew û xewarîyê, ev nîfaq u tefrîqe tucarî ranabe.
Rejima Kemalîst 80-90 sal e ku li ser însanên Kurd, projeyek 'xeyrî însanî û İslamî bi cebir bikar tîne. Ev projeya zulumkar li ber çavê ummetê pêk tê. Ev proje jî înkar û asimilasyona Kurda ye. Damezrînerên Rejma Kemalîst ewwil neseba Kurdan înkar kirin. Piştre zimanê wan qedexe kirin. Hê ev ne bes bû şêx û melayên wan îdam kirin. Yên ku ji îdamê xelas bûn jî yan hatin sirgûnkirin yan jî ketin hebsê. Zalim û zordarên serdest a'xa, beg, xanedan u zanayên Kurd û Kurdistanê qut kirin. Gel, bê sorok, bê xanedan, bê şêx u mela û seydâ hiştin, ji îlîm û îrfan dur xistin. Zalim û zordara zanîna dîn û îman, qeyde û tore rakirin, gel perişan û cahil hiştin. Milletê mustaz'af, bê serî û serwer ma. Li Kurdistanê îş û karê millet ji însafa rejma Kamalîst re ma..
Kemalîzmê ji xebata pêşesazî, avayî u aborî zêdetir xebata "fikrê Xerbîyan, ladînî u fuhşîyatê kir. Nesla Kurda a mazîyê, nesla dewra Osmanîyan bû. Ev nesl jî ehlê nimêj, ehlê selat û tekbîran, ehlê biratî, ehlê yekîtî û aşîtîyê bû. Bo wê nesla pak; derê hec u îltîcayê Qur'ana Kerîm, rehber jî Hezretê Muhemmed bu. Jîyan, cîhad u îman bû. Meqsud yekîtî, biratî u wefakarî bu. Kemalîzm û faşîzma dewletê ji temamî van tiştan re neyartî kir. Hiş û eql di serê Tirka de, .îlxas jî di serê Kurdan nehişt. Jîyana Xaçperest u Xerbzadean bi temamî zulm, eyb û şerm bû. Evana li Kurdistanê weledek ecêb peyda kirin. Ev weled tuccarî wek bapîr u dapîra xwe nebû. 'Eleqa wî tuccarî bi dîrok û en'eneyê Kurd u Kurdîstanê re tune bû. Bavê vî weledî, Kemalîzm diya wî Faşîzm û Xudanenasîya Xerbî bû. Ev weled bi qezî gotin, xwarin, vexwarin, çek û rextê xwe, ken u gîrîn, yar u neyarên xwe û… hwd bi temamî mîna Ewrupa û karkerê 'xerbê bû
Hasilê kelam: Tirkîya li ezman gerî, Xudâyê Alem li erdê da. HDPKK, DHKPC, TKP zihura Faşîzma Tırk u Kurd bi temamî qezenc u hasilata Kemalîzmê bûn. Ev hereketên 'xeyrîîslamî tev karkerên "pul u peran bûn ku Milletê Kurd bi îmkanê xwe yên qit dît û dest bi xizmeta dîn u îman kir. Alîkarîya biratîya İslamî kir.
Ji sala 1980 şundatir, hereketa fitne û fesadîyê, li ser Kurdistanê şedît bu. Li alîyek Partîya Karkerên Kurdîstan, li alîyê dî jî Rejma Kemalîst, red û înkara "mezheb, qewm, dîn û dîndara kirin. Nexasim dewletê li ser Kurdistanê zulm u zordestîya xwe şedît kir.
Gotîna Heqq eve ku zulm û zordestîya dewletê bû sebebê zihûra "Karkerên Kurdistanê!" Kemalîzmê li gorî mîllet, rejim nexwest li gorî rejma xwe mîllet xwest. Polîtîqayên kemalîzîmê bûn sebebê peydabûna PKKê. Lewra zevîya zulma Kemalîzmê ji bô şînbûna 'hereketek wek PKKê zemînê herî musa'ît bû. Ev helbest herî betir li kirasê polîtîqayên Kemalîsta tê:

"Lo me çikir me çikir
Me xwelî li serê xwe kir,
Ma ne şerm u fedî ye?
Ev doza me bo çîye?" (Şivao)

Zanîn eve ku dewleta laîk bi destê xwe, xwelî li serê xwe kir û mala xwe bi destê xwe bi xwe xirab kir."Digel fitne û fesadiya dualî jî li Kurdistanê dengê selat u tekbîra kêm nebu. Kesên mustez'ef û evîndarên peyxember li Kurdistanê Ala İslamê bilind kirin. Xebata Selahaddîn Eyyubî, eşqa Seîdeyn dîsa li Kurdistanê şax veda. Lê belê kes di hewara Mustez'efan de nehat. Muslimanê Kurdistanê, nexasim yên Bakur li Tirkiyê e'xleb bi destê birayên xwe hatin mehkum kirin û înfaz kirin. Muslimanan guh nedan birayên xwe yên musluman. Xeberên fasiqa bêtir li xweşa wan çû. Lewma zulma dualîya li ser dîndarên Kurdistanê wek tiştek tabi'î hat qebûlkirin. Kesî dengê xwe ji muhaceret, ûnfaz û mehkûmkirina muslumanan re dernexisit.



www.arsivakurdi.org

بِمَشَه اَمْ هَرِنْ نِيچِيرَا مَاسِيَا، كِي ژِمَه بِيتِرْ مَاسِيَا بِگْرَه اَوْ لِسَرْ حَقِيِى يَه. خِزَانْ گُوتْ: بِرَايِ مِنْ! دُنْيَا نَه دِوِى قِيمَتِى دَه يَه كُو خُدَا ژِقَنْجَارَه بِكَه بَخْشِيشْ (مُكَافَاتْ)، ژِكَافِرَا رَه ژِي بِكَه جَزَا. دَوْلَمَنْدْ وِي دِدَه زُوْرِىْ بِخَوه رَه دَرْدِخَه. خُدَا وَانْ اِمْتِحَانْ دِكَه. كَافِرْ دَسْتْ بِيدِكَه تُورَا خَوه دَاقِيژَه، نَاقِ پُوتِ خَوه دِبِيژَه، دَاقِيژَه نَاقْ مَاسِيَا، تُورَا وِي تِژَه دِبَه دِسَرْ دَاقِيژَه. مُؤْمِنْ دَسْتْ بِيدَكَه دَاقِيژَه، نَاقِ خُدَا دِبِيژَه، خُيَا دِبَه كُو تِشْتِكْ دِتُورَا وِي دَه تُنَه. كَافِرْ دِبِيژَه: چَوَا دِبِينِي! نَصِيبِ مِنِي دِدُنْيَايِ دَه وْ جِهِ مِنُ و زِلَامِينْ مِنْ ژِاِى تَه بِيهْتِرِنْ، وُسَا دِاْخِرَتِى دَه ژِي اَزِى ژِتَه چِيتِرْ بِمْ، اَگَرْ بَرَّا اْخِرَتْ هَبَه، لِگُورْ گُوتِنَا تَه. قِيرِينْ ژِمِلْيَاكَتِ وَانْ دِچَه، اَوْ مِلْيَاكَتْ وَكِيلِ هَرْدُوَا بُو. خُدِى تَعَالَى اَمْرِي جِبْرِيلْ كِرْ كُو وِي مِلْيَاكَتِي بِبَه بِبَالْ جَنَّتَا قَه جِهِينْ كُو مُؤْمِنْ بِكَفِى نِيشَانِي وِي بِدَه. دَمَا كُو مِلْيَاكَتْ دِيتْ خُدَا چِه اَمَادَه كِرِيَه ژِمُؤْمِنْ رَه گُوتْ: اَزْ بِعِزَّتَا تَه صُونْدْ دِخُومْ پِشْتِي كُو جِهِ مُؤْمِنْ اَقْ بَه لِدُنْيَا بِى تِشْتِى كُو هَاتِيَه سَرِ وِي ظِرَارْ نَادِى. جِبْرِيلْ جِهِينْ كُو كَافِرْ بِكَفِى دِجَهْنَمِى دَه نِيشَانِي وِي دَا گُوتْ: اَزْ بِعِزَّتَا تَه صُونْدْ دِخُومْ پِشْتِي كُو جِهِ كَافِرْ اَقْبَه تِشْتِى كُو لِدُنْيَا بِى بُو يَه پَارَا وِي تُو مَنْفَعَتْ نَادِى. پَاشِى خُدَا مُؤْمِنْ دِمْرِينَه وْ كَافِرْ بِعَذَابَه كِي لِجَمْ خَوه هَلَاكْ دِكَه. دَمَا مُؤْمِنْ جِهِ خَوه دِجَنَّتِى دَه دِگْرَه وْ تِشْتِى كُو خُدَا ژِيرَه حَاظِرْ كِرِيَه دِبِينَه اُو اَوْ هَقَالِينْ خَوه تِينُ و ژِهَقْ دِپِرْسِنْ ﴿اِنِّي كَانَ لِي قَرِينٌ﴾ ﴿يَقُولُ اَئِنَّكَ لَمِنَ الْمُصَدِّقِينَ﴾ گَازِيكَرْ كِي گَازِي دِكَه: هُونْ بِسَرْ جِهِ هَقَالِ خَوه قَه بُونْ؟ بِسَرْ قَه دِبَه وِي دِنَاقَا جَهْنَمِى دَه دِبِينَه.

﴿وَاضْرِبْ لَهُمْ مَثَلًا رَجُلَيْنِ﴾ يَا مُحَمَّدْ وَانْ مُشْرِكِى كُو ژِتَه دِخوَازِنْ تُو بِقَورِينِي وَانْ كَسِينْ كُو ژِرَبِّ خَورَه دُعَا دِكِنُ و بِشَفُ و بِرُو رِظَا وِي دِخوَازِنْ، ژِوَانْ رَه حِكَايَتْ بِكَه مَثَلَا دُو زِلَامَا ﴿جَعَلْنَا لِأَحَدِهِمَا جَنَّتَيْنِ مِنْ اَعْنَابٍ﴾ ژِيَكِي ژِوَانْ رَه مَه دُو حَبْ بَغْچَه ژِتِرِي اَقَا كِرِبُو ﴿وَحَفَفْنَا هُمَا بِنَخْلٍ﴾ مَه هَاوِيرْدُورِ وَانْ بِدَارِينْ خُرْمَا گِرْتِبُو ﴿وَجَعَلْنَا بَيْنَهُمَا زَرْعًا﴾ مَه دِنَاقْ وَانْ دَه چَانْدِنِي بِجِي كِرِبُو هَرْ يَكْ ژِوَانْ دَارَا وْ چَانْدِنِيَا بِفِيكِي بُونْ وِى هِى خَوشِكْ بُبُونَانْ ﴿كِلْتَا الْجَنَّتَيْنِ اٰتَتْ اُكُلَهَا﴾ هَرْيَكْ ژِوَانْ بَغْچَا فِيكِيِينْ خَويْ تِرِي وْ خُرْمِينْ خَوه وْ ژِچَانْدِنِى خَوه دِدَا ﴿وَلَمْ تَظْلِمْ مِنْهُ شَيْئًا﴾ وَانْ بَغْچَا ژِخوَارِنِى تِشْكِي كِيْمْ نَدِكِرِنْ، بَلْكِي بِتَمَامِي دِدَانْ ﴿وَفَجَّرْنَا خِلَالَهُمَا نَهَرًا﴾ مَه دِنَاقْ وَانْ بَغْچَه يَا وْ دَارَا دَه چَمْ هَرِكَانْدْ، چَمْ پِيلَا لِخَوه دِخِسْتْ، چَمْ دِنَاقْ وَانْ دَه لِقِيَالِي وِيَالِي بَلَا دِبُو ﴿وَكَانَ لَهُ ثَمَرٌ﴾ فِيكِي وِي هَبُونْ؛ لَوْرَا بِمَعْنَا كُو پُرْبُونْ ﴿فَقَالَ لِصَاحِبِهِ وَهُوَ يُحَاوِرُهُ﴾ بِهَقَالِ خَوه رَه مِژُولْ دِبُو خَبَرْ دِدَا، پِيرَه لَجْ دِكِرْ، جَوَابَا وِي دِدَاوْ خَبَرْدَانَا وِي لِى دِزْقِرَانْدْ اُو دِگُوتْ ﴿اَنَا اَعَزُّ مِنْكَ مَالًا وَاَعَزُّ نَفَرًا﴾ بِمَالِ خَوه وْ بِزِلَامِينْ خَوه ، بِخِزْمَتْكَارِ خَوه وْ زَارُوِينْ خَوه اَزْ ژِتَه لِپِيشْتِرِمْ وُ بِلِنْدِترِمْ ﴿وَدَخَلَ جَنَّتَهُ﴾ بِدَسْتِ بِرَاكِ خَوه دِگِرْتْ، دِكَتْ بَغْچِ خَوه، وِي لِدَرُو دُورَا دِگَرَانْدُ و نِيشَانِي وِي دِدَا ﴿وَهُوَ ظَالِمٌ لِنَفْسِهِ﴾ تَعْدِى لِنَفْسَا خَوه دِكِرْ، اِنْكَارَا رَابُونَا پِشْتِي مِرِنِى دِكِرْ، دِقِيَامَتِى دَه شُبْهَه دِكِرْ، ڤَگَرَا بَالْ خُدَا قَه ژِبِيرْ كِرِبُو، بِقِي هَاوِي غَظَبَا خُدَا وْ

www.bangaheq.com
www.arsivakurdi.org



قِصَّتَا دُو زِلَامَا: يَكْ مُؤْمِنُ و يَكْ كَافِرْ

محمد مهدی حلمي ✍

اَيَتِين 23 حَتي 44 ژ سُورَتِی كَهفْ دِدَرْحَقِ هَمِي اِنْسَانِينْ مُؤْمِنُ و هَمِي اِنْسَانِينْ كَافِرْ دَه نَازِلْ بُونَه، خُدَی تَعَالَی دُرُوِيِی اِنْسَانِی مُؤْمِنُ و اِنْسَانِی كَافِرْ دِكَه بِدُو اِنْسَانِی ژِبَنِي اِسْرَائِيلِيَا كُو يَكْ مُؤْمِنْ بُو اُو يَكْ كَافِرْ بُو. نَاقِ كَسِی مُؤْمِنْ يَهُوذَا وْ نَاقِ اَوِی كَافِرْ قَرْطُوشْ بُو، هَرْدُو هَمْپَارِهَقْ بُونْ، پَاشِی مَالْ پَارِی كِرِنْ، ژِهَرْ يَكِي ژِوَانْ رَه سِی حَزَارْ دِينَارْ كَتْ. اَوِی مُؤْمِنْ بِحَزَارِي كُولَه كِرِي، وَانْ اَزَادْ كِرْ، بِحَزَارِی دُدُوَا كِنْجْ كِرِي، جِلَا لِتَعْزِيَا كِرْ، بِحَزَارِ سِسِيَا خَوارِنْ كِرِي وْ خَوارِنْ دَا بِرْچِيَا، هَمْ مِزْگَفْتَا لِيكِرْ، اُو كَارِ خِيرِی كِرْ. اَمَا اَقِی دِنْ بِمَالِ خَوه پِيرَكِی دَوْلَمَنْدْ لِخَوه مَارْ كِرْ، حَيْوَانِينْ سُوَارْهَاتِنِی وْ دَوَارَا كِرِي، لِبَنْدَه زَاِينَا وَانْ مَا، حَتَا كُو پُرْ بُونْ. بِدِينَارِينْ مَايِي ژِي بَازِرْگَانِي (تِجَارَتْ) كِرْ، كَارْ كِرْ، حَتَا كُو اَهْلِ زَمَانِ خَوه دَرْبَاسْ كِرُ و دَوْلَمَنْدْتِرْ بُو. اِی اَوْلْ خِزَانِي لِی چِيبُو، بَلَنْگَازْ كَتْ. خَوسْتْ كُو دِبَغْچَه كِي دَه بِخَبِتَه، گُوتْ: اَگَرْ اَزْ هَرِمْ بَا هَمْپَارِ خَوه، هَقَالِ خَوه، اَزْ بِخَوازِمْ دِبَغْچِ خَوه دَه مِنْ بِخَبِتِينَه، هِيقِي هَيَه كُو قِيَا ژِمِنْ رَه بِكِيرْتِرْ بَه. هِنْگِي كُو دَرْگَهْقَانْ پُرْ بُونْ نِكَارِبُو بِگْهِيژِی. پِشْتِي كُو كَتْ هُنْدُرْ هَقَالِ وِي وِي نَاسْ كِرُ و اِحْتِيَاجِيَا وِي پُرْسكِرْ. دَوْلَمَنْدْ ژِيرَه گُوتْ: قی مِنْ مَالْ بِتَرَه پَارِ نَكِرِبُو؟ تَه چِكِرْ ژِمَالِ خَوه؟ خِزَانْ گُوتْ: مِنْ بِوِي مَالِي ژِخُدِی تَعَالَی وِي تِشْتِی بِخِيرْتِرُ و بِدَوَامْتِرْ كِرِي. دَوْلَمَنْدْ گُوتْ: بَرَّا، تُو رَاسْتْ دِبِيژِي؟ اَزْ بَاوَرْ نَاكِمْ كُو قِيَامَتْ رَابَه! هَمَا اَزْ دِبِيژِمْ تُو مَرِفِكْ فِيمْكُورِي (بِي هَشِي). جَزَايِ تَه لِبَامِنْ لِسَرْ قِی بِي هَشِيَا تَه اَنْجَاغْ كُو نَبُونِي (بِبَارِي) يَه، مَا تُو نَابِينِي مِنْ بِمَالِ خَوه چِكِرْ، حَتَا كُو اَزْ گَرِيَامْ تِشْتِی كُو تُو دِبِينِي ژِثَرْوَتِی وْ ژِحَالْ خَوشِيِی؛ اَقْيَا ژِي بِسَبَبْ كُو مِنْ كَارْ كِرْ، تَه بِيهِشِي كِرْ، دَرِی ژِبَا مِنْ، وَالله اَزْ تِشْتِكِي نَادِمْ تَه.

پَاشِی دَوْلَمَنْدْ دِبِيژَه: تُو ژِاِلهِ اُسِمَانَا رَه عِبَادَتْ دِكِي، اَزْ ژِي اَنْجَاغْ ژِيُوتَا رَه عِبَادَتْ دِكِمْ. هَقَالِ وِي گُوتْ: وَالله اَزِی شِيرَتَا لِی بِكِمْ. وَعْظَا لِی كِرُ و دِبِيرَا وِي اَنِي وْ وِي تِرْسَانْدْ. دَوْلَمَنْدْ گُوتْ:

www.arsivakurdi.org

دِبِژَه: "اَسْلَمَ عبدْي" عَبْدِ مِنْ ژِاَحْكَامِ اُلُوهِيَتِى رَه خَوارْ بُو وْ اِخْلَاصْ كَسْبْ كِرْ، "وَاسْتَسْلَمَ" دِخَوارْ بُونِى دَه ژِخُدَا رَه بِيِيشْ قَه چُو.

طِيبِي گُوتِيَه يَانِي تَمَامِ تِشْتِى كَائِنَاتِى تَسْلِيمِي خُدَا كِرُ و نَفْسَا خَوه ژِي ژِخُدَا رَه خَوارْ كِرُ و دِينْ خَالِصْ گَرَانْدْ ژِخُدارَه ﴿اِنْ تَرَنِ اَنَا اَقَلَّ مِنْكَ مَالًا وَوَلَدًا﴾ اَگَرْ تُو مِنْ دِبِينِي مَالُ و زَارُو وِى مِنْ ژِاِى تَه كِيمْتِرِنْ ﴿فَعَسَى رَبِّي اَنْ يُؤْتِيَنِي خَيْرًا مِنْ جَنَّتِكَ﴾ هِيڤِي هَيَه كُو خُدِى تَعَالَى بَغْچَه كِي ژِاِى تَه بِخِيرْتِرْ لِاٰخْرَتِى يَا ژِي لِدُنْيَا بِى بِدَه مِنْ ﴿وَيُرْسِلَ عَلَيْهَا حُسْبَانًا مِنَ السَّمَاءِ﴾ دِبَه كُو خُدَا عَذَابَه كِي ژِاٰسِمَانَا كُو تِى اٰڤِيتِنْ، يَا ژِي عَوْرَه كِي، وَيَا بِرُوزْكَكِي بَاڤِيژَه بَغْچِ تَه ﴿فَتُصْبِحَ صَعِيدًا زَلَقًا﴾ بِسَدَمْ اِنْكَارَاتَه وِى بَغْچِ تَه بِبَه اَرْضكَا رُوتْ، شَمَاتُوكْ، مَابِى كُو تِيدَه ژِچَانْدِنِي وْ گِيَابِى تَقْ جُويَه، اَرْضَكْ قَالَا نِگْ خَوه لِى نَاگِرِنْ ﴿اَوْ يُصْبِحَ مَاؤُهَا غَوْرًا﴾ يَا ژِي اٰقَا وِى بِچِكَه، اِيدِي تُو وَرِيسْ ژِبُو سَاتِلِى نَاگْهِيژِى ﴿فَلَنْ تَسْتَطِيعَ لَهُ طَلَبًا﴾ اُو اِيدِي تُو نِكَارِي بِكْهِيژِي وِى اٰقَا چِكَانْدِي، بِتُو هَاوِي اٰقَا چِكَانْدِي نِكَارِي ڤَگَرِينِي، اُو تُو نِكَارِي دِجِهِ وِى دَه اٰقْكْ دِي ژِي بِخَوازِي. لِڤِيدَرْ گُنگَشِيَا وَانْ (مُنَاظَرَا وَانْ) بِدَاوِي بُو ﴿وَاُحِيطَ بِثَمَرِهِ﴾ تَمَامِ بَغْچِ وِي چُو هَلَاكْ بُو، وَانْ جَلَبِ فِيكِي وِي، بَغْچِه كُو دِگُوتْ اَزْ بَاوَرْ نَاكِمْ كُو اَقْ بَغْچِهَ فَنَا بِبَه، تَقْ چُونْ ﴿فَأَصْبَحَ يُقَلِّبُ كَفَّيْهِ﴾ لِى بُو صِبَه، دَسْتِ خَوه لِهَقْ دِخِسْتْ، پِشْتَا دَسْتِكِي خَوه لِكَفَا دَسْتِ دِي دِخِسْتْ عَرْدَا مُلْكِ خَوه تَقْ دِدَا، تِشْتِكْ كُو ژِى هَاتِبَه ژِوِي مَصْرَفِى كُو كِرِبُو تُنَه بُو ﴿عَلَى مَا اَنْفَقَ فِيهَا﴾ ژِيڤُشْمَانِيَا وِي مَصْرَفِى كُو لِبَغْچَه كِرِبُو دَسْتِ خَوه لِهَقْ دِخِسْتْ چَوَا كُو عَادَتِ پُوشْمَانَا وُسَا يَه ﴿وَهِيَ خَاوِيَةٌ عَلَى عُرُوشِهَا﴾ اَوْ بَغْچَه قَالَا مَابُو نَه گِيَاكِي نَه خَانِي كِي، دَارِ وِي بِسَرْهڤَدَه كَتِبُونْ ﴿وَيَقُولُ يَا لَيْتَنِي لَمْ أُشْرِكْ بِرَبِّي أَحَدًا﴾ دِگُوتْ: خَوزِيَا مِنْ نِعْمَتِينْ خُدَا نَاسْكِرِبُونَا، مِنْ زَانِبُونَا كُو بِقَاوَتَا خُدَا يَه، مِنْ نَانْكُورِبِى نَه كِرِبُونَا. اَقْ پُوشْمَانِيَكَه كُو پُشْمَانِيَا وِي فِيدَه نَاكَه ﴿وَلَمْ تَكُنْ لَهُ فِئَةٌ يَنْصُرُونَهُ مِنْ دُونِ اللَّهِ وَمَا كَانَ مُنْتَصِرًا﴾ تُو عَشِيرَتَكْ، وَيَا عَسْكَرْنِي، اٰلِكَارْ تُونَه بُونْ بِيرَه اٰلِكَارِي بِكِرَانَانْ، بِغَيْرْ ژِخُدَا كَسْ نِكَارَه بِيرَه اٰلِكَارِبِى بِكَه، دَمَا خُدَا وِي عَذَابْ بِكَه، تِشْتِينْ كُو ژِبَغْچَه چُويَه كَسِى كُو دِبَدِيلَا وِي دَه ژِيرَه بِزِڤْرِينَه ژِي تُنَه بُو ﴿هُنَالِكَ الْوَلَايَةُ لِلَّهِ الْحَقِّ﴾ دِڤِي حَالِي دَه اٰلِكَارِي ژِوِي خُدَا بِي رَه يَه كُو بِتِنِى يَه، قَاوَتَا تُو كَسِي لِسَرْ وِى اٰلِكَارِبِى تُنَه يَه، خَودْبِى حَقْ كُو اٰلِكَارِيَا وَلِيِينْ خَوه دِكَه هَرْ اَوَه، يَانِي خُدَا كَارِ خَوه نَاخَه دَسْتِ تُو كَسِي، مُلْكْ هَرْ دَائِمْ اِى وِيَه، لَاكِنْ رُوژَا قِيَامَتِى قَانْ مِجِلْكَه يَانْ (اِدِّعَايَانْ) و گُمَانَانْ (ظَنَّانْ) دِجِنْ ﴿هُوَ خَيْرٌ ثَوَابًا وَخَيْرٌ عُقْبًا﴾ ژِبُو مُكَافَاتَا دِدُنْيَا وْ اٰخِرَتِى دَه خُدَا چِيتِرَه ژِبُو كَسِى كُو بَاوَرْ كِرِيَه، اُو ژِبُو عَاقِبَتِى ژِي چِيتِرَه ژِوِي كَسِي رَه كُو خَوه سِپَارْتِيَه خُدِى تَعَالَى.

چاڤكاني: تفسيرا طبري، تفسيرا قرطبي، تفسيرا ابن كثير، صفوة التفاسير، مرعاة المفاتيح شرح مشكاة المصابيح

www.arsivakurdi.org

www.bangaheq.com

عَذَابِ وِي دِژْوَارْ لِخَوه حَقْ كِرَبُو، كِي خَوه بِخَه اَگِرْ اَوْ ظُلْمِی لِنَفْسَا خَوه دِكَه ﴿قَالَ مَا اَظُنُّ اَنْ تَبِيدَ هٰذِهِ اَبَدًا﴾ اِنْكَارْ دِكِرْ كُو وِی دُنْيَا فَنَا بِبَه، چِه دَمَا چَاڤْ لِبَغْچِ خَوه دِكَتُ و وَانْ تِشْتِينْ كُو تِيدَه نَه ژِدَارَا وْ ژِفِيكِيَا وْ ژِچَانْدِنِيَا وْ ژِچَمِی كُو تُمْ دِهَرِكَه دِدِيتْ؛ شُبْهَه دِكِرْ وِی رُوژَكِي هَرَه حُظُورَا خُدَا. وُسَا شُبْهَه دِكِرْ: اَزْ ظَنْ نَاكِمْ كُو اَڤْ بَغْچَه هَلَاكْ بِبَه اَبَدًا، نَه فَنَا دِبَه وْ نَه خَرَا دِبَه، وِی قِيَامَتَا كُو حَشِرْ تِيدَه يَه خُدَا سُوزْ دَايَه خَلْقِ خَوه، اَزْ ظَنْ نَاكِمْ وِی رَابَه، وَرَه مَيْدَانِی. پَاشِی لِسَرْ شَكَا خَوه هِيڤِيَا اَمْنِيَتْ كِي دِي دِكِرْ دِگُوتْ ﴿وَلَئِنْ رُدِدْتُ اِلَى رَبِّي﴾ اَگَرْ وَرِمْ زِڤْرَانْدِنْ بَالْ خُدَا بِی خَوه ڤَه ـ اَوْ ژِي نَه جِهِ يَقِينِی يَه كُو وِی بِزِڤْرَه سَرْ مِنْ ـ ﴿لَأَجِدَنَّ خَيْرًا مِنْهَا مُنْقَلَبًا﴾ اَزِی بِنْهِيرِمْ كُو بَغْچَه كِي ژِڤِي بَغْچِي بِخِيرْتِرْ دَايَه مِنْ، اَگَرْ بُرَا ڤَگَرَا بَالْ خُدَا ڤَه هَبَه، چَوَا كُو خُدَا لِڤِی دُنْيَا بِی ڤَانْ نِعْمَتَا دَايَه مِنْ وِی لِدُنْيَا دِي ژِي بِدَه مِنْ؛ لَوْرَا اَزْ لِبَا خُدَا قَنْجِمْ، دِگُوتْ خُدَا ڤِي بَغْچِي دَايَه مِنْ ژِبُو كُو لِدُنْيَا دِي يَكَا قَنْجْتِرْ بِدَه مِنْ دِڤِيَامَتِی دَه، اَگَرْ اَزْ هَرِمْ بَالِی ﴿قَالَ لَهُ صَاحِبُهُ وَهُوَ يُحَاوِرُهُ﴾ هَڤَالِ وِي خِزَانْ پِيرَه مِژُولْ دِبُو خَبَرْ دِدَا وْ ژِيرَه دِگُوتْ ﴿اَكَفَرْتَ بِالَّذِي خَلَقَكَ مِنْ تُرَابٍ ثُمَّ مِنْ نُطْفَةٍ ثُمَّ سَوَّاكَ رَجُلًا﴾ قِيْ تُو اِنْكَارْ دِكِي وِي كَسِی كُو بَاڤِ تَه اَدَمْ ژِحَرِيِی خُلُڤَانْدِيَه، پَاشِی تَه چِيكِرِيَه ژِنُطْفَيَا زِلَامُ و پِيرَكِی، پَاشِی تَه عَدِلَانْدِيَه، كِرِيَه بَشَرْ زِلَامَكْ لِهَڤْهَاتِي، تَه نَه كِرِيَه ژِنْ، قَامَا تَه لِهَڤْ اَنِيَه، عَظَا بِينْ تَه قَوِينْ كِرِيَه اِی زِلَامَا، دِگُوتْ مَا تُو اِنْكَارْ دِكِي وِي كَسِی كُو ڤَانْ تِشْتَا بِتَه كِرِيَه كُو پِشْتِي بِبِي هَسْتِيِی رِزِي دِيسَا تَه بِكَه مَخْلُوقَكْ نُو. وَعْظَا لِيدِكِرُ و ژِيرَه بَيَانْ كِرْ كُو اِعْتِرَافْ كِرِنَا بِڤَانْ نِعْمَتِنْ كُو كَسْ نِكَارَه اِنْكَارْ بِكَه ژِاِعَادَا بَغْچَه هِی چِيتِرَه ﴿لٰكِنَّا۠ هُوَ اللّٰهُ رَبِّي﴾ اَمَا اَزْ اِنْكَارَا رَبِّ خَوه نَاكِمْ، اَزْ دِبِيژِمْ خُدَا رَبِّ مِنَه ﴿وَلَا اُشْرِكُ بِرَبِّي اَحَدًا﴾ اَزْ شَرِيكَا ژِرَبِّ خَوه رَه چِينَاكِمْ. مَفْهُومِ اٰيَتِی دَلَالَتْ دِكَه كُو بِرَايِ دِي شَرِيكَا ژِخُدِی تَعَالَی رَه چِيدِكَه عِبَادَتْ ژِغَيْرِ وِي رَه دِكَه ﴿وَلَوْلَا اِذْ دَخَلْتَ جَنَّتَكَ قُلْتَ مَا شَاءَ الله لَاقُوَّةَ اِلَّا بِاللّٰهِ﴾ دَمَا تُو كَتِي بَغْچَه اُو بَغْچَه تَه خِسْتَه عَجِيبِی اُو تَه لِی نَرِي، تُو حَمْدِ خُدَا بِكَه لِسَرْ نِعْمَتِی كُو لِتَه كِرِيَه وْ مَالُ و زَارُوِی كُو نَه دَايَه غَيْرِ تَه دَايَه تَه وْ بِيژَه: "مَا شَاءَ الله لَا قُوَّةَ اِلَّا بِالله"، اَڤْيَا غَيْدِكَه وْ شِيرَتِكَه ژِمُؤْمِنْ لِاِی كَافِرْ اُو رَدَّا سَرِی يَه دَمَا گُوتِبُو: اَزْ ظَنْ نَاكِمْ كُو اَڤْ بَغْچَه بِبَه تُنَه اَبَدًا. هِنِكْ سَلَفَا گُوتِنَه اَوْ كَسِی كُو حَالِ وِي، يَا زَارُوِ وِي، يَا مَالِ وِي وِي خِسْتَه عَجِيبِی بِرَا بِبِيژَه: "مَا شَاءَ الله لَا قُوَّةَ اِلَّا بِالله"، يَانِي تِشْتِی كُو خُدَا خَوسْتِيَه بُويَه، تِشْتِی كُو نَخَوازَه ژِي نَابَه، يَانِي تِشْتِی كُو كُومْ بُويَه ژِمَالْ اَوْ بِقُدْرَتَا خُدَا يَه، بِقُوَّتَا وِيَه، نَه بِقُدْرَتُ و قُوَّتَا تَه يَه، اَگَرْ خُدَا بِخَوازَه وِی بَرَكَتِی ژِی دَرْخَه وْ وِی مَالْ كُومْ نَبَه. رِوَايَتْ بُويَه ژِاَبُو هُرَيْرَه وِي ژِي ژِيْغَمْبَرْ گُوتِيَه: اَزْ كَلِمَه كَا كُو خَزِينَه كِي ژِخَزِينَه ئِی جَنَّتِی يَه بِبَرْ تَه بِخِمْ؟ مِنْ گُوتْ بَلِی يَا رَسُولِ خُدَا . گُوتْ: "لَا حَوْلَ وَلَا قُوَّةَ اِلَّا بِالله"، دَمَا كُو عَبْدْ ڤِيَا دِبِيژَه خُدَا

www.arsivakurdi.org

Ev Çi Bûn Kuştin

✍ Mela ‘Elî ‘Ilmî

Ey bira halin nedir soyle soyle
Ev çi bûn kuştin ne bê derb û gule

Ma çima nabêje min halê xwe lo
Go çi bêjim min ne çar û havîle

Zû bibê ez çare zanim bîlyeqîn
Feyde nadit el eman û helhele

Go hewar êşê me zehf in bê hîsasb
Naê saliğ gotin ew derd û bele

Her cihê min jê dizên ah û elem
Bê ğedar ‘eql û dil û wîjdan dil e

Me’newî rûhî birîndar im bizan
Axîret baqî heyat lê zelzele

Em ketin dewr û zemanek pir ‘ceeb
Enbiyan jê kirin te’wîz bîle

Fitneê axirzeman wek seyl û ley
Jê gujîna mewcê bîd’ê qatil e

‘Emmetîl erde we temmet bîttemam
Qellebet mînhel e’alî esfel e

Meshî kir her cî, ne fitlî kes ji ber
Berneda qet keskî îllah eşğele

Lew ku mülk û xizmeta ewlad û mal
Weqt û firset bir ji dîn mam cahil e

Meşğelê derdê me’îşet ez kirim
Gêj û bêhiş mest û sersem ğafil e

Qet nizanim kî me, ji ku da, ku diçim
Ev çi te’yîn sewqiyatê hail e

Ha ku dîm pîrê zewalê kir merheba
‘Umr û mehbûbên dinê bûn afile

Va diçim îdî huzûra Rebbê Heq
Destevala şermezar û ğafil e

Min ji para meyzekir zenb û gunah
Wek çiya ser dane ser hehev qafîle

Ğeyrî rehma bê hîsab cehê hebîb
Nîne melce’ bo me îmdad havile

Kor û kerr û bê heş hubba dine
We ci îbret bigre ma qey ‘aqil e?

‘Umyû bûkm û sûmm û gêj û ê meta’
Ew di bin “La ye’qîlûn” da daxil e

Hakeza “La yesme’ûn la yûbsîrûn”
Lew ku ekser bûne êş û kar File

Subh û êvar peyv û gotin kar û îş
Daîma didro dikkt nakit qul e

Mestî hubba cah û rütbên dunyewî
Werdekî bêje nebey nabit şil e

‘Ebdê nefs û zeng û pertalên dine
Fî ‘utuwwîn we ğurûrîn batil e

Digre dunya xwe li ser axret, bi keyf
Yestehîbbûnel heyatel ‘acil e

Lew di îşê dunyewî her yek jime
Şibhê Eflatûn ‘ebûqat bilbil e

Lê di axret wê heyeta sermedi
Bê xeber, ‘bdal we hov û zahil e

Ye’nî weqta nef’û peyvê dunyewî
Teyb û radar û hekem Qarlaîl e

Lê deme we’z û ‘emel teklîfê dîn
Pir şemûs û hîlekar û zeğel e

Sanki de’wet lem yezîd îlla firar
Ayeta “La yercî’ûn” heq nazil e

Dehşetê afat û tofanê zeman
Em gelek pê bûn rezil û rewlete

Lew di exlaq û ‘emel da lê binêr
Sanki wek hev, Ehmed û Xaçoyê file

Vaye Pêğember jî gotê der xeber
Hûnê wan te’qîb bikin heta qul e

Belkî ê wek min ji wan wê dajî çûn
Fîssefahatîl ûmûrîlbatil e

Em wiha mane feqîr bêkes neçar
Ka bibê kî bûme îmdad havil e



Havîle: Bêçare
Bele: Bela
‘Emmetîl erde we temmet bîttemam: Erd temam îşğal kirine
Qellebet mînhel e’alî esfel e: Serî aniye binî, binî jî aniye serî
Meshî kir: Dest dayê
Eşğele: Bi xwe mijûl kir
Hail: Bi xof û tirs
Pîrê zewalê: Mirin
Afile: Windabûn
‘Umyû bûkm û sûmm û gêj û ê meta’: Kor û lalîtî û gêjîtiya dinyayê
Kar File: Ê ku kare wî wek kare fila ye
Werdekî bêje nebey nabit şil e: Tu bikî nekî wek werdekê şil nabe
Fî ‘utuwwîn we ğurûrîn batil e: Di tekebbür û ğurûra batil de ye
Yestehîbbûnel heyatel ‘acil e: Ji heyata ‘acil hesdikin
Zahil: Ğafil
Şemûs: Serkêş
“La yercî’ûn”: Ew tu car nazivirin
Rewlete: Li erdê dirêjbûn
Fîssefahatîl ûmûrîlbatil e: di sefahet û karê nebaş de

www.arsivakurdi.org

‘ÎDA QURBANÊ

GELÎ ZAROKÊN HÊJA Û DELAL! Xwedayê Tea’la du ‘îdên pîroz û mubarek dane me. Ji wan yek ‘Îda Remezanêye ku em piştî meha rojîya remezanê dikin ‘îd. A din jî ‘Îda Qurbanêye. Ez dibêjim hûn tev dizanin ku ‘îda qurbanê ji mesela Hz. Îbrahîm pêxember û kurê wî Hz. Îsmaîl tê.

Hz. Îbrahîm dixwaze tiştê herî şêrîn ê liber dilê xwe ji Xweda re bike qurban. Xweda jî bi xewnê pê dide zanîn kurê wî Hz. Îsmaîl dixwaze. Ew jî hewl dide ku kurê xwe ji Xweda re bike qurban. Lê kêr sitûyê Hz. Îsmaîl jê nake. Xweda bi vî awayî bi Hz. Îbrahîm dide fêmkirin ku qurbana wî qebûl kiriye û di bedêla Hz. Îsmaîl de jê re beranê ku Hz. Habîl qurbanî Xwedayê Teala kiribû dişîne. Ew jî ew beran dikin qurban.

Musluman ji bona van tiştan di ‘îda qurbanê de heywanan serjê dikin, ji Xweda re dikin qurban:

1- Ji bona hezkirina Xweda
2- Ji bona nêzîbûna Xweda
3- Ji bona bibîranîna Hz. Îbrahîm û Hz. Îsmaîl
4- Ji bona kêfxweşîya xelasbûna Hz. Îsmaîl ji qurbanbûnê
5- ji bona bicîanîna sunneta pêxemberê me Hz. Mûhemmed (s.‘e.w)



www.arsivakurdi.org

GELÎ ZAROKAN!

VÊGA CEWABÊN VAN PIRSAN BIDIN

1- ‘Îda qurbanê di kîjan meha hîcrî de ye?

2- ‘Îda qurbanê di roja çendan a vê mehê de destpê dike?

3- ‘Îda qurbanê çend roj in?

4- Ji heywanê ku di îda qurbanê de tê serjêkirin re çi tê gotin?

5- Meriv goştê qurbanan çawa dike?

6- Di ‘îda qurbanê de sewta (dengê) herî xweş çiye?

7- Lafzên vê dengî çiye?

8- Kengî tê gotin?

9- Kê gotiye “Ez kurê du zilamên qurbanîme”?

10- Ev herdû zilam kînin?



(1- Zîlhîcce, 2- Di roja dehan de, 3- Çar roj in, 4- Boraq, qurban, 5- Meriv bike sê paran, yekê li cîran û eqrebeyan, yekê li feqîran belav bike, a mayî jî ji xwe re bihêle gelek bixêre. 6- Dengê tekbîrên teşrîqêye. 7- Allahû Ekber, Allahû Ekber, Laîlahe îllallah, wellahû ekber, Allahû ekber, welîllahîl hemd. 8- Ji nimêja sibeha roja ‘erefê destpê dike, heta nimêja ‘esrê ya roja çaran a ‘îdê dewam dike ku piştî ferzê nimêjên wextê tê gotin. Di dema serjêkirina boraqan de jî tê gotin. 9- Pêğemberê me Hz. Mûhemmed (s.‘e.w) 10- ‘Ebdullahê bavê pêxemberê me û ji ceddên pêxemberê me Hz. Îsmaîl)

www.arsivakurdi.org

Bexçe Zarokan

IJA EM ME'NA VAN GOTINAN HIN BIBIN



"Yek bi yekîye, herdû bi Xwedêne": Ev gotina pêşîyan jibo kal û pîrê yextîyar tê gotin. Herdû bi alîkariya hev li ser pîya dimînin û dijîn û disitirin. Hewceyê alîkarî û xizmetêne. Li hêvîya rehma Xwedêne. Tu kes alîkariya wan neke, ewê perîşan û şerpeze bibin.

Gelî zarokan! Hûn kesên weha yextîyar li derûdora xwe carna dibînin. Divê meriv xatrê wan zanibe û alîkariya wan bike. Lewra Xweda bi xatrê yextîyaran, bela û mûsîbetan ji meriv dûr dike.

"Liber tayê tolikê direqise" Ev îdyom ji bo kesên kêfokî re tê gotin. Tu bihane tune be jî, yan jî bi sebebekî pir biçûk jî dikarin bireqisin, kêf û qeşmeriyan bikin. Li meydanê tu sebeb û mesele tune be jî xwe li qeşmeriyan digrin, xwe davêjin nav şên û gengeşîyê, zû tên ğeleyanê.

Zaroknê delal! Em li hal û hereketên xwe dîqet bikin, bila kes henekê xwe bi peyv û tewrên me nekin. Bila qeşmerî û beradayî dûrî me be. Lewra zarokên efendî û baqil û zana û bîrbir, li cem Xweda û însanan biqîmetin.





www.arsivakurdi.org

1 Pe ka vêya bihesibînin:

Çar bi çelî çel û çar çerm çend çarox dikin?



2 Ka cewabên vana tê perxin:

1- Kumê hûtik, tije nûtik
2- Hilindir milindir, law ji bavê bilindir
3- Bi şev bela, bi ro kela
4- Şiva ter, li kuher
5- Ka çû ma dan

3 Çiye:

Reng kesk û sor
Girover û beşe
Şêrîne ne şor
Xweş û dendikreşe

4 Wê çawa bibe:

Zilamek û qeyîka wî heye. Ewê bi qeyîka xwe mîhek û gurek û hinek gîha, ji alîyekî çem bibe alîyê din. Lê her carê encax dikare yekê tenê bi xwe re bibe. Gava ku yekê bibe, divê yên mayîn zirarê nedin hev. (Weka gur û mîh li cem hev nemînin yan jî mîh û gîha) Gelo wê ev zilam vana çawa çerbasî hêla din bike?

Cewab:

1- (Çar sed û çel)
2- (1-Hejîr, 2-Agir û dû, 3-Nivîn, 4-Mar, 5-Bêndera Zad)
3- (Zebeş)
4- (Wê ewilî mîhê bibe. Vegere bê îjar gîha bibe û di vegerê de mîhê bi xwe re bîne. Çawa hate wê mîhê bihêle û gur bi xwe re bibe, li wir bihêle û vegere mîhê jî bi xwe re bibe.)

www.arsivakurdi.org